

Selîm Biçûk

# RÊZIMANÊ KURDÎ

(Kurmancî)



Weşanên  
ÎNSTÎTUYA KURDÎ

Selîm Bîçûk

# RÊZIMANÊ KURDÎ

(Kurmancî)

Weşanên  
Înstîtûta Kurdî



**Weşanên  
ÎNSTÎTÛTA KURDÎ**

Ji bo Lêkolîn û Zanist

**Çapa Yekemîn: Adar 1977**

Finowstr. 27, HH, 4. Etage  
12045 Berlin

Tel: 0049-30-682 11 45

Fax: 0049-30-681 02 43

**ISBN: 3-930943-19-0**

## *Ji dêvla Pêşgotinê*

Înstîtûta Kurdî Ji bo Lêkolîn û Zanist weşandina xebatên lêkolînî ji bo berzkirina nîrxên Kurd û Kurdistan ji xwe re kiriye armanc. Ji aliyekî ve rê dide lêkolînên nû daku zanist xwe bide pêş, ji aliyê din dixwaze lêkolînerên ciwan bi kar û xebatên ramyarî rabin.

Peylêçûna xurtî û qelsiya berhemana ji bo kûrkirina beşên zanist ji bo civaka Kurd pêwîstiyek nîşan dide? Em bi rexne û nîrxandinên zana û xwendevanên xwe dikarin karê zanistî pêş ve bibin, lêkolînên hêja biafirînin. Lêkolînên zanistî bê rexne û şiroveyên zanistî xurt nabin; ev yek, wî mafê dide her xebatê ku li hêviya nîrxandinan bin.

Em karê xwe hîn di pêvejoka destpêkê de dibînin ji ber vê yekê jî, baweriya me ji hertiştî zêdetir ew e ku xebatên me di nav xwe de gelek kêmasiyan dihewinin. Em ji rexneyên li ser kêmasî û şaşiyên ji bo berhemên pêşerojê hêz digirin. Em ji wê yekê aciz in ku dostên me çavên xwe li kêmasî û şaşiyên bigirin û hertim lêborînê deynin ber xwe daku karê me hîn di destpêkê de ne.

Birêz Selîm Biçûk bi salan e li ser Rêzimanê xwe yê Kurdî dixebite. Ew bi xwe, di baweriya pêşketinê di rexne û nîrxandinan de dibîne, ji ber vê yekê jî, xebata xwe bi awayî ku di destê we de ye, pêşkêş dike. Înstîtûta Kurdî rexne û nîrxandin dide ser xwendevanan û ramana xwe ya li ser xebatên wisa di nav kar û xebatên xwe yên zanistî de, bi mînakên hîn pêşvetir destnîşan dike. Ev xebat jî, ji hêla Înstîtûtê destnîşanek e.

Înstîtût li hember her karên zanistî ku di rêza wê de derdikevin, xwe berpirsiyar dibîne; ger li ser xebatan bi têrahî nerawestabe jî.

Di hin pirtûkên me yên berî niha de hin kêmasî û şaşî hebûn lê mixabin rexneyên bi nivîs heta vê demê negihîştine nivîskarên me. Hin rexneyên devkî pêşkêş bûne; ew rexne jî, mîna mirov ji lêkolînvanan hêvî dike, ne xwediyê cesaret in ku li ser xebatan bi kûrahî tesîr bikin.

Hêviya me, em giş bi hev re eniya rewşenbîrî û zanistî xurt bikin!

Înstîtûta Kurdî

Ji bo Lêkolîn û Zanist

Adar 1997

## Naverok

|                                               |    |
|-----------------------------------------------|----|
| Pêşgotin.....                                 | 7  |
| 1. Ziman, rêziman û hêmanên zimanê kurdî..... | 10 |
| 1.1 Ziman çi ye.....                          | 10 |
| 1.2 Hêmanên zimanê kurdî.....                 | 11 |
| 1.3 Rêziman çi ye?.....                       | 12 |
| 1.2.1 Tîp û deng.....                         | 13 |
| 1.2.1.1 Abc ya kurdî.....                     | 21 |
| 1.2.1.2 Tîpên dengdar.....                    | 21 |
| 1.2.1.2.1 Kurtedeng.....                      | 22 |
| 1.2.1.2.2 Dirêjedeng.....                     | 23 |
| 1.2.1.3 Tîpên dengdêr.....                    | 23 |
| 1.2.1.4 Pevdengtîp.....                       | 23 |
| 1.2.1.5 Siwartîp.....                         | 24 |
| 1.2.1.6 Cêwîtîp.....                          | 24 |
| 1.2.1.7 Rastnivîsandina tîpan.....            | 27 |
| 1.2.1.7.1 Tîpên gir û hûr.....                | 27 |
| 1.2.1.7.2 Tîpên dengdar li pey hev.....       | 28 |
| 1.2.1.7.3 Yekgirtina tîpan.....               | 31 |
| 1.2.1.7.4 Cîguhertina tîpan.....              | 31 |
| 1.2.1.7.5 Bihevguhertina dengdaran.....       | 32 |
| 1.2.2 Kît.....                                | 36 |



|                                        |     |
|----------------------------------------|-----|
| 1.2.2.1 Bêjeyên yekdeng.....           | 36  |
| 1.2.2.2 Bêjeyên dudeng.....            | 36  |
| 1.2.2.3 Bêjeyên sêdeng.....            | 37  |
| 1.2.2.4 Bêjeyên çardeng.....           | 37  |
| 1.2.3 Peyv.....                        | 39  |
| 1.2.3.1 Nav.....                       | 43  |
| 1.2.3.1.1 Beşên navan.....             | 44  |
| 1.2.3.1.2 Zayend.....                  | 52  |
| 1.2.3.1.3 Zêder.....                   | 61  |
| 1.2.3.1.4 Piçkolekirina navan.....     | 68  |
| 1.2.3.1.5 Hejmar.....                  | 70  |
| 1.2.3.1.6 Tewandina navan.....         | 71  |
| 1.2.3.1.7 Darêja berkarî.....          | 83  |
| 1.2.3.1.8 Navên kirdeyî û berkarî..... | 89  |
| 1.2.3.2 Cînav.....                     | 93  |
| 1.2.3.2.1 Cînavên kesok.....           | 94  |
| 1.2.3.2.2 Cînavên bêhêl.....           | 101 |
| 1.2.3.2.3 Cînavên nîşandek.....        | 107 |
| 1.2.3.2.4 Cînavên pêgehîn.....         | 114 |
| 1.2.3.2.5 Cînavên pirsîyariyê.....     | 116 |
| 1.2.3.2.6 Cînavên nependî.....         | 125 |
| 1.2.3.2.7 Cînavên xwemalîn.....        | 126 |
| 1.2.3.2.8 Tewandina cînavan.....       | 128 |

|                                      |     |
|--------------------------------------|-----|
| 1.2.3.3 Rengdêr.....                 | 130 |
| 1.2.3.3.1 Rengdêrên pesinde.....     | 130 |
| 1.2.3.3.2 Rengdêrên dumil.....       | 131 |
| 1.2.3.3.3 Rengdêrên nîşandek.....    | 137 |
| 1.2.3.3.4 Rengdêrên hejmarî.....     | 138 |
| 1.2.3.3.5 Rengdêrên pîrsiyarî.....   | 140 |
| 1.2.3.3.6 Rengdêrên nependî.....     | 140 |
| 1.2.3.3.7 Rengdêrên xwedanî.....     | 140 |
| 1.2.3.4 Hejmar.....                  | 143 |
| 1.2.3.4.1 Beşên hejmarê.....         | 143 |
| 1.2.3.4.2 Tewandina hejmaran.....    | 148 |
| 1.2.3.5 Lêker.....                   | 157 |
| 1.2.3.5.1 Veguhastina lêker.....     | 159 |
| 1.2.3.5.2 Di lêkeran de rader.....   | 163 |
| 1.2.3.5.3 Raweya fermanî û KDN.....  | 165 |
| 1.2.3.5.4 Komên lêkeran.....         | 171 |
| 1.2.3.5.5 Di lêkeran de dem.....     | 184 |
| 1.2.3.5.6 Di lêkeran de rawe.....    | 200 |
| 1.2.3.5.7 Di lêkeran de nakirin..... | 211 |
| 1.2.3.5.8 Lêkera bûn.....            | 214 |
| 1.2.3.5.9 Lêkera hebûn.....          | 220 |
| 1.2.3.5.10 Lêkekerên derhingêv.....  | 221 |
| 1.2.3.5.11 Çend lêkerên hîmî.....    | 229 |

|                                           |     |
|-------------------------------------------|-----|
| 1.2.3.6 Hoker.....                        | 231 |
| 1.2.3.6.1 Hokerên demîn.....              | 232 |
| 1.2.3.6.2 Hokerên cihîn.....              | 233 |
| 1.2.3.6.3 Hokerên çawanî.....             | 234 |
| 1.2.3.6.4 Hokerên hejmarî.....            | 235 |
| 1.2.3.6.5 Hokerên pirsîyarî.....          | 236 |
| 1.2.3.7 Daçek.....                        | 238 |
| 1.2.3.7.1 Daçekên lêkerî.....             | 238 |
| 1.2.3.7.2 Daçekên raweyî.....             | 240 |
| 1.2.3.7.3 Daçekên navdêrî.....            | 240 |
| 1.2.3.7.4 Daçekên erênî.....              | 241 |
| 1.2.3.7.5 Daçekên nayînî.....             | 241 |
| 1.2.3.7.6 Daçekên pirsîyarî.....          | 242 |
| 1.2.3.7.7 Daçekên egerî.....              | 242 |
| 1.2.3.7.8 Daçekên vekitî.....             | 243 |
| 1.2.3.8 Gihanek.....                      | 244 |
| 1.2.3.8.1 Gihanekên xwerû.....            | 244 |
| 1.2.3.8.2 Gihanekên dubare.....           | 244 |
| 1.2.3.8.3 Gihanekên daçekî.....           | 245 |
| 1.2.3.9 Bang.....                         | 246 |
| 1.2.3.9.1 Bangên gazîkirinê.....          | 246 |
| 1.2.3.9.2 Bangên dilxweşî û şahiyê.....   | 247 |
| 1.2.3.9.3 Bangên êş nifrîn û kovanan..... | 247 |

|                                     |     |
|-------------------------------------|-----|
| 1.2.4 Hevok.....                    | 248 |
| 1.2.4.1 Avahiya hevokê.....         | 250 |
| 1.2.4.1.1 Hevokên lêkerî.....       | 250 |
| 1.2.4.1.2 Hevokên navdêrî.....      | 254 |
| 1.2.4.1.3 Hevokên bangê.....        | 254 |
| 1.2.4.2 Di hevokê de niqteşanî..... | 256 |
| Çend nimûne liser hevokê.....       | 261 |
| Çavkanî.....                        | 269 |



## Pêşgotin

Gelê Kurdistanê ji berbanga dîrokê ve di bin nîrê bindestiyê de êş û zorê dikişîne. Her tiştên Kurdan ketine ber bayê talan û wêrankirinê. Badev û firtoneya koledariyê serax û binaxa me bi bêbextî dimale. Dijmin, keleş û kevnetoreyê me jibo xwe bi kar tîne. Hebûn û kesbûna me di bin seqem û berfa mêtîngeriya de dilerize û bêçare hêdî hêdî diçilmise û tê pişavtinê. Zimanê me jî, mîna endamekî bingeş ji hebûna me ya netewî dibe armanca êrişên hovane. Jiber ku ziman hêlîna gel e. Hêlîna dîrok, çand, tore û hemû nîrx û bihayên netewî ye. Lew re bûye armanca yekemîn ji lêdanên mêtîngeran re. Jibo ku dijmin gelê me ji meydana rake, lêdana mirinê avêtiye zimanê kurdî. Lew re baş zanibû ku kuştina zimanê kurdî, kuştina netewa kurd bi xwe ye. Kuştina kurdayetî û kesbûna kurdî bi xwe ye. Ev rastiyeke ku mirov nikare jiber çavan bixe. Di dirêjahiya dîroka Kurdistanê de, dijmin ev ramyarî bi rê ve biraye. Di dema serdariya Ereban de, Omerê Kurê XETAB, zimanê kesê ku bi kurdî dipeyîvî jê dîkir. Herwiha piştî binkevtina serhildana Dêrsimê, pêşniyaza I. INONU ew bû ku qirkirinên sipî bîn pêkanin. Jibo kuştina giyana serhildêr û berxwedêr li cem Kurdan qîşleyên leşkerî hatin

avakirinê û sêwiyên ku dê û bavên wan hatibûn kuştinê bi mejî û ramana kemalî tê de hatin xwedîkirinê. Armanca yekemîn ji van dibistanên di nav qereqolên leşkerî de ew bû ku tore, ziman, dîrok û kesbûna Kurdayetî bi nifşên kurdî bidin jibîrkirinê. Lê tevî van êrîş û qedexekirinan jî, zimanê kurdî liber xwe da. Di çiya, şikeft û asêgehên Kurdistanê de, ji hêla gelê Kurdistanî ve hat parastin. Ev jî, encama resenî û xwezaiya zimanê kurdî û taybetiyên gelê kurd in.

Zimanê me zengîn, pak, ciwan û xweş xwe gihand îro, lê mixabin ku heta niha abc û rêzimanekê yekbûyî û hevgirtî jibo wî peyde nebûye. Ev jî, ji rewşa bindestîya welat tê. Bi tenê ev daxwaz di nav welatekî serbibxwe û azad, ji hêla dezgeheke netewî ve pêk tê. Îro hoyên xweyî û babetî derfet û karînan didin jibo birêvebirîna vî karî. Di vê derbarê de pêwîst e, ku herkes çi dizane bide gelê xwe. Lew re ku pêdiviya zimên jibo Kurdan mîna xwarin û vexwarinê ye.

Gelek rewşenbîr û zimanzan ji vê xebatê ditirsin. Çêkirina rêzimanekî bê kêmayî dikin bihane û li dijî vî karî derdikevin. Gelek jî, dityarên nexweş yên mîna : " Pêwîstî bi gelek zimanzanan nîn e " tînin ziman.

Zimanzanî jî, mîna her zanistîşax merc û hoyên wê hene. Lêkolînên ku dibin, giring e bi awayekî zanistî bin.

Ez jî, mîna kurdekî welatperwer xwe berpirsiyarê pêşvebirina vê xebatê dibînim. Li gor karîn û derfetên xwe, çiqas kêr bin jî, ezê xwe berdim nav gulistana zimanê Kurdî. Xwe bi gul û çîçekan bixemilînim. Herdem jî, mezintirîn mamosteyê min di vî derbarî de zimanzan û têkoşerê serxwebûn û azadiya Kurdistanê OSMAN SEBRÎ ye.

Min rêzimanê CELADET BEDIRXAN bingeş girtiye û bi dîtinên zimanzanên din temam kiriye. Di gelek cihan de min kêmayî li gor ramana xwe dagirtine. Helbet, ev lêkolîn ne bê kêmayî ye, lê hêviya min ew e ku bigihîje armanca xwe û xwendevanên zimanê kurdî jê sûd bigirin.

Selîm Biçûk

## 1. Ziman, rêziman û hêmanên zimanê kurdî

### 1.1. Ziman çi ye ?

Ziman, desteka têgihîştina mirovan e. Bê vê destekê jiyan û pêşveçûna bajarvanî nabe. Ziman bi dengên ku ji dev, lêv, dinan, qirik, ziman û bêvil dertên pêk tê. Herwiha bi van dengên zimanê devîkî ( axaftin , peyîvîn ) çêdibe. Lê jibo zimanê nivîskî her dengê ku tê bihîstinê liser kaxezê, bi nîşanekê tê naskirinê. Ev nîşan jî, bi tîp ( herf ) tê bi navkirinê. Dema ku em dibêjin: Aş, em du dengên dibihîzin, dengê tîpa ( a ) û dengê tîpa ( ş ) . Her yek bi nîşanekê tê nivîsandinê: A, Ş

Jibo zimanê kurdî (31 ) sî û yek tîpên latînî hatine danînê. Zimanzanê birûmet CELADET BEDIRXAN sî û yek deng di zimanê kurdî de pejirandine. Bi rastî, ev in dengên bingehîn di kurdî de. Lê hîn ( 6 ) şeş dengên din hene, ew jî ev in: Xw Ç K P R T. Tîpa pevdeng û pênc tîpên cewî, yên ku cihê du dengên nêzî hev digrin kêş in. Ji bilî van tîpan sê dengên din ku ji zimanê erebî ne, cihên xwe di nav dengên zimanê kurdî de digrin: Ā ( ع ), X̄ ( ح ), H̄ ( ج ).

Her tîpek dengdar yan jî, yekgirtina bédengan bi dengdarekê re dengê çêdike, mîna : A Av - ketin ( ke - tin ). Jibo vî dengê kî ( birge ) tê gotinê. Her çend kîte bêjeyekê ( peyvekê ) çêdikin, mîna :



Serxwebûn        Ser - xwe - bûn.

Rêzkirina çend peyvan jî, hevokek xwedî wate çêdikin mîna:  
Em serxwebûn û azadiyê dixwazin. Axafin jî, bi rêzkirina  
hevokan pêk tê:

Jibo pelixandina bêrûmetiya sedsalan. Jibo jiyaneke bişeref  
û rêzdar. Jibo gihîştina karwanê mirovahiyê. Me bi destekî  
pênûs û bi yê din qilêş hilgirtiye. Berê me li çiyayên  
Kurdistanê, hêlînên baz û şêran. Me ev rê girtiye. Em bi  
xwîna sor vedikin û dişopînin, jiber ku: Ji serxwebûn û  
azadiyê bi rûmetir tiştek nîn e.

## 1.2. Hêmanên zimanê Kurdî

Mîna ku li jor diyar dibe, di zimanê kurdî de ( 4 ) çar  
hêmanên bingehîn hene ku liser ava dibe û pêk tê:

### 1.2.1. Tîp

### 1.2.2. Kîf

### 1.2.3. Peyv

### 1.2.4. Hevok



### 1.3. Rêziman Çi ye ?

Tevahiya bend û rêzanên rastaxaftin û rastnivîsandina zimanekî bi Rêziman têt bi navkirinê. Rêzimanê kurdî rastaxaftin û rastnivîsandina zimanê kurdî bi bend û rêzanan şirove dike.

### 1.2.1. Tîp û dengên zimanê kurdî

Tîp nîşanên ku liser kaxezê bi nivîsandin dengên zimên didin nasîn. Tevahiya van tîpan abc ya kurdî pêk tînin. Abc ya kurdî ya latînî ji ( 31 ) sî û yek tîpan tê sazîkirinê:

A a Tîpa yekemîn e , ji abc ya kurdî. Bi serê xwe dengêkî dirêj, ji kûraniya qirikê, bi vekirina dev derdixe. Bi lêvîkirina vê tîpê re ba ji nav devê mirov dertê û vekirina dêv hinekî dom dike :

Av, al, agir, Alan, Azad, ax, aram, aş .....

B b Tîpa duyemîn e, di abc ya kurdî de. Bi anîna her du lêvan ser hev peyde dibe û bi serê xwe tu dengan nade :

Bav, baz, berber, baran, Botan, barbar,...

C c Bi serê zimên ji hêla jorîn ve peyde dibe, yan ku bi danîna serê zimên ser perçeyê jêrîn ji nav devî. Ev tîp dengêkî bi çingênî derdixe:

Can , cer, ciwan, cercer, co, cobar,....

Ç ç Mîna ( c ) bi alîkariya serê zimên peyde dibe û  
dengekî bi çingênî derdixe. Bi du awa tê  
bikaranînê:

Awayê nerm:

Çêlek - çîrok - çîn - çivîk - çilmisîn....

Awayê sert :

Ço - çol - çîmen - çayê - çal - çayir ....

D d Bi alîkariya serê zimên ku li dinan dikeve peyde  
dibe:

Dad, derd, dem, dê, dîmen, dûman, dadvan,....

E e Dengdareke xweser e. Bi vekirina dev û rakirina  
lêv û dinan ji ser hev, dengekî kurt yekcar ji baniyê  
qirikê derdixe:

Ez, em, ezber, erzan, encam, efsane,....

Ê ê Tîpeke dengdar e. Ji baniyê qirikê, bi vekirina dev û  
rakirina lêv û dinanan ji ser hev dengekî dirêj  
derdixe:

Êl, êm, êvar, êzing, êş, êrîş, êrdim,....

- F f Ev deng bi alîkariya lêv û dinanan çêdibe. Lêva jêr dikeve navbera dinanên jêr û jor û hinekî tê qerisandinê. Lêva jor jî, hildayî dimîne: Fener, ferman, fêrbûn, Ferfûr, Fanos, ...
- G g Ev deng liser nîvê zimên ji jor ve çêdibe. Nîvê zimên bi ser şikefta devî ya jor de tê qerisandinê û lêv û dinan vekirî dimînin: Ga, gur, gul, guh, gel, gamêş, ger, gez,....
- H h Ev deng ji qirika mirov bi hûkirinê dertê. Herwiha dev , lêv û dinan vekirî dimînin: Hawar, huner, hozan, hêz, herêm, hêvî , hêja,
- I i Ev dengdar bi vekirina dev dengê kurt û yekcar ji nîvê qirikê derdixe. Di destpêka peyvên kurdî de nayê bikaranînê . Herwiha di dawiya peyvan de jî, ji bilî çend daçekan nayê bikaranînê , mîna : Bi , ji, çi, di,... Kirin, birin, mirin, bilbil, dirinde, Dimdim...
- Î î Ev dengdara xweser bi vekirina dev, lêv û dinandengê dirêj ji nîvê qirikê derdixe:



În, îşev, îsal, înan, îcar, îsot...

**J j** Ev deng ji pişt dinanan peyde dibe. Mirov binê zimanê xwe bi ser pişt dinanan ve hinekî diqerêse û vî dengê bi xuje xuj derdixe:

Jar, jîn, jiyan, jîjo, jêr, jor, jîr, jajî

**K k** Ev deng ji nivê pişt zimên bi alîkariya şikefta dev ya banî peyde dibe. Ev tîp cihê du dangan digre. Awayê nerm:

Ker (nabihîse), kil, kor, kin, ka (pûşê hûr), kadîn, kavi, kar (çêlika bizinê),...

Awayê sert :

Ker (bar radike), kum, kun, kar (îş), kole, kol, kaxez, ka (bide min),...

**L l** Ev deng bi alîkariya serê zimên ji nivê zimên dertê: Lal, lale, lûle, Leyla, Lezgîn, leylan, Lor...

**M m** Ev deng bi girtina dev û dinan û danîna lêvan ser hev ji bêvilê dertê:

Mar, mêt, mal, mê, Memo, Med, meymûn, mom,...

- N n Bi alîkariya serî û nivê pêşzimên bi hildana lêvan ji ser hev ji bêvilê dertê:  
Nan, narîn, nalîn, Nermîn, nûner, nîşan, Nişmîn,...
- O o Ev xweser dengê dirêj ji nav dev bi vekirina lêv û dinan derdixe:  
Ol, ode, Oso, ocax, olk, oldar...
- P p Ev deng bi danîna her du lêvan ser hev dertê û bi du awa tê bikaranînê:  
Awayê nerm:  
Pîr (bi emir), pepûk, pîvaz, pêlav, pembû, pîrejin...  
Awayê sert:  
Pere, por, pirç, perçe, pûş, poşman,  
pîr (rêberê dîn)
- Q q Ji nivê qirikê dertê:  
Qaz, quling, qîz, Qamişlo, qirik, qijik, qîrên, qoq,...
- R r Ji serî û nivê pêşzimên peyde dibe û bi du awa tê bikaranînê:  
Awayê nerm:  
Rol, reben, rêwî, rê, rik, rim, rimbaz,

Awayê sert:

Reş, rewş, rabûn, rewşenbîr, req...

S s Ev deng ji nav dinan bi fîtîkdanê peyde dibe:

Sal, sor, sar, sol, sîr, sersal, sosin,...

Ş ş Ji pişt dinanan û bi alîkariya binê zimên peyde dibe:

Şor, şûr, şîr, şar, şir, şêr, şoreş, şeş,...

T t Bi alîkariya dinanan û serê zimên peyde dibe û bi du awa tê bikaranînê:

Awayê nerm:

Tîr, tirî, tûr, tîti, tilûr, tij,...

Awayê sert:

Tirş, teşî, teşt, tor, ter,...

U u Ev dengdara xweser bi vekirina lêv û dinan ji nav dev yekcar û kurt derdikeve. Di pêşiya peyvan de nayê bikaranînê. Di dawiya peyvan de jî, bi awakî sinorkirî tê mîna: Tu, ku, du,...

Kur, gur, kum, xurde, gumgum, qure

- Û û Ev dengdara xweser bi vekirina dev, dinan û lêvan  
 ji nav dev dirêj derdikeve û vekirina dev hinek dom  
 dike:  
 Ûrg, kûr, rû, mû, dû, çûn, bûn,..
- V v Ev deng bi alîkariya lêv û dinan peyde dibe. Lêva  
 jêr em dikin navbera dinanên jêr û jor û hinek  
 diqerêsin:  
 Vedan, volkan, viyan, vîn, veşartin, valabûn,...
- W w Ev deng di nav lêvan de peyde dibe. Bi alîkariya  
 dengdaran tîpên siwar çêdike û ew bi xwe jî, nîv  
 dengdar e:  
 Wa, we, wê, wi, wî, ew, -êw.  
 Bi alîkariya tîpên bêdeng jî, pevdengan çêdike,  
 wek: Xw, kw, gw.  
 Wan, welat, wêran, windabûn, wî, ew,  
 Xwarin, xweser, xwê, xwîn, xwînav  
 Gwêz, gwîtin, kwîr, kwînêr...
- X x Ev deng ji nîvê qirîkê dertê:  
 Xanî, xort, xebat, xizim, xunav, xirab, xezal,....

- Y y Ev deng ji nîvê pişta zimên peyde dibe. Nîvdengdar  
e û bi alîkariya dengdaran tîpên siwar çêdike:  
Ya, ye, yê, yi, yî ,ey.  
Yar, yek, gulîyên sor, neteweyî, eywan,...
- Z z Tîpa dawî ye ji abc ya kurdî. Dengê wê ji nav  
dinanan peyde dibe.  
Zozan, zevî, zor, zindan, zerzûr, Zerê,



#### 1.2.1.1. Abc ya Kurdî

Abc ya kurdî ( 31 ) sî û yek tîp in û li du beşan par ve dibin:

Tîpên gir ( girek ):

A B C Ç D E Ê F G H Î J K L M N O P Q R S Ş T U û V  
W X Y Z

Tîpên hûr ( hûrek ):

a b c ç d e ê f g h î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

#### 1.2.1.2. Tîpên dengdar

Di zimanê kurdî de ( 8 ) heşt tîpên dengdar hene:

A E Ê Î Î O U û

Bi lêvkirina van tîpan mirov devê xwe ji hev vedike. Her tîpek jî, bi serê xwe dengê derdixe.

|   |   |     |     |
|---|---|-----|-----|
| A | a | kar | şar |
| E | e | ker | şer |
| Ê | ê | kêr | şêr |
| I | i | kir | şir |
| Î | î | kîn | şîn |
| O | o | kor | şor |
| U | u | kur | gur |
| Û | û | kûr | şûr |

Li gor Kurtî û dirêjahiya dengê van tîpan di nav xwe de, li du beşan par dibin:

#### 1.2.1.2.1. Kurtedeng: E I U

|   |   |                                        |
|---|---|----------------------------------------|
| E | e | ez, em, ber, şer, berber, ezber, pale  |
| I | i | Dimdim, bilbil, dil, mirin, kirin, min |
| U | u | tu, gul, guh, kum, kur, Kurd, durust   |

#### 1.2.1.2.2. Dirêjedeng: A Ê Î O Û

|   |   |                                             |
|---|---|---------------------------------------------|
| A | a | av, al, ap, Alan, bav, Dara, baran          |
| Ê | ê | êl, êm, êrîş, dêm, rê, mêr, Bêrîvan         |
| Î | î | în, îro, îşev, dîn, jîn, şîn, zîn, sîr, şîr |
| O | o | ol, orde, olk, Oso, Soro, Bozo, sor         |
| Û | û | ûrg, tûr, şûr, rû, mû, kûr, dûr, hûr        |

#### 1.2.1.3. Tîpên Dengdêr:

Di zimanê kurdî de (23) bîst û sê tîpên dengdêr hene. Ev tîp bi serê xwe tu dengî nadin. Tîpên dengdêr ev in:

B C Ç D F G H J K L M N P Q R S Ş T V W X  
Y Z

#### 1.2.1.4. Pevdengtîp

Ev tîp ji yekgirtina du tîpên bêdeng û dengdarekê çêdibin:

|    |                          |
|----|--------------------------|
| xw | xwa, xwe, xwê, xwî, xwî. |
| gw | gwê                      |
| kw | kwî                      |

Xwa: Xwarin, xwazgîn, xwas, ...

Xwe: Xwere, xweser, xwelî, ...

Xwê: Xwêdank, xwêşî, ...

Xw<sup>1</sup>: Xwinav, xwirde, xwirdekar,...

Xwî: Xwîn, xwînxwar, xwîî, ...

|          |            |                |
|----------|------------|----------------|
| gwê gwêz | gwî gwîtin | kwî kwîr kwîîr |
|----------|------------|----------------|

#### 1.2.1.5. Siwartîp

Ev tîp bi yekgirtina tîpên ( y, w ) û dengdaran çêdibin:

Y : Ya, ye, yê, yi, yî, ey.

W: Wa, we, wê, wi, wî, ew, êw, aw.

|   |                                                  |
|---|--------------------------------------------------|
| Y | yar, yek, Darayê Kurd, mayin, çiyayî, meydan,... |
| W | Wan, welat, wêne, windabûn, wî, xew, dêw, daw    |

#### 1.2.1.6. Cêwîtîp

Ev tîp bi du awa tîpên bilêvkirinê û di ziman de cihê du dengên digirin. Cêwîtîp ev in:

Ç K P R T

Her tîpek ji van du dengên derdixe, dengê nerm û yekî sert

---

<sup>1</sup>Pevdengê (xwî) di bergehekî pir teng de bê bikaranîna çetir e. Ji berku dengên (xwî) û (xu) di kurdî de yek in. Lê di peyvên mîna: Xwarin - dixwim de, gerek e ( xwî) bê bikaranîna jibo ku koka lêker neyê guhertinê.

| Tîp | Awayê nerm       |       |       | Awayê sert       |      |       |
|-----|------------------|-------|-------|------------------|------|-------|
| Ç   | çem              | çêlek | Çîrok | ço               | çap  | çep   |
| K   | ker <sup>2</sup> | kil   | kezeb | ker <sup>3</sup> | kum  | kol   |
| P   | pîr <sup>4</sup> | pêlav | pîvaz | pîr <sup>5</sup> | per  | pirç  |
| R   | rût              | rûn   | rêzan | reş              | rewş | razan |
| T   | tûr              | tîr   | tirî  | têr              | tor  | teşî  |

---

<sup>2</sup>Ker Kesê ku nabihîse.

<sup>3</sup>Ker Heywanê ku baran radike.

<sup>4</sup>Pîr Yê bi temen mezin ( kal ).

<sup>5</sup>Pîr Rêberê dîn li cem Elewî û Êzdiyan.



## Abc ya Kurdî Bi Helbestekê<sup>6</sup>

Artêş e banga ciwan e  
Çîmen e dilo efsan e  
Êlên firîşteyan gelo  
Herê mîşkere îsandin  
Ji Kawa Lalişa Mezlûm  
Nûnerê omîda pakbûn  
Qehreman e rola serkar  
Şoreşa teze urdekar<sup>7</sup>  
Û viyan viyana welat  
Xewna yekemîn e zû hat

---

<sup>6</sup>Tîpên yekemîn ji peyvên helbestê abc ya kurdî çêdikin.

<sup>7</sup>Urdekar Xurdekar Hûrkar.

### 1.2.1.7. Rastnivîsandina Tîpan

#### 1.2.1.7.1. Tîpên gir û hûr:

Di nivîsandina kurdî de, ji van rewşên ku em li jêr rêz bikin û pê ve her gav tîpên hûr tên nivîsandinê:

#### 1. Nasnav ( Navên bernas ):

Ev nav bi tîpa gir dest pê dikin û tevayî jî,  
tîpên gir bîna nivîsandinê, rast e. Wek:

Azad > AZAD

Xebat > XEBAT

Şêrîn > ŞÊRÎN

Amed > AMED

Qamişlo > QAMIŞLO

WAN > WAN

Botan > BOTAN

Bagok > BAGOK

#### 2. Hevok (Pevek) :

Herdem bi tîpa gir dest pê dike.

Wek: Şoreşa Kurdistanê xwe gihandiye koçbera şerê gelî. Di şerê gelî de jî, hemû hêzên civatê dibin eniyên cengê. Îro li Kurdistanê her gund, her bajar li hember dijmin, eniyeke cengê vedike.

#### 3. Dema mirov bixwaze bêjeyekê yan jî, navekî di hevokê

de berçav bike jibo balkêşîyê bi tîpên gir di navbera du kevanên biçûk de dinivîse. Wek:

Li welat " ÇAPKIRIN "a pirtûkan qedexe ye.

Ji " SERXWEBÛN " û " AZADI " yê bi rûmetir tiştek nîne.

4. Sernivîsên gotar û nivîsaran bi tîpên gir dest pê dikin yan jî, tevahî bi tîpên gir tîpên nivîsandinê.

Wek:

Enîşka Rêzimanî > ENÎŞKA RÊZIMANÎ.

5. Navên pirtûk, rojname û kovaran bi tîpa gir dest pê dike yan jî, tevayî bi tîpên gir tîpên nivîsandinê.

Rêzimanê Kurdî > RÊZIMANÊ KURDÎ

Rewşen > REWŞEN                      Lêkolîn > LÊKOLÎN

Welat > WELAT                      Avaşîn > AVAŞÎN

6. Textik û tepikên rêklam û bangeşiyê û balkêşan (lafte ) bi tîpên gir dest pê dikin yan jî, tevayî bi tîpên gir in :  
BIJÎ SERXWEBÛN Û AZADIYA KURDISTAN

1.2.1.7.2. Hatina tîpên dengdar li pey hev

Di zimanê kurdî de du dengdar di bêjeyekê de yan jî, di bêje û paşgînekê de li pey hev nayên, di vê rewşê de tîpên :

( Y,W, H ) dengdaran ji hev dûr dîkin.Mîna:

Gî - an                      Giyan.

Du - emîn                      Duwemîn.

Dirêja - î                      Dirêjahî

Tîpa (w ) dema bi vê delametê radibe bi tenê li pey van dengdaran ( o, u, û ) tê, jibo ku lêvkirina bêjeyê neyê guhertinê. Mîna:

Ez di rêza duwemîn de bûm.

Duwekî tarî ji agirê petrolê dertê.

Min serşoweke fireh ava kir.<sup>8</sup>

Tîpa (H) di şûna tîpa (Y) de tê bikaranînê , di bêjeyên mîna:

Dirêj                      dirêjayî                      dirêjahî

Teng                      tengayî                      tengahî

Reş                      reşayî                      reşahî

Ji hêla din ve gelek bêjeyên kurdî yên ku bi tîpa ( h ) dest pê dîkin, bi demê re ev tîp ketiye û bi dengdarekê dest pê dîkin, mîna :

Êriş                      hêriş

Awa                      hawa

Ûrde                      hûrde

Êl                      hêl

---

<sup>8</sup>Pir caran peyva ( bûwer ) bi vî awayî dinivîsin ( bûyer ). Bi dîtina min ( buwer ) rastir e.

Evîn                hevîn

Elb                helb

Avêtin            havêtin

Dema ev bêje dibin barbarê vê rêzanê vedigerin ser  
reseniya ( eslê ) xwe. Mîna:

Bi êrişên tund gerîla dijmin dipelixîne.

Bi hêrişên tund gerîla dijmin dipelixîne.

Bi awakî sert ez rabûm.

Bi hawakî sert ez rabûm.

Pêavêtin                Pêhavêtin

Tîpa ( Y ), di hemû rewşên din de, bi delameta  
jihevdûrkirina dengdaran radibe. Mîna:

Gundiyekî got : " Çiya em in , me bombe bikin ".

Bêjeyên ku bi dengdaran dest pê dikin, dema li dû daçekan  
tên, ev daçek dikarin dengdarên xwe bavêjin. Mîna :

Ajotin                bi ajo                bajo

Anîn                bi îne                bîne

Axaftin            bi axife            baxife

Di nivîsandina kurdî de zêder ( a, ê, ên ) mîna paşgînan tên  
pejirandinê, dema dawiya bêjeyê dengdar be, tîpa " y "   
dikeve pêşîya zêderê . Mîna: Çiyayê Cûdî pîroz e .



#### 1.2.1.7.3. Yekgirtina Tîpan

Di kurdî de du tîpên mîna hev di bêjeyekê de, li dû hev nayên. Di vê rewşê de yek jê dikeve. Mîna:

|            |         |        |
|------------|---------|--------|
| Xurt - tir | xurttir | xurtir |
| Paş - şîv  | paşşîv  | paşîv  |
| Deng - gir | denggir | dengir |
| Derd - dar | derddar | derdar |

Di zimanê kurdî de çend tîpên ne ji hev digihîjin hev û dengekî nû çêdikin yan jî, cih didin tîpeke nû. Ji yekgirtina tîpên ( xw ) û ( gw ) bi dengdaran re pevdeng çêdibin :  
Xwa, xwe, xwê, xwi, xwî.

Gwê, gwî, Kwî, kwê.

#### 1.2.1.7.4. Cîguhertina tîpan

Di zimanê kurdî de gelek dengên nêzî hev hene. Di peyvajowê de gelek caran li gor devok û zaravên kurdî cihê xwe bi hev guhertine. Mîna :

|               |            |            |
|---------------|------------|------------|
| ( v ) û ( f ) | Hevt       | heft       |
|               | Sekevtin   | serkeftin  |
|               | Hevsar     | hefsar     |
|               | Hêrivandin | hêrifandin |
| (v) û (b)     | Av         | ab         |

|               |           |           |
|---------------|-----------|-----------|
|               | Bav       | bab       |
|               | Lêv       | lêb       |
|               | Gulav     | gulab     |
| ( z ) û ( s ) | Leyiztin  | leyistin  |
|               | Paraztin  | parastin  |
|               | Bihîztin  | bihîstin  |
| ( j ) û ( z ) | Jîrek     | zîrek     |
|               | Jeng      | zeng      |
|               | Jehir     | zehir     |
| ( v ) û ( w ) | Serkevtin | serkewtin |
|               | Av        | aw        |
| ( b ) û ( w ) | Xirab     | xiraw     |

#### 1.2.1.7.5. Bihevguhertina dengdaran

Tîpên (eh) dema di yek bêjeyê de, li dû hev bên, ev herdû tîp dikevin û cihê xwe didin tîpa (a).

|       |      |
|-------|------|
| Çehv  | Çav  |
| Xwehr | Xwar |
| Şehr  | Şar  |
| Kehr  | Kar  |
| Behr  | Bar  |
| Mehr  | Mar  |
| Çehr  | Çar  |

Tîpên (ih) dibin ( î )

Cih

Cî

Sih

Sî

Mih

Mî

Bih

Bî

Rih

Rî

Tirih

Tirî

Tîpên (uh) dibin (o) yan jî ( û )

Cuh

Co

Duh

Do

Buhtan

Botan

Duhtmam

Dotmam

Cuhtkirin

Cotkirin

Cuhtin

Cûtin

Nuh

Nû

Di van rewşan de kurtedeng cihê xwe dide dirêjedengê.

Dema di bêjeyekê de dirêjedengên ( î, û ) dikevin pêşiya dengdareke din û bi tîpên ( y, w ) ji hev tîpên vekitandinê, ev dirêjedeng cihê xwe didin kurtedengên ji babeta xwe , anku ( î )dibe( i ) û ( û ) dibe (u). Wek:

Çiyayîyê mêrxas

Çiyayiyê mêrxas

|                                                                |                       |
|----------------------------------------------------------------|-----------------------|
| Gundîyek                                                       | Gundiyek              |
| Dûwek                                                          | Duwek                 |
| Mûwek                                                          | Muwek                 |
| Bûwer                                                          | Buwer                 |
| Bêjeyên mîna (dê, rê ...) dibin:                               |                       |
| Diya                                                           | Riya                  |
| Diya min                                                       | Riya min <sup>9</sup> |
| Di navên nêr de , dema tîpa (a) hebe, bi tewandinê dibe ( ê ). |                       |
| Şervan                                                         | Şervên                |
| Ga                                                             | Gê                    |
| Nan                                                            | Nên                   |
| Gavan                                                          | Gavên                 |
| Derman                                                         | Dermên                |
| Alan                                                           | Alên                  |
| Dîwar                                                          | Dîvêr                 |

Lêkerên pirkîte, dema dengê dawî ne ( i ) be ,di fermaniyê de tê zîvirandin û dibe ( i ).

Axaftin    axaf    axif    diaxife    baxife  
 Cemedîn    cemed    cemid    dicemide    bicemide  
 Li gor hin devokan ev tîp dibe ( ê ) .

---

<sup>9</sup>Bi baweriya min ( dêya min, Rêya min ) rastir e.

Baxêfe

Balêse ( Alastim )

Lêkerên derhingêv yên ku bi ( andin ) dawî dibin di fermaniyê de ( a ) dibe ( î ) .

kelandin

dikelînim

bikelîne

Gerandin

digerînim

bigerîne

Kenandin

dikenînim

bikenîne

Revandin

direvînim

birevîne



### 1.2.2 Kîr<sup>10</sup>

Kîr di bêjeyê de parçeyê biçûktirîn e ku nema tê parçekirinê, ev jî, bi tîpên dengdar pêk tê.

Xebat: Bêjeyêke dudeng e ( xe - bat ) . ( Xe ), dengê yekemîn e. ( Bat ) jî, dengê dûwemîn e. Her dengê ji van nema tê parçekirinê. Em nikarin (xe), wiha parçe bikin: x - e . Herwiha ( bat ) jî, nayê parçekirinê.

Ba: Bêjeyêke yekdeng e, nayê parçekirinê. Di bêjeyê de çend tîpên dengdar hebin, hewqas deng hene, liser vî bingehî bêjeyên kurdî li gor hejmara tîpên dengdar bi vî awayî tên parkirinê:

#### 1.2.2.1. Bêjeyên Yekdeng

Di van bêjeyan de tîpeke dengdar heye. Mînak:

Dê , bav, bar, av, xak, ap, şar, dar, ji, bi, li, yek, kir, bir, mir, çû, bû, deng, bang,....

#### 1.2.2.2. Bêjeyên Dudeng

|        |           |
|--------|-----------|
| Hacer  | Ha - cer  |
| Baran  | Ba - ran  |
| Karwan | Kar - wan |
| Hêvî   | Hê - vî   |

---

<sup>10</sup>Kîr : Deng    Birge    Tej

Di van bêjeyan de du tîpên dengdar hene û bi du dengan tîn parçekirinê.

#### 1.2.2.3. Bêjeyên Sêdeng

|           |                 |
|-----------|-----------------|
| Serkevtin | ser - kev - tin |
| Hilpişkîn | hil - piş - kîn |
| Şoreşger  | şo - reş - ger  |
| Berxwedan | ber - xwe - dan |

#### 1.2.2.4. Bêjeyên Çardeng

|             |                      |
|-------------|----------------------|
| Serîhildan  | se - rî - hil - dan  |
| Bajarvanî   | ba - jar - va - nî   |
| Welatparêz  | we - lat - pa - rêz  |
| Koçbarkirin | koç - bar - ki - rin |

Di van bêjeyan de çar tîpên dengdar hene û bi çar dengan parçe dibin.

Herwiha bi vî awayî bêjeyên pênc deng jî, tîn parçekirinê.

### 1.2.3. Peyv<sup>11</sup>

#### a. Di zimanê kurdî de peyv çi ye ?

Di Nîsana 1990 î de , li derdorên Bêytûlşebabê, lehengê nemir Sebrî ( Cemîl ) gihişt karwanê şehîdên nemir. Rêhevalê Sebrî mîna hemû şehîdên me, navê xwe bi tîpên ji agir di singa dîroka Kurdistanê de neqîşand..."

Ji rêzên jor diyar e ku hevok ji çend bêjeyên xwedî wate saz dibe. Bi hevketina van bêjeyan hevok wateya xwe distîne, lê dema em bêjeyekê ji hevokê berçav bikin, mîna Sebrî. Bêjeya Sebrî ji çend tîpan saz bûye: S E B R Î di nav van tîpan de du tîp dengdar in ( e, î ) jibo vê jî, lêvkirina vê bêjeyê parçe dikin : Seb - rî. Em dibêjin ev bêje du deng e. Ji hêla din ve bêje xwedî wate ye. Gava em navê Sebrî dibihîsin em dizanin ku kesekî şoreşger pê tê binavkirinê û ev kes şehîd ketiye. Herwiha hemû bêjeyên ku di rêzên jorîn de hatibûn mîna : Bêytûlşebab, Nîsan, 1990 î ,li, bi, ji, leheng, şehîd, hemû, gihişt , ....

Her bêjeyek ji van ji çend tîpan saz dibe, çend dengan dide û wateyekê nîşan dike. Li gor vê em dikarin peyvê (bêjeyê) bi vî awayî bidin nasandin:

Peyv ji çend tîpan saz dibe, çend dengan derdixe û wateyekê berçav dike.

---

<sup>11</sup>Peyv: Bêje Şor Axif Qise

### b. Peyvên hevdeng

Lêvkirin û nivîsandina van bêjeyan yek e, lê wateya wan ji hev cuda ne.

Şîn<sup>12</sup>                      Şîn<sup>13</sup>                      Şîn<sup>14</sup>

Ber<sup>15</sup>                      Ber<sup>16</sup>                      Ber<sup>17</sup>

Bîr<sup>18</sup>                      Bîr<sup>19</sup>

Pir<sup>20</sup>                      Pir<sup>21</sup>

Şor<sup>22</sup>                      Şor<sup>23</sup>

Cot<sup>24</sup>                      Cot<sup>25</sup>

### c. Peyvên hevwater

Wateya van bêjeyan yek e, lê lêvkirin û nivîsandina wan ji hev cuda ne.

---

|                   |                        |          |       |
|-------------------|------------------------|----------|-------|
| <sup>12</sup> Şîn | Reng                   |          |       |
| <sup>13</sup> Şîn | Heşîn                  | Giya     |       |
| <sup>14</sup> Şîn | Girî û dîlzarî         |          |       |
| <sup>15</sup> Ber | Kevir                  |          |       |
| <sup>16</sup> Ber | Pêş                    | Lihember |       |
| <sup>17</sup> Ber | Cîrax                  |          |       |
| <sup>18</sup> Bîr | Ji bîranînê            | Ra       | Hizir |
| <sup>19</sup> Bîr | Çala avê               |          |       |
| <sup>20</sup> Pir | Gelek                  | Zehf     |       |
| <sup>21</sup> Pir | Liser avê tê avakirinê |          |       |
| <sup>22</sup> Şor | Tama xwê               |          |       |
| <sup>23</sup> Şor | Xeber                  | Gotin    |       |
| <sup>24</sup> Cot | Dufer                  | Didu     |       |
| <sup>25</sup> Cot | Ajotina axê            | Cotkirin |       |

|        |       |       |       |      |      |
|--------|-------|-------|-------|------|------|
| Bêje   | Peyv  | Şor   | Xeber | Qise | Axif |
| Pir    | Gelek | Zehf  |       |      |      |
| Gerdûn | Dinya | Cihan |       |      |      |
| Rûmet  | Şeref |       |       |      |      |
| Şerm   | Fihêt |       |       |      |      |
| Zû     | Bilez |       |       |      |      |

#### ç. Peyvên dijhev

Ev bêje bi wateya xwe dijî hev in .

|         |         |
|---------|---------|
| Reş     | Sipî    |
| Şer     | Aşitî   |
| Sar     | Germ    |
| Sivik   | Giran   |
| Birûmet | Bêrûmet |
| Mezin   | Biçûk   |
| Nezan   | Zana    |

Di kurdî de parçeyên axaftinê (koma peyvan) :

Koma hemû peyvên ku di axaftin û nivîsandina kurdî de peyda dibin parçeyên axaftina kurdî ne. Ev jî, neh beşên bingehîn in, di zimanê kurdî de. Emê van parçeyan li jêr rêz bikin û bi firehî liser rawestin.

1.2.3.1 Nav

1.2.3.2 Cînav

1.2.3.3 Rengdêr

1.2.3.4 Hejmar

1.2.3.5 Lêker

1.2.3.6 Hoker

1.2.3.7 Daçek

1.2.3.8 Gehandek

1.2.3.9 Bang



### 1.2.3.1 N a v

Kêliyê ji Bihara Gundê min

Serê sibê ye. Rojê şaxên xwe yên zêrîn davêtin mêrg û palên çiyê. Ox ... Xweş ! Ev çi awaza bêmirin e, tê guhên min; Marêna bizin û karikan, borîna çêlek û dewaran, barbara berx û mihan, çîwçîwa çivîk û şalûlan.

Dengê bilûrek bi awazeke girînî û xemgîn mîna pêlên bayê guhên min hênik dike. Haho! Strana " lo lo lawiko " bi dengêkî stûr û giran pêl dide. Di nav re qeqeba kewekî ji kontara çiyê bilind dibe. Şêrîn bang dike Narînê. Gulê bang dike Perwînê. Ewt ewta segên gund , qid qidq mirîşkan. wey bavo! Dengê zeriyeke delal ji riya kehniyê tê, bi strana " Her hebin pêşmerge me " xwe mijûl dike. Wey hesteyên min, ez çi bihîdzim, ez çi berdim?! Bi hev re ox yeh! Sinfonîyeke xweristî bêmirin e. Dengê Zeriye, wey xweziya min bi we Pêşmergeno! Bilûra şivên ?! Na, dengê kewan?! Na, na ... wey lo dilo! Ev çi ye?! Ev çi bûye?! ...

Dema em ji nivîsa jorîn van bêjeyan berçav dikin: Bihar, gund, roj, mêrg, çiya , awaz, guh, kehrik, berx, şivan, Şêrîn, Gûlê, kew, hest ...

Em dibînin ku her bêjeyek ji van kesekî , cihekî yan jî, tişteki dide nasînê. Ev kes, cih û tişt bi vê bêjeyê tê binavkirinê. Di zimanê kurdî de nav ji van bêjeyan re tê gotinê. Herwiha nav bi vî awahî tê nasdan:

Nav parçeyeke ji axaftina kurdî ( yek ji bêjeyên zimanê kurdî ye). Tişteki , kesek, lawirek yan jî, cihek bi vê bêjeyê tê naskirinê.

#### 1.2.3.1.1 Beşên Navan

Di zimanê kurdî de du beşên navan hene:

Navên ku mirov bi her pênc hesteyên ( hisên ) xwe dikare nas bike, an ku hebûneke wan berçav hebe, ji van navan re şênber (madî) tê gotinê. Mîna: Av , nan, çiya, ba, çêlek, berx, çivîk, bilûr ...

Navên ku mirov nikare bi her pênc hesteyên xwe nas bike, yan ku hebûneke wan ya berçav tune, lê mirov di raman û mêjiyê xwe de wan nas dike. Razber (manewî) ji van navan re tê gotinê. Mîna: Giyan ( rih ), jîrî, hiş, sewda, bext, raman....

#### A. Navên şênber

Navên şênber yê xwedî giyan:

Jin :Narîn, Şêrîn, Gulê, Perwîn, Zînê,

|             |                                      |
|-------------|--------------------------------------|
| Mêr         | Azad, Hogir, Xebat, Hawar, Reşo,     |
| Mirovên nêr | Mêr, xort, bav, bira, xal, ap,       |
| Mirovên mê  | Jin, keç, bûk, xwîşk, dotmam, ....   |
| Lawirên nêr | Beran, nêrî, ga, beraz, dîk, hesp... |
| Lawirên mê  | Bizin, çêlek, mih, mehû, mirîşk,     |

#### Navên şênber yên bêgiyan

|       |                                      |
|-------|--------------------------------------|
| Mêza  | Av, baran, berf, beroş, ode, cam ... |
| Nêrza | Kon, nan, kevir, agir, êzing,        |

#### B. Navên Razber

Ev nav tişteki bêrih û can, bêleş û giyan bi nav dikin. Tişteki ne berçav e, lê mirov di ramana xwe de nas dike. Mînak: Hêvî, tirs, mêranî, raman, saw, merdî, cangorî.....

#### Navên razber sê beş in:

1. Navên Ramanî
2. Navên ku bi paşgînên " atî, tî û î " tên saz kirinê.
3. Navên raderî

##### 1. Navên ramanî

|       |                           |
|-------|---------------------------|
| Nêrza | Sewda, rih, derd, hiş,... |
|-------|---------------------------|

|      |                          |
|------|--------------------------|
| Mêza | Hêz, hêvî, tirs, saw,... |
|------|--------------------------|

## 2. Navên jêbirînî

atî                    Reşatî, serokatî , koratî, mirovatî,....  
tî                    Hevaltî , biratî, zavatî, feqîrtî,..  
î                    Erzanî, xweşî, hogirî, giranî, rebenî,...

## 3. Navên raderî

Ev nav raderên lêkeran bi xwe ne.

n                    çûn, man, bûn, dan,..  
in                    birin, kirin, hatin, firotin,..  
în                    anîn, kirîn, nalîn, revîn, firîn,...  
andin                kelandin, tirsandin, kenandin,

Bi du awayên din nav di zimanê kurdî de par dibin. Nasnav û gelempernav:

### a. Nasnav

Ev nav mirovekî yan tiştekî bi tenê binav dikin û ew tişt yan ew kes bi wî navî xuya ye. Nasnav, navên tiştan, jinan, mêran û welatan in. Mînak:  
Kurdistan, Afrîn, Koban, Hêzil, Ferad, Bagok, Botan, Qamişlo, Şêrîn, Zêrîn, Azad, Reşo, Dicle,..  
Nasnav herdem bi tîpa gir dest pê dikin û dibe ku bi tevayî jî, gir bên nivîsandinê.

Di kurdî de nasnav ev in:

1. Navên kesan( Rastnav )

Ev navên mirovan in. Mînak:

Hacer, Bêrîvan, Egîd, Simko, Rewşen, Sêvê, Temo, Cesûr, Azad, Raperîn, Rêwîn,...

Ev nav ji sê navaan pêk tên:

1. Navê pêşî                      Azad ( navê kesekî ye )
2. Navê bav                      Şivan ( Şivan bavê Azad e )
3. Navê malbatî                  Temo ( Şivan ji mala Temo ye )

Azadê Şivanê Temo yan jî, Azadê kurê Şivanê Temo.

2. Navên malbatî

Bedirxanî, Osmanî, Pehlewî, Şikakî,...

3. Navên nijadî

Kurd, Faris, Ereb, Tirk, Ermen,...

4. Navên erdnîgarî

Navê welatan                  Kurdistan, Misir, Filestîn, Çîn,

Navê bajaran                  Amed, Şirnex, Qamoşlo,

Navê çayan                      Bagok, Gebar, Cûdî, Agirî,

Navê çeman                      Hêzil, Ferad, Dîcla, Xabûr,

Navên cih û deran              Botan, Xerzan, Hesinan,



Herwiha navên gundan jî, ji nasnavan tîen hejmartinê.

#### b. Navên Celeb

Ev nav her tiştên ji beşekî, babetekê yan jî, celebekî binav dîkin. Mîna:

Çiya, Bajar, welat, mih, bizin, beran, ga, mirov,

Navên celeb bi du beşan tîen parkirinê:

##### 1. Navên Beş

Ev nav bi kêrî navkirina tiştên ji celebekî yan beşekî tîen.

Mînak:

Mih, balinde, çiya, mirov, lawir, candar,...

##### 2. Navên kombêj

Ev nav bi kêrî navkirina parçeyekî yan jî, komekê ji navekî beş tîen. Mîna:

Lek, kerî, ref, selef,...

Kerîyek pez.

Refek balefir.

Selefek siwar.

Navên Celeb bi awayekî din bi sê beşan tîen parkirinê:

A. Navên Cih ( lûs )

B. Navên Alav ( amraz )

C. Navên dumil



### A. Navên Cih

Ev nav derekê, ciyekî yan jî, warekî bi nav dikin. Mînak:

Xanî , meydan, dibistan, forotgeh, nexweşgeh, mûristan, çayxane,...

Navên cih du beş in:

#### 1. Xweber

Navên cihîn xweber bi xwe cihekî yan jî, derekê bi nav dikin.

Mînak:

Keleh, bazar, bender, xanî, şikeft,...

#### 2. Sazber

Navên cihîn sazber ji nav û bêjeyên din bi yekgirtina paşgînan tên çêkirinê. Paşgînen ku navên cihîn saz dikin ev in:

Istan, geh, zar, xane, lîn, dîn,...

Istan     Kurdistan, Hindistan, Erebia, gulistan, goristan, mûristan, karistan, daristan,...

Geh       Dengê, lîzgeh, çêregeh, bargê, Zanîngeh, kargê, tomargê, nexweşgeh,...

Zar       Çîmenzar, gulzar,...

Xane      Mêvanxane, nexweşxane, dermanxane,

Lîn       Kulîn, hêlîn, xwêlîn, birîqlîn,...

Dîn      Kadîn,...

### B. Navên Alav

Ev nav bi kêrî navkirina alavekî (amraz, destek) tên. Mînak:

Şûr, kêr, birek, badek, xame,...

Ev jî, du beş in:

#### 1. Alavên Xweber

Navên ku ji xweber alav in, wek:

Qelem, kevçî, bivir, tevşo,...

#### 2. Alavên Sazber

Ji bêjeyên din bi alîkariya paşgînan çêdibin. Paşgînen ku navên alav saz dikin ev in:

Ek, dan, cîv, ing, ar,...

Ek      Birek, badek, pêçek,

Dan      Çaydan, xwêdan, xwelîdan, kildan,      kevçîdan

Çîv      Kîlçîv

Ing      Bêjîng, hevring,

Ar      Xîzar

Gelek nav bi (ing) dawî dibin, lê ne alav in. Wek:

Ziving, rojîng,...

### C. Navên Dumil

Navên dumil bi du awan çêdibin:

#### 1. Hevbend

Ev nav bi çar awan çêdibin:

- Nav û rengdêr      Girsor, rûreş, dilpak,
- Du nav      Marmasî, sîrdim, biramak,
- Nav û hoker      Berçavk, bermalî, navmalî,
- Nav û lêker      Gerav, bager, dermansaz..

#### 2. Navên xurdeza:

Ev nav bi alîkariya paşgînan çêdibin. Mîna:

|     |               |
|-----|---------------|
| Gûn | Argûn, pargûn |
| N   | Xewn, tevn    |

### 1.2.3.1.2. Zayend<sup>26</sup>

Di zimanê kurdî de du zayend hene: Nêr û mê. Ev zayend bi du beşan par dibin:

#### Rasteza

Navên ku bi rastî nêr in yan jî, mê ne. Mînak:

Navên bi rastî nêr : Xort, mêr, ga, beran,

Navên bi rastî mê : Keç, jin, çêlek, mih, bizin,...

#### Gumanza

Navên ne nêr û ne mê ne. Lê di ziman de mîna rastezayan hin nêr û hin mê tên bikaranînê. Dema em bixwazin navekî ji van nas bikin ku nêr yan mê ye, emê hevokedekê bi vî navî saz bikin. Gava paşgîna " ê " bistîne, ev nav nêr e, lê gava " a " bistîne mê ye. Mînak:

Dil : Dilê germ.

Çiya : Çiyayê Cûdî.

Çem : Çemê Dicle pêlan dide xwe.

Navên : Dil, çiya, û çem ne nêr û ne mê ne, lê di ziman de mîna navên nêr tên bikaranînê, jiber ku di hevbendiyê de " ê " distînin.

Av : Ava kaniya me zelal e.

---

<sup>26</sup> Nêr û mê

Şoreş : Şoreşa Kurdistanê pêş de diçe.

Gul : Gula sor.

Navên Av, şoreş û gul ne nêr û ne jî, mê ne , lê di ziman de mîna navên mê tên bikaranînê û paşgîna " a " di hevbendiyê de distînin.

### Navên Nêrza

Navên nêrza du beş in:

#### Rastezayên nêr

Ev nav bi rastî zayend nêr in. Nêrza jî, di Kurmancî de ev in:

Navên mirovên nêr : Mêr, law, kur, zîlam, zava,

Navên mêran : Azad, Zerdeşt, Hogir,

Navên lawirên nêr : Beran, nêrî, ga, dîk, beraz,

#### Gumanzayên nêr

Ev nav bê zayend in, ne nêr û ne mê ne. Lê di ziman de mîna navên nêr tên bikaranînê. Mînak: Xanî, guh, çiya, çem, nan, dil, serî, kevir, dest, kon, gopal, ..

Navên nêr paşgîna " ê " di forma hevbendî de distînin.

Mînak:

Xortê şoreşger.

Lawê Medya.

Reşoyê şehîd

Hogirê leheng.

Beranê tov.

Gayê cot.

Nanê sêlê.

Çemê Ferat.

Navên mêza

Navên mêza du beş in: Rastzayên mê û gumanzayên mê.

Rastezayên mê bi rastî zayend mê ne. Rastezayên mê jî, ev in:

Navên kesên mê : Jin, keç, bûk, dê, xûşk, met,

Navên jinan : Şêrîn, Narîn, Dîcla, Gulê,

Navên lawirên mê : Mih, bizin, çêlek, mirîşk, dêl,...

Gumanzayên mê

Ev nav bi rastî ne nêr û ne mê ne, lê di ziman de mîna navên mê tên bikaranînê û paşgîna " a "

distînin. Mînak:

Teşt, çal, dar, rê, pênivîs, berf, av, şoreş, tirs, hêvî, birin, kel,...

Ji gumanzayên mê re rêzanek heye. Ew jî ev e:

Ev beşên navên razberî herdem mê ne:



### Navên jêbirînî

Navên ku bi " atî, tî û î " dawî dibin. Ev nav herdem mê ne û paşgîna " a " distînin. Mînak:

Serokatî, koratî, mirovatî, reşatî, hevaltî, biratî, bijartî, zavatî, erzanî, xweşî, hogirî, giranî,...

### Navên raderî

Navên raderî raderên lêkeran in û herdem mê ne. Mînak:

Kirin, çûn, hatin, man, hebûn, firîn, firotin, ketin, lerizandin, damezirandin, firandin, kelandin,...

Navên zayend mê di hevbendiyê de herdem paşgîna " a " distînin. Mînak:

|                  |                     |
|------------------|---------------------|
| Çala avê.        | Berfa sipî.         |
| Keça şervan.     | Jina azad.          |
| Bizina kej.      | Miha qer.           |
| Şêrîna jîr.      | Hacera şehîd.       |
| Hevaltiya gelan. | Serokatiya hemdemî. |
| Xweşiya çîyan.   | Hebûna ziman.       |
| Çûna şoreşê.     | Hilkişandina çîyan. |

### Navên duzayend ( Nêremê )

Navên du zayend li gor kesê ku mirov liser daxive carna nêr û carna mê ne, yan ku jibo nêr û jibo mê jî, tên bikaranînê.

Mîna navên : Heval, yar, dijamin, dost, karker, mamoste, şervan, hogir, Şoreşger, ...

Ev nav û yên mîna wan dema bi navekî nêr re hevbend dibin " ê " distînin û dema bi yekî mê re be paşgîna " a " distînin. Mînak:

Hevalê dilsoz ( dema heval nêr be - xort, mêr )

Hevala dilsoz ( dema heval jin be )

Herwiha em dibêjin:

Yarê delal

Yara delal

Dostê çeleng

Dosta dilsoz

Mamosteyê dibistanê

Mamosteya dibistanê

Şervanê azadiyê

Şervana azadiyê

Karkerê jîr

Karkera jîr

Şoreşgerê kurd

Şoreşgera kurd

Dijminê hov

Dijmina hov

Evîndarê welat

Evîndara welat

Xebatkarê hêja

Xebatkara hêja

Têkoşerê gernas

Têkoşera gernas

Hogirê min

Hogira min

### Navên nêr

- |                                          |                                                                                                   |
|------------------------------------------|---------------------------------------------------------------------------------------------------|
| 1- Navên mirovên nêr                     | Bav , ap, xal, zava,                                                                              |
| 2- Navên candarên nêr                    | Ga, beran, dîk, ...                                                                               |
| 3- Navdêrên hejmarî                      | Du, sê, çar, pênc, deh,<br>sed, hezar,... lê yek mê<br>ye.                                        |
| 4- Navên rengan                          | Sor, zer, kesk (heşîn ),<br>qehweyî, agirî...                                                     |
| 5- Navên gewher û madenan                | Hesin, zêr, zîv,<br>derî vê rêzê hilberînên<br>petrol û komirê mê ne:<br>Mazot, benzîn, komir, .. |
| 6- Berhemên candaran                     | Goşt, penîr, mast,<br>nîvişk, şîr, lê derî vê<br>rêzê: hêk, hirî û liva mê<br>ne.                 |
| 7- Mêweyên ( fêkî ) hişk                 | Hejîr, mewîj, ...                                                                                 |
| 8- Darên hişk                            | Dar, tîrek, ço, ..                                                                                |
| 9- Hemû avên herik                       | Çem, cobar, ...<br>derî vê rêzê co û sûlav<br>mê ne.                                              |
| 10- Qût û dexil û hemû celeb navên wan : | Qut, dexil, genim, ceh,                                                                           |

11- Endamên laşê mirov yê der ve hemû nêr in  
Serî, çav, guh, dest,  
çerm, zik, ...

### Navên mê

1- Mirovên mê û navên wan  
Dê, xwîşk, met, bûk,  
Şêrîn, Lîlav, Şermîn,  
Nermîn, Çîmen, Sûlav,  
Laliş,...

2- Hemû candarên mê  
Mî, bizin, çêlek, mirîşk,  
mehîn, dêlik,...

3- Avên aram ( sekinî )  
derya, gol, bîr, çal, Derî  
vê rêzê delav nêr e .

4-Navên erdnîgarî yê bajar, gund, çiya, deşt û welatan:  
Amed, Xanik, Bagok,  
Heran, Kurdistan,...derî  
vê rêzê navên çeman  
nêr in.

5- Êwirgeh  
Şikeft,... derî vê rêzê  
kon, xanî, axwir û stewl  
nêr in.

6- Navgînên siwariyê  
Otomobîl, taksî, tirên,  
firok, keştî....

7- Tiştên ji asîmanan tên jêr û heyînên asîmanî:

Baran, berf, stêr, roj,  
heyv  
derî vê rêzê ba û ewir  
û asîman nêr in.

8- Nexweşî, êş û navên nexweşîyan

9- Xwarinên pijandî û tiştên xwaringehê, lê nan, goşt, kefçî  
û çetel nêr in.

10- Navên mûzîk û nivîsandinê.

11- Navên sîleh û çekan, lê çekên sipî:

Şûr, gurz,  
doqik, bivir, şeşperî ,... nêr in.

12- Navên ku bi " î " , " ahî " , " tî " û "atî" dawî dibin:

Erzanî, meznahî,  
hevaltî, biratî, ...

13- Navên tîpên abc

14- Darên heşîn ( ter )

15- Navên gulan

16-Navên pirtûk û pergalên nivîsandinê:

pel, kaxiz, pêûs,...

17- Pût û celebên giyayên ku dibin pût jibo candaran, lê ceh

nêr e

18- Hemû navên raderî ( raderên lêkeran ) :

çûn, hatin, birin ,...

19- Endamên laşê mirov yên hundir tev mê ne :

ceger, rovî, kezeb, ...lê

dil nêr e.

20- Navên sal, hefte, rojên hefteyê, meh û demsalan hêmû

mê ne.<sup>27</sup>

---

<sup>27</sup>Navên ku ji du parçeyan saz dibin zayenda parçeyê dawî distînin. Wek:  
Rê ( mê ye ) Ziman ( nêr e ) Rêziman ( zayenda ziman distîne û nêr e )  
Riya welat şoreş e. Zimanê kurdî şêrîn e. Rêzimanê kurdî xweş e.



#### 1.2.3.1.3. Zêder

##### Çiya

Çiya yek ji pîrozayiyên gelê Kurdistanê ne. Îro, mîna hemû koçberên dîrokî, çiyayên Kurdistanê bûne bargehên gerîlayên me yên leheng ku şerê Serxwebûn û Azadiyê bi rê ve dibin. Herwiha bav û bapîrên me jî, di demên zor û astengiyan de, xwe dikişandin çiyên û serî didan berxwedanê, jibo parastina ziman, çand, dîrok, tore, hebûn û hemû biha û taybetiyên xwe yên netewî.

Îro, şoreşa Kurdistanê ya nûjen dîsa dide xuyakirinê ku çiyayên me ne tenê parastgehên pîroz in, lê belê kelehên berxwedanê ne jî, jibo pêkanîna êrîşên serkeftinê, berbi avakirina Kurdîstaneke serbixwe û azad ve ...

Koçberên dîrokî.

Gerîlayên me.

Şerê serxwebûn û azadî yê pîroz.

Şoreşa Kurdistanê ya nûjen.

Dema em van hevokan berçav dikin, em dibînin ku:

Hevoka yekemîn ji du navan saz dibe:

Koçber û dîrok, lê bêjeya "ên" girêdanek di navbera wan de çêkiriye û dide famkirinê ku gelek koçber bi vî rengî derbas

bûne. Herwiha hevoka duwemîn jî, bi bêjeya " ên " girêdanek di navbera nav û cînavekî de çêdike (Gerîla û me). Bêjeya " ên " dîsa wan bi hev girê dide û dide nasîn ku gelek gerîla ne, lê vê carê jiber ku gerîla bi tîpeke dengdar dawî dibe pêşiya " ên " tîpa " y " girtiye. Em dizanin ku koçber mêza ye, jiber ku em dibêjin: koçbera hovîtiyê.

Bêjeya gerîla dibe nêr û mê, em dibêjin: " Gerîlaya ARGK " yan jî : " Gerîlayê ARGK " .

Di encamê de tê nasînê ku bêjeya "ên" jibo koma ( pirhejmar ) herdu zayendan tê bikaranînê, jibo koma nêr û mê çêdibe. Mîna: Keçên kurd û xortên kurd.

Hevoka sêyemîn jî, ji du parçeyan pêk hatiye: Şer û serxwebûn , şerê serxwebûn û azadî û pîroz

di herdu parçeyan de "ê" girêdanekê çêdike, anku dibe amraza hevbendiyê (xistine pal) û dide zanîn ku bêjeya şer yekhejmar e û zayend nêr e. Tê nasîn ku "ê" jibo nêrzayê yekhejmar tê bikaranînê.

Hevoka çaremîn, dîsa ji du parçeyan e: Şoreş û Kurdîstan. Şoreşa Kurdistanê û nûjen, di her du caran de bêjeya " a " hevbendiyê di navbera van bêjeyan de dike û dide nasîn ku şoreş bêjeyeke mê û yekhejmar e. Tê nasînê ku bêjeya "a" jibo mêzaya yekhejmar tê bikaranînê.

Ev bêjeyên li jor hatine hejmartinê: a, ê, û ên. Zêder ji wan re tê gotinê. Di encamê de em dibêjin:

Zêder bêjeyeke biçûk e, du navan, navekî û rengdêrekî yan jî, navekî û cînavêkî bi hev dide girêdanê, an ku hevbendiyê di nav wan de çêdike û hejmar û zayenda van nav û rengdêran diyar dike. Hevok herdem bi zêderê tê tewandinê.

#### A. Zêdera pendî

Zêdera pendî navekî yan rengdêrekî bi tenê , ku em baş nas dikin berçav dike û zayend û hejmara wan dide nasîn. Dema em dibêjin: " Dîroka Kurdistanê " em liser dîrokeke nas daxivin ku ew dîroka gelê Kurdistanê ye. Zêdera "a" hevbendiyê di navbera (dîrok û Kurdistanê ) de çêdike. Ev dîrok pal dide ser Kurdistanê, an ku Kurdistan palgeh û dîrok palvedêr e , "a" jî, amraza jibo vê ( bendek ) jê re tê gotinê, ji hêla din ve " a " dide nasîn ku dîrok yekhejmar û mêza ye.

Zêdera pendî ev e:

1. Jibo yekhejmara mêza " a " ye. Mînak:

Gula sor: Em dizanin liser kîjan gulê daxivin, an ku ev gul ji hêla me ve tê naskirinê. Peyva "a" jî,

hevbendiyê dike navbera navekî (gul) û rengdêrekî (sor) û dide zanîn ku guleke bi tenê û mêza ye. Herwiha em dibêjin: Keça kurd.

Pênivîsa min.

Xweşiya çiyar.

Biratiya kurdan.

Serhildana gel.

Şervana ARGK.

2. Jibo yekhejmara nêrza "ê" ye. Mînak:

Çiyayê Cûdî.

Dilê min.

Agirê Newrozê.

Şervanê ARGK.

Çemê Dîclê.

3. Jibo koma herdu "zayendan ( nêr û mê )" "ên" tê bikaranînê. Mînak:

Gulên sor.

Dilên pak.

Çiyayên Kurdistanê.

Golên xwînê.

Gorên şehîdan.

Gayên cot.

Çowên bêbext.

Dema dawiya bêjeya pêşî tîpeke dengdar be ( y,w ) pêşiya zêderê digre. Mînak:

Sorowê cotkar. ( Soroyê cotkar )

Birayên delal.

Ronahiya zanistiyê.

Xameya min.

Mirovahiya hemdem.

Bêjeyên mîna : dê, rê û mî dibin : di, ri, mi.

Diya min.

Riya min.

Miya qer ( miha qer ).

Zêder nav û cinavekî bi hev girê dide û xwedîtiyê ber çav dike:

Gula min, çiyayê me, bavê min, diya min,...

Yan nav û rengdêrekî bi hev girê dide:

Gula sor , çiyayê bilind , zozanên xweş ,  
bihara geş,...

Yan jî, du navan bi hev re girê dide:

Simkoyê Şikakî , çiyayên Kurdistanê ,



B. Zêdra nependî (nediyar)

Di zêdera pendî de me got: Gula sor, jiber ku me guleke bi tenê berçav dikir û me nas dikir kîjan gul e, lê dema em gulê bi sinor nekin û neyê naskirinê, em liser kîjan gulê daxivin , em dibêjin: Gulek sor. Ev bêjeya biçûk ku hevbendiyeke bi vî awayî çêdike: Zêdera nependî jê re tê gotinê.

Zêdera nependî ev e: ek, eke, ekê, ekî, ine, na, in.

Yekhejmar

Ek û ekî jibo nêr. Ek, ekê û eke jibo mê.

Xortekî gul çinî.

Marekî bi Şêrîn veda.

Azadekî serî hilda.

Xortek tivingê hildigre.

Şoreşgerek dijmin ditirsîne.

Gayek kayê dixwe.

Keçekê mar kuşt.

Bizinekê şîr rijand.

Malekê xwarin da.

Keçek nan dixwe.

Gulek avê vedixwe.

Şêrînek teşiyê dirêse.

Min keçeke bedew dît.

Şoreşgereke hêja hat gund.



Kom

Di komê de nav " ina<sup>28</sup> , in " distîne.

Xortin sêvan dixwin.

Keçin pembû diçînin.

Lawina dar birîn.

Keçina kizwan çînîn.

Xortin hatin.

Keçin çûn.

Gulin çilmisîn.

Zarokin dibezin.

Salo darin birîn.

Memo gurin kuştin.

Osman leşkerina dikuje.

Zînê mihina didoşe.

Memo ji kurina pirsî.

Şêro bi xortina dikene.

Ciger dê ji bajarina derbas bibe.

Di navên nêr û mê yên nependî de, em (ekî) û (ekê) di rewşa tewandinê de bi kar tînin.

---

<sup>28</sup>Navên pirjimar dema ku bi (an) tên tewandinê û nependî bin pir caran di şûna (inan) de, (ina) tê nivîsandinê.

#### 1.2.3.1.4. Piçkolekirina navan

Navê piçkole bi danîna paşgînekê çêdibe. Piçkolekirina navan bi armanca hez kirin, xweş kirin, ciwan kirin û pîs kirin û kêmkirinê çêdibe. Mînak:

|          |                      |
|----------|----------------------|
| Baxçe    | ji navê bax          |
| Darik    | ji navê dar          |
| Çetiko   | ji navê çeto (çeter) |
| Hogirko  | ji navê Hogir        |
| Perwînkê | ji navê Perwîn       |

Paşgînên biçûkirina navan ev in:

ek, ok, kok, ole, kole, ik, çe, çik, ko, keke, leke, ûle, oke, k, iko, kê, ikê.

|      |                                               |
|------|-----------------------------------------------|
| ek   | destek, bendek, perdek, pêçek,                |
| ok   | zarok, canok, danok, gulok,<br>şemamok,       |
| kok  | xweşkok, reşkok, delalkok,                    |
| ole  | Reşole, gêjole, hişkole, mêşole,              |
| kole | reşkole, piçkole,...                          |
| ik   | darik, dasik, xweşik, reşik, dilik,<br>keçik, |
| çe   | baxçe, navçe,                                 |
| çik  | rêçik, derçik                                 |
| ko   | Hesenko, rebenko,                             |

|      |                              |
|------|------------------------------|
| kele | sûrkele,                     |
| leke | çoleke,                      |
| ûle  | mêşûle, zerûle,              |
| oke  | baroke,                      |
| k    | gulîk, dargulîk, bijîk, cok, |
| iko  | xortiko, xweşiko, reşiko,    |
| kê   | dilvînkê, Nermînkê,          |
| ikê  | xweşikê, sêvikê, gulikê,     |

#### 1.2.3.1.5. Hejmar ( kom û yekhejmar )

Di zimanê kurdî de du hejmar hene: Yekhejmar û pirhejmar. Yek yekhejmar e û ji yekê û jor de kom e.

##### Yekhejmar

Navê yekhejmar mirovekî, tiştêkî yan jî, lawirekî tenê bi nav dike. Navê yekhejmar nayê guhertin mîna xwe dimîne. Lê di tewandinê de, navê nêr (î) û yê mê (ê) distîne. Navên nePENDÎ (ek) û (eke) distînin û di tewandinê de, ( ekî) û ( ekê ) distînin: Keç, xort, gund, keçek, xortek, keçeke, keçê, xortî, gundî, keçekê, xortekî, gundekî,...

##### Kom

Bêtir ji yekî ji mirovan, tiştan yan jî, lawiran bi nav dike. Dema nav diyar be, paşgîna " an " distîne. Lê dema nediyar be "nan" distîne. Navê kom di hevbendiyê de ( xistinepal ) paşgîna " ên " distîne: Keçan, xortan, keçinan, xortinan, keçên dilsoz, xortên çeleng,...

#### 1.2.3.1.6. Tewandina navan

Navê kom dibin hin mercan de tê tewandinê:

1. Nav, dema ku kirdeyekî bi berkar be di buhêrkê de tê tewandinê.

Şoreşgeran sîxurek kuşt.

Gundiyan serhildan çêkir.

Palan nîsk çinîn.

Xort(î)<sup>29</sup> çek rakir.

Keçê nan pijand.

Keçekê dijmin lerizandin.

Xortekî Şêrgo dît.

Şoreşgerinan sîxurek kuşt.

Gundînan serhildan çêkir.

2. Eger nav kirdeyekî bê berkar be, di herdeman de şût

dimîne û nayê tewandinê.

Cotkar hatin.

Xwendevan rabûn.

Rêwî diponijin.

Dijmin dê bimirin.

---

<sup>29</sup>Tewandina navên nêr kêr tê bikaranînê. Mirov dikare bibêje: Xort çek rakir.

Di vê rewşê de em kombûna nav ji kombûna lêker nas dikin,  
jiber ku lêker " n "a kombûnê distîne: hatin, rabûn, ponijin,  
mirin,...

3. Eger nav di hevokê de kirdeyekî xwedî berkarekî durust  
be, di nihok û mandê de, nayê tewandinê.

Mêr çekan amede dikin.

Jin şoreşgeran bi nan dikin.

Keç xortan dibînin.

Koçer dê biçin zozanan.

Xort dê biçin çiyar.

Gerîla dê dijminan bikujin.

4. Eger nav berkarekî durust be, di buhêrkê de şût dimîne û  
di nihok û mandê de tê tewandinê..

#### Buhêrk

Gundiyan noker kuştin.

Kurdan caş dîtin.

Min şervan dîtin.

Min keç dît.

Min xort dît.



Nihok:

Ez şoreşgeran dibînim.

Em gulan diçînin.

Xort keçan pîroz dîkin.

Mand:

Ez dê şoreşgeran bibînim.

Em dê gulan biçînin.

Ez keçê dibînim.

Ez xort(î) silav dikim.

5. Eger nav di hevokê de berkarekî ne durust be, di her çaxan de tê tewandinê.

Buhêrk :

Min ji xwendekaran pirsî.

Min li şehîdan silav kir.

Min bi şervanan re nan xwar.

Min ji keçê re got.

Te ji xort(î) pirsî?

Nihok:

Ez ji xwendekaran dipirsim.

Ez li şehîdan silav dikim.

Ez bi şervanan re nan dixwim.

Mand:

Ez dê ji xwendekaran bipirsim.

Ez dê li şehîdan silav bikim.

### Veguhastina navan (Tewang)

Nav mîna xwe namîne, di bin hin rewş û hoyan de tê guhastinê. Jibo têgihîştina veguhastina navan, emê bi hev re hevokên jêr berçav bikin.

#### 1. Şêrînê! Tu şoreşgeran dibînî ?

Şêrin > Şêrînê

Azado were vê derê !

Azad > Azado

Keçno, werin dîlanê!

Keç > Keçno

Xortno, ev govenda mêran e.!

Xort > Xortno

#### 2. Hêvînê tiving hilgirt.

Hêvîn > Hêvînê

Ez nameyê dinivîsim.

Name > Nameyê

Min xebat li Botanê dît.

Botan > Botanê

Zoro ji Hewlêrê ye.

Hewlêr > Hewlêrê

Li vî xortî temaşe bikin.

Xort > Xortî

Vî bajarî ez gêj kirim.

Bajar > Bajarî

3. Ez çûbûm çiyê .

Çiya > Çiyê

Min ji hevêl re got

Heval > Hevêl

Min ji ava çêm vexwar.

Çem > Çêm

4. Min ji Hogir re got.

Hogir > Hogir re

Ez di Qamişlo re çûm Dêrikê.

Qamişlo > Qamişlo re

Stirî di piyê Gulê re çû.

Gulê > Gulê re

5. Em bi Zêrê ve çûn.

Zêrê > Zêrê ve

Şûr di pişta Ristem ve çû.

Ristem > Ristem ve

6. Kesbûna şoreşgerî di Nezîr de pêk hatibû

Nezîr > Nêzîr de

Me çayê di beroşê de çêkir.

Beroş > Beroşê de

7. Keçan çek hilgirtin

Keç > Keçan

Gerîlan dijmin hejand.

Gerîla > Gerîlan

Goşt di saringê de bû.

Saring > Saringê de

Koma yekemîn ji hevokên ku me rêz kirine, di darêja bangê de ne; Şêrînê , Azado, keçno û xortno, van navan di vê darêjê de paşgînên: ê, o, û no standine. Em ji van hevokan digihîjin vê derencamê:

Nav di darêja bangê de, tê guhastinê. Navê mê yê yekhejmar paşgîna (ê) distîne, mîna:

Şoreşê !

Yadê !

Xwîşkê !

Hevalê !

Yarê !

Navê nêr yê yekhejmar paşgîna (o) distîne, mîna:

Kurdo !

Rizgaro !

Welato !

Mileto !

Hevalo !

Koma herdu zayendan ( nêr û mê ) paşîna (no) distînin, mîna:

Hevalno!

Dayîkno!

Kurdno!

Miletno!

Koma duyemîn ji hevokan, navên ku di darêja berkariyê de hatine tewandinê dicivîne: Hêvînê, nameyê, Botanê û Hewlêrê , navên mê ne. Ev nav bi paşgîna " ê " hatine tewandinê. Lê xortî, nanî û bajarî navên nêr in û bi paşgîna " î " hatine tewandinê.

Derencam:

Nav di darêja berkariyê de tên tewandinê. Navê mê paşgîna " ê " distîne û navê nêr paşgîna " î " distîne.

Koma sêyemîn ji hevokan tewandina navên nêr ku tîpa " e " yan " a " tê de hebe berçav dike. Çiya bûye çiyê. Çem bûye çêm. Her wiha heval bûye hevêl.

Derencam:

Navê nêr ku tîpa " e " yan " a " di wan de hebe di tewandinê de " e " û " a " dibin " ê "

Gavan > Gavên

Şivan > Şivên

Şervan > Şervên

Xebat > Xebêt

Çem > Çêm



Koma çaremîn ji hevokan rewşeke cemhevî ku bûyer tê de pêk hatiye berçav dike. Jibo vê darêjê awayê bi hev re tê gotinê. Di awayê bi hev re de nav paşgîna " re " distîne û bersiva van pirsan dide:

Bi kê re ?      Tu bi kê re çûyî çiyê?

Ez bi Egîd re çûm çiyê .

Bi çi re ?      Tu bi çi re difirî ?

Ez bi ewran re difirîm.

Ji kê re ?      Te ji kê re got ?

Min ji Zînê re got.

Di ku re ?      Tu di ku re çûyî?

Ez di Qamişlo re çûm.

Di çi re ?      Te derzî di çi re kir?

Min derzî di ber kumê xwe re kir.

Koma pêncemîn ji hevokan yekîtiyekê di navbera bûyerê û kesê ku bûyer hatiye serê wî de berçav dike. Awayê tevayî ji vê darêjê re tê gotinê. Di awayê tevayî de nav paşgîna " ve " distîne û bersiva van pirsan dide:

Di ku ve ?      Şûr di ku ve çû ?

Şûr di pişta Ristem ve çû ?

Bi çi ve ?      Te ker bi çi ve girêda ?

Bi sing ve.

Di çi ve ?      Şûr di çi ve çû ?

Şûr di balgih ve çû.

Di kê ve ?      Gule di kê ve çû ?

Gule di Şîno ve çû.

Koma şeşemîn ji hevokan cihê ku bûyer tê de pêk hatiye berçav dikin. Jibo vê darêjê awayê cîwarî tê gotinê.

Nav di vî awayî de paşgîna (de) distîne û bersiva van pirsan dide:

Di çi de ?      Goşt di çi de ye ?

Goşt di beroşê de ye.

Di kê de ?      Kesbûna şoreşgerî di kê de ye ?

Di Nezîr de ye.

Di ku de ?      Şoreşger di ku de ne?

Şoreşger di mala Dilgeş de ne.

Koma heftemîn ji hevokan, dîsa mîna ya duyemîn, navên ku di darêja berkariyê de hatine tewandinê, dicivîne. Lê vê carê nav pirhejmar e. Di vê rewşê de navê kom bi paşgîna ( an ) hatiye tawandinê.

Gerîla

Gerîlan

Keç

Keçan

Nav di awayê raderî de:

Di darêja raderî de, nav mîna xwe dimîne, nayê guhastinê û bersiva van pirsan dide:

Kî çi dike ?

Kî dibîne ?

Keç dibîne.

Çi çi pê hat ?

Çi ket ?

Xanî ket.

Çi di çi rewşê de ye ?

Çi şikestiyê ?

Derî şikestiyê.

Kî di çi rewşê de ye ?

Kî hişyar e ?

Gel hişyar e.

Nasîn:

Di awayê bi hev re , tevayî û cîwarî de , nav bi daçekan tê tewandinê. Em dikarin jibo van darêjan awayê daçekî bibêjin.

Guhestina navên mê " keç "

| Rêz | Awa     | Pendî-Yek | Nependî-Yek | Pendî-Kom | Nependî-Kom |
|-----|---------|-----------|-------------|-----------|-------------|
| 1   | Rast    | keç       | keçek       | keç       | keçin       |
| 2   | Bang    | keçê      | .....       | keçno     | .....       |
| 3   | Tewandî | keçê      | keçekê      | keçan     | keçnan      |
| 4   | Bihevre | keçê re   | keçekê re   | keçan re  | keçnan re   |
| 5   | Tevayî  | keçê ve   | keçekê ve   | keçan ve  | keçnan ve   |
| 6   | Cîwarî  | keçê de   | keçekê de   | keçan de  | keçnan de   |

### Guhestina navên nêr " xort "

| Rêz | Awa     | Pendî-Yek  | Nependî-Yek | Pendî-Kom | Nependî-Kom |
|-----|---------|------------|-------------|-----------|-------------|
| 1   | Rast    | xort       | xortek      | xort      | xortin      |
| 2   | Bang    | xorto      | -----       | xortno    | -----       |
| 3   | Tewandî | xort(î)    | xortekî     | xortan    | xortnan     |
| 4   | Bihevre | xort(î) re | xortekî re  | xortan re | xortnan re  |
| 5   | Tevayî  | xort(î) ve | xortekî ve  | xortan ve | xortnan ve  |
| 6   | Cîwarî  | xort(î) de | xortekî de  | xortan de | xortnan de  |

### Guhestina navên nêr ( nan )

| Rêz | Awa     | Pendî-Yek | Nependî-Yek | Pendî-Kom | Nependî-Kom |
|-----|---------|-----------|-------------|-----------|-------------|
| 1   | Rast    | nan       | nanek       | nan       | nanin       |
| 2   | Bang    | nano      | -----       | nanino    | -----       |
| 3   | Tewandî | nên(nanî) | nanekî      | nanan     | naninan     |
| 4   | Bihevre | nên re    | nanekî re   | nanan re  | naninan re  |
| 5   | Tevayî  | nên ve    | nanekî ve   | nanan ve  | naninan ve  |
| 6   | Cîwarî  | nên de    | nanekî de   | nanan de  | naninan de  |

#### 1.2.3.1.7. Tewandina navan - darêja berkarî

Di darêja berkarî de nav tê tewandinê. Navê mê paşgîna (ê) distîne û yê nêr paşgîna (î) distîne.

Eger navê nêr tîpên ( e ) yan ( a ) tê de hebin, ev tîp dibin ( ê ). Di rewşên jêrîn de nav dikeve darêja berkariyê:

1. Di buhêrk de, eger nav bi lêkerê derhingêv re kiryar be dikeve darêja berkariyê û tê tewandinê.

Navê mê:

Keçê çeka şoreşê hilgirt.

Keçê

Çêlekê ka xwar.

Çêlekê

Şêrînê gul av dan.

Şêrînê

Ev hevok bi vî awayî dikarin bên ziman:

Çeka şoreşê ji hêla keçê ve hat hilgirtinê.

Ka ji hêla çêlekê ve hat xwarinê.

Gul ji hêla şêrînê ve hatin avdanê.

Navê nêr:

Vî xortî çeka şoreşê hilgirt.

Xortî

Vî hogirî gul av dan.

Hogirî

Ev hevok bi vî awayî dikarin bên ziman:

Çeka şoreşê ji hêla vî xortî ve hat hilgirtinê.



Gul ji hêla vî hogirî ve hatin avdanê.

Navê nêr ku ( a ) di wan de heye:

Gê ka xwar.

Ga > Gê

Êş genim kir ard.

Aş > Êş

Nasîn: Peyvên bav, xal û ap derî vê rêzanê ne. Ev peyv mîna navên mê ( ê ) distînin, yan ( o ) distînin.

Apê / Apo çek hilgirt.

Bavo / Bavê gul çandin.

Xalê / Xalo av vexwar

2. Eger nav di demên nihok û pêşedemê de berkarekî durust be dikeve darêja berkariyê û tê tewandinê.

Navê mê

Nazê tivingê heldigire.

Tivingê

Şînoyê çêlekê bibe mêrgê.

Çêlekê

Gulê bizinê didoşe.

Bizinê

Navê nêr

Nazê goşt(î) dixwe.

Goşt ( î )

Nermînê wî giyayî dikelîne.

Giyayî

Soro nêr dixwe

Nên ( nan )

Gulê dên dikelîne.

Dên ( dan )



3. Eger nav berkarekî ne durust be, di herdemê de tê tewandinê.

Navê mê

Memo li şêrînê dike hawar. Şêrînê

Huner ji Hêvînê pirsî. Hêvînê

Emê li Botanê bibin mêvan. Botanê

Navê nêr

Huner ji Azad(î) dipirse. Azad(î)

Ezê li gundî bibim mêvan. Gundî

Qenco ji êş hat. Êş (aş )

Ez ji zimên hez dikim. Zimên

Guro li Osmên xist. Osmên

4. Di darêja zêderî de, navê dawî tê tewandinê.

Navê mê

Mala jinê. jinê

Kirasê Şêrînê. Şêrînê

Nanê sêlê. Sêlê

Navên nêr

Êşa dil ( î ).

Dil ( î )

Dîtina çav(î).

Çav ( î )

Çûna êş.

Êş ( aş )

Sima gê.

Gê ( ga )

Hilgirtina bêr.

Bêr ( bar )

Gurana nêr<sup>30</sup>.

Êşa serî.

Navê nêr ku ( e ) yan ( a ) di wan de heye, dema bi  
rengdêreke nîşandinê yan rengdêreke hejmarî re bên  
bikaranînê, herdem bi ( î ) tên tewandinê.

Ezê hêsp bikirim.

Ezê vî hespî bikirim.

Berên ceh xwar.

Sî beranî ceh xwarin.

Ez ji berên ditirsim.

Ez ji vî beranî ditirsim.

---

<sup>30</sup>Eger navê nêr bi ( î ) dawî bibe ( î ) yek jê, jibo neyê dubarekirinê dikeve,.

Soza keç û xortên kurd

Şêrînê ! Tivingê hilgire, mîna şêran xwe berde meydana  
rûmetê. Bila dinya bêguh bibihîze.

Mirovahiya kor ya bêçav bibîne. Lalên bêziman bipeyîvin.  
Bila tev bibihîzin, bibînin, biqîrin û bizanibin ku kurd hêdî  
bêrûmetiya sedsalan napejirînin. Azado! pêşmergeyê gelê  
xwe, lehengê serxwebûn û azadiyê, va ye roja me nêzîk  
dibe, bi kena şêrîn ji pişt çîyan ve der tê û dibêje: Şêrînê !  
Hevalê ! Azado! Hevalo !

Hogirno ! Gernasno !

Birgerînin! Govenda azadiyê ye. Kurdistana serbixwe li  
hêviya me ye. Xwe xemilandiye, xêliya kesk û sor û zer li  
xwe kiriye. Azadî, xwe bi rext û fişekan pêça û bejna xwe li  
ba kir. Şêrînê qilêşa xwe avêt milên xwe. Xêliya bûkaniyê  
pêça di nav buxçeya rengîn de. Mil bi mil keç û xortên hêja  
hatin pîrozgeha mêraniyê, soz dan û gotin: Emê herin  
Kurdistanê. Birînên wê derman bikin. bi deşt û çîyan re bibin  
yek. Di şikeft û berqefan de rakevin. Li bajêr me nîn e  
hedar. Çiyayên pîroz dê me hembêz bikin. Emê tîrêjên rojê  
ku ji pişt Cûdî ve dertên bihûnin xêliyên bûkan, landikên  
zarokan jê saz bikin. Êdî dergûşên vala bê mindal mayîn  
pêdiviya me pê nîn e. Emê hêlanên bihuştî ji zarokên xwe  
re bafirînin. Di şûna zîre zîra tank û balefiran de, wê

melodiyên bêmirin bên bihîstinê. Guleyên ku dilên dayîkan  
dax didin dê bibin gul û binefş. Zozanên li koçeran  
qedexekirî dê bibin seyrangehên evîndaran. Em soz didin  
ku her tiştî di welatê agir û rojê de biguherînin, her tiştên  
xweş û ciwan bafirînin. Lê eger em şehîd ketin bila kefenê  
me ji ala rengîn be. Di roja serxwebûn û azadiyê de bi sê  
rengên gulan, kesk û sor û zer gorên me bi xemilînin, jibo  
hestiyên me giyan bidin û vê şadîmeniya mezin pîroz bikin.

#### 1.2.3.1.8. Navên kirdeyî û berkarî

##### Navên kirde

Ev nav bi karekî radibe. Pîşekî yan jî, delametekê pêk tîne. Navên kirdeyî bi hatina paşgînên ku ji koka lêkeran e li dû navan saz dibin. Bi yekgirtina nav û paşgînan, navekî nû saz dibe ku hem wateya nav û hem jî, ya lêker dide. Ev navên lebatî û livbaz bi bizavekê radibin û jibo wan "navên kirde" tê gotinê. Paşgînên ku navên kirde çêdikin, ev in:

|     |                                                                                                                    |
|-----|--------------------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| Van | Aşvan, dergehvan, hozanvan, bilûrvan, gavan, şervan, xwendevan, diloan, şoreşvan, dadvan, rojnemevan, bêrîvan,.... |
| Wan | karwan, pêhlewan,...                                                                                               |
| Kar | Cotkar, xwendekar, serkar, nivîskar, tewankar, xebatkar, hesinkar                                                  |
| Ker | Karker, tevinker, şoreşker, spîker, dagirker, zêrker, şermker,...                                                  |
| Ger | Rojnameger, dadger, şanoger, hesinger, şoreşger, meyger, werger,...                                                |
| Gêr | Wergêr, çapgêr, xwegêr, ...                                                                                        |
| Gir | Masîgir, rexnegir, wênegir, dengir,...                                                                             |



|       |                                                                   |
|-------|-------------------------------------------------------------------|
| Bêj   | Dengbêj, çîrokbêj,...                                             |
| Baz   | Hîlebaz, livbaz, rimbaz, serbaz, canbaz,...                       |
| Pêj   | Xwarinpêj, nanopêj,                                               |
| Pij   | Nanpij,                                                           |
| Kêş   | Wênekêş, barkêş, zehmetkêş,...                                    |
| Dar   | Dildar, koledar, serdar, zordar, dengdar, dikandar,<br>kujdar,... |
| Dêr   | Rengdêr, çavdêr, femandêr,...                                     |
| Nas   | Kurdnas, rojhilatnas, civatnas, mafnas,...                        |
| Zan   | Kurdzan, zimanzan, dengzan, zemînzan,<br>dîrokzan,...             |
| Guhêz | denguhêz, nûçeguhêz, wêneguhêz, ...                               |
| Bir   | Darbir, destbir, qolbir, rêbir, porbir, namebir,...               |
| Bîr   | Rewşenbîr, ronakbîr, ...                                          |
| Firoş | Gulfiroş, meyfiroş, zembîlfiroş, nanfiroş, şîrfiroş,...           |
| Der   | Jander, hewleder,...                                              |
| Saz   | Pîşesaz, dermansaz, plansaz,...                                   |
| De    | Dirinde, bexşînde, girîde                                         |
| Bar   | Xembar, tewanbar, ...                                             |
| Ber   | Rêber, fermanber,...                                              |
| E     | Xwende, xwere, beze, firoke,                                      |
| Yar   | Hişyar, biryar, mafyar,...                                        |
| War   | Bendewar,...                                                      |



|      |                                            |
|------|--------------------------------------------|
| Wer  | Serwer, bîraver, pêşwer, ...               |
| A    | Zana, şareza, hosta,...                    |
| Ar   | Xewar, kevnar,...                          |
| Ok   | Kenok, gerok, revok, serok,...             |
| Mend | Hişmend, hunermend, aqilmend, siyamend,... |
| Er   | Daner,...                                  |

Navê berkar

Ev nav buyerek tê serê wî û dikeve bin barê lêkerê ji babeta xwe. Navê berkar bi danîna paşgîna " î " li dû lêkeran saz dibe. Herwiha navekî nû tê çêkirinê, mîna:

Ketî > Yê ku ketiye.

Lêkera ket<sup>31</sup> + î > Navê berkar

Di navê berkar de, lêker bi xwe dibe nav. Mînak:

Hilgirtin > hilgirt > hilgirtî

Hilbijartin > hilbijart > hilbijartî

Vexwarî

Xwarî

Dîtî

Mirî

Kenî

Dema em dibêjin : Hilbijartî, tê wateya yê ku ketiye bin hîkariya hilbijartinê.

---

<sup>31</sup>Ketin

Ew ket ( kesê sêyemîn yê yekjîmar di dema derbasbûyî de )

#### 1.2.3.2. Cînav<sup>32</sup>

Cînav, di zimanê Kurdî de peyveke şûna navan digire.

Mîna:

Hogir diçe şoreşê.

Ew diçe şoreşê.

Hacer qehreman e.

Ew qehreman e.

Hacer ala şoreşê bilind kir.

Wê ala şoreşê bilind kir.

Gelê Kurd dijmin lerizand.

Wî dijmin lerizand.

Wek tê xuyakirinê, cînavên: Ew, ew, wê û wî şûna Hogir,

Hacer û gelê Kurd digirin û di hevokê de bi delameta van navan radibin.

---

<sup>32</sup>Cînav      Bernav ( Zemîr )

Beşên cînavan

1.2.3.2.1. Cînavên kesok (kesanî):

Ev cînav şûna navên kesan digirin. Ew jî, du awa ne:

1. Awayê rast:

A- Yekhejmar

Kesê yekemîn, yê ku dipeyive

Ez

Kesê duwemîn, yê ku pê re tê axaftinê

Tu

Kesê sêyemîn, yê kû axaftin liser e û ne amade ye

Ew

B - Kom

Kesên yekemîn, yên ku dipeyivin

Em

Kesên duwemîn, yên ku bi wan re tê axaftinê

Hûn

Kesên sêyemîn, yên ku liser wan tê axaftinê û ne li wir in

Ew

## 2. Awayê tewandî

A - Yekhejmar

Kesê yekemîn, yê ku dipeyive

Min

Kesê duwemîn, yê ku pê re tê axaftinê

Te

Kesê sêyemîn, yê ku axaftin liser e lê ne li wir e

jibo nêr

Wî

jibo mê

Wê

B - Kom

Kesên yekemîn, yên ku dipeyivin

Me

Kesên duwemîn, yên ku bi wan re tê axaftinê

We

Kesên sêyemîn, yên ku liser wan tê axaftin û ne amade ne wan

## 1. Awayê rast

Bi lêkerên derhingêv re

Di dema berê(buhêrk) de berkarê durust tên:

|                      |               |
|----------------------|---------------|
| Xebat(î) ez dîtim.   | wî ez dîtim.  |
| Şêrînê tu dîtî.      | wê tu dîtî.   |
| Dilberê ew dît.      | wê ew dît.    |
| Hewesê em dîtin.     | wê em dîtin.  |
| Comerd(î) hûn dîtin. | wî hûn dîtin. |
| Şevger(î) ew dîtin.  | wî ew dîtin.  |

Cînavên: Ez, tu, ew, em, hûn û ew di hevokên jorîn de berkarên durust in.

Di dema niha de (nihok) kirde (kiryar) tên:

|                        |                 |
|------------------------|-----------------|
| Ez xebat(î) dibînim.   | Ez wî dibînim.  |
| Tu Şêrînê dibînî.      | Tu wê dibînî.   |
| Ew Dilberê dibîne.     | Ew wê dibîne.   |
| Em Hewesê dibînin.     | Em wê dibînin.  |
| Hûn comerd(î) dibînin. | Hûn wî dibînin. |
| Ew Şevgerî dibînin.    | Ew wî dibînin.  |

Cînavên: Ez, tu, ew, em, hûn û ew di hevokên jorîn de kirde(kiryar) ne.

Di mandê de (pêşedemê de) kirde tên

Ezê gulê av bidim.

Ezê wê av bidim.

Tuyê (tê) sêvê bixwî.

Tuyê wê bixwî.

Ewê Amedê pîroz bike



Ewê wê pîroz bike.

Emê serxwebûnê bibînin.

Emê wê bibînin.

Hûnê şoreşê pêş de bibin.

Hûnê wê pêş de bibin.

Ewê Newrozê geş bike.

Ewê wê geş bike.

Cînavên: Ez, tu, ew, em, hûn û ew di hevokên jorîn de  
Kirde ne (Kiryar in).

Bi lêkerên nederhingêv re :

Di herdeman de kiryar ( kirde ) tên. Mînak:

Nihok

Ez difirim.

Tu difirî.

Ew difire.

Em difirin.

Hûn difirin.

Ew difirin.

Pêşedem

Ezê biçim

Tuyê( tê ) biçî.

Ewê biçe.

Emê biçin.

Hûnê biçin.

Ewê biçin.

### Bûhêrk

Ez ketim

Tu ketî.

Ew ket.

Em ketin.

Hûn ketin.

Ew ketin.

Ev awayê cînavan di herdeman de bi lêkerên nederhingêv re tên bikaranînê, lê bi lêkerên derhingêv re, tenê di dema nihok û pêşerojê de tên bikaranînê. Herwiha bi navan re bi alîkariya lêkera "bûn" tên bikaranînê. Mînak:

Ez kurd im.

Tu kurd î.

Ew kurd e.

Em kurd in.

Hûn kurd in.

Ew kurd in.

Ez im.

Tu yî.

Ew e.

Em in.

Hûn in.

Ew in.

Ez pale me.

Tu pale yî.

Ew pale ye.

Em pale ne.

Hûn pale ne.

Ew pale ne.

## 2. Awayê tewandî

Ev awayê cînavan tenê bi lêkerên derhingêv re tên bikaranînê:

a. Di dema berê (buhêrk)de kirde ne ( kiryar in ).

Min al hilgirt

Te al hilgirt.

Wê al hilgirt.

Wî al hilgirt.

Me al hilgirt.

We al hilgirt.

Wan al hilgirt.

b. Di dema niha ( nihok ) de berkarê durust in.

Nazê min dibîne.

Nazê te dibîne.

Nazê wê dibîne.

Nazê wî dibîne.

Nazê me dibîne.

Nazê we dibîne.

Nazê wan dibîne.

c. Di pêşedemê( mandê ) de berkarên durust tên:

Gulê dê min bibîne.

Gulê dê te bibîne.

Gulê dê wê bibîne.

Gulê dê wî bibîne.

Gulê dê me bibîne.

Gulê dê we bibîne.

Gulê dê wan bibîne.

d. Di herdeman de berkarên ne durust tên:

Azad (î) li min dixê. ( Nihok )

Şêrînê li te xist. ( Buhêrk )

Şermînê dê li wî bixê. (Pêşedem)

Ev awayê cînavan bi nava re nayên bikaranînê. Em dibêjin:

Ez şoreşger im.

Tu kurd î .

Ew bedew e.

Di Kurmancî de nabe, em bibêjin :

Min şoreşger im.

Te kurd î.

Wê bedew e.

Cînav hemû bêzayend in ( bêcins in ), tenê di awayê tewandî de, kesê sêyemîn ( wî, wê ) bizayend e." Wî " jibo nêr û " wê " jibo mê tê bikaranînê. Mînak:

Hawar dijmin lerizand. Wî dijmin lerizand.

Hacer dijmin lerizand. Wê dijmin lerizand.

Cînavên kesok herdem kirde yan jî , berkar in.

#### 1.2.3.2.2. Cînavên bêhêl

Cînavên bêhêl di kurdî de herdem berkar in û şûna cînavên kesok digirin. Cînavên bêhêl ev in: Ê, hev, êk, xwe.

Ê

Ev cînavê bêhêl, herdem yekhejmar e, li dû lêkeran tê û şûna " wî " û " wê " digire. Mîna:

Min tiving da Sozdarê.

Min tiving da wê.

Min tiving dayê.

Min gul da Azad.

Min gul da wî.

Min gul dayê.

Sozdarê        ->        wê                -> ê

Azad            ->        wî                -> ê

Ev cînav bi daçekên ( ji, li, bi, di ) re dibe yek û bi vî awayî  
cînavên lihevxiştî tên çêkirinê . Mîna:

Li wî xist                      Lê xist

Li wê xist                      Lê xist

Bi wî çû                        Pê çû

Bi wê çû                        Pê çû

Di wî de çû                    Tê de çû

Di wê de çû                    Tê de çû

Ji wî pirsî                      Jê pirsî

Ji wê pirsî                      Jê pirsî

Li wî ( li wê )                Lê

Bi wî ( bi wê )                Pê

Di wî ( di wê )                Tê

Ji wî ( ji wê )                Jê

Mînak:



Min li dijmin xist.

Min li wî xist.

Min lê xist.

Şêro ji Şêrînê pirsî.

Şêro ji wê pirsî.

Şêro jê pirsî.

Ez bi pêûsê dinivîsînim.

Ez bi wê dinivîsînim.

Ez pê dinivîsînim.

Ez di zanîngehê de me.

Ez di wê de me.

Ez tê de me.

Cînavê bêhêl "ê" şûna berkarên durust digire. Mîna:

Min gula sor da Hêvînê.

Min gula sor da wê.

Min gula sor dayê.

Lê ev cînav bi daçekan re şûna berkarên ne durust digire.

Mîna:

Min ji Gulê pirsî.

Min ji wê pirsî.

Min jê pirsî.

Hev

Ev cînav ji ( hev û din ) ku di şûn de bûye: hevdin , hatiye kurtkirinê û bûye hev. Hev, şûna berkarên durust jî, û yên ne durust jî, digire. Mînak:

Me hev dît.

Gulê û Hacer hev dîtin.

Gerîla û gundiyan hev dîtin.

Me li hev xist.

Şêrînê û Sozdar ji hev pirsîn.

Gundî û polîs bi hev çûn.

Cînavê "hev" bi daçekan re dibe yek û cînavên lihevxiştî çêdike.

|        |     |
|--------|-----|
| Bi hev | Pev |
|--------|-----|

|        |     |
|--------|-----|
| Ji hev | Jev |
|--------|-----|

|        |     |
|--------|-----|
| Di hev | Tev |
|--------|-----|

|        |     |
|--------|-----|
| Li hev | Lev |
|--------|-----|

Mînak:

|                   |                |
|-------------------|----------------|
| Em bi hev re çûn. | Em pev re çûn. |
|-------------------|----------------|

|             |          |
|-------------|----------|
| Ji hev çûn. | Jev çûn. |
|-------------|----------|

|                |             |
|----------------|-------------|
| Di hev de bûn. | Tev de bûn. |
|----------------|-------------|

|               |            |
|---------------|------------|
| Li hev hatin. | Lev hatin. |
|---------------|------------|

Êk

Ev cînav jî, bi wateya " hev " tê . Ji (êk û din) ku di şûn de  
bûye ( êk din ) hatiye kurtkirinê û bûye  
êk . Ev cînav jî , mîna hev tê bikaranînê. Şûna berkarên  
durust digire.

Mînak:

Noşîn û Hêvî êk dîtin.

Cegermij û Noşeng êk pîroz kirin.

Şûna berkarên ne durust jî, digire. Mîna:

Me ji êk (jêk) pirsî.

Roşeng û Noşeng li êk ( lêk ) xistin.

Cînavê bêhêl " êk " bi daçekan re dibe yek û cînavên  
lihevxiştî çêdike .

Bi êk

Pêk

Li êk

Lêk

Ji êk

Jêk

Di êk

Têk

Mînak:

Em bi êk hatin

Em pêk hatin.

Em li êk hatin

Em lêk hatin.

Em ji êk çûn

Em jêk çûn.

Em di êk de çûn

Em têk de çûn.

## Xwe

Ev cînavê bêhêl bi cînavê (rajêr) tê binavkirinê. Cînavê "xwe" şûna nav û cînavên nêr û mê kom û yekhejmar digire.

Mînak:

Min al da destê hevalê xwe.

Ez ji gelê xwe re dibêjim: "An kurdistan, an Kurdistan".

Dema ku kirde û berkar di hevokê de yek kes be, cînavê "xwe" şûna berkar digire. Mîna:

Min xwe nas kir.

Te xwe dît.

Wî xwe şîşt.

Cînavê "xwe" herdem berkar e, lê carnan bi kirdeyekî din re dibe kirde, dema du kes bi kar radibin. Mînak:

Ez û hevalê xwe çûn çiyê.

Min û hevala xwe pirtûk xwend.

## Nasîn

1. Dema çend cînav di hevokê de hebin, li gor kesan rêz dibin:

Ez, tu, ew, em, hûn, ew.

Min, te, wî, wê, me, we, wan.

Mînak:

Ez û ew, em çûn bajêr.

tu û ew heval in.

2. Eger di hevokê de çend lêker bi kirdeyekî pêk hati bin, kirde careke tenê tê gotinê. Wek:

Ez çûm, gihîştîm û vegeriyam.

Lê eger lêkerin derhingêv û hin nederhingêv bin li gor lêker cînav tê bikaranînê:

Ez çûm , min dît.

Ez çûm , min xame kirî.

Hevoka : Em çûn , me hesp ji xwe re kirî. Hin bi vî hawayî bikar tînin:

Me çû hesp ji xwe re kirî.

#### 1.2.3.2.3. Cînavên nîşandek

Ev cînav şûna navên dûr û nêzîk, bi awakî ku van navan nîşan dikin digirin. Ev cînav ev in:

1. Cînavên ku dûrbûn û nêzîkbûna navê ku şûna wî digrin, diyar nakin, lê tenê hejmar û zayenda navdêr diyar dikin.

jibo zayendê nêr û yekhejmar :

yê

Yê ku te dît hevalê min bû.

Jibo zayendê mê û yekhejmar :

ya

Ya ku te dît şoreşger bû.

Jibo koma herdu zayendan :

yên

Yên ku te dîtî gerîla bûn.

Ev cînav bi serê xwe nayên. Herdem bi cînavên girêdanê  
( ku ) re tên û kirde ne.

2. Cînavên nîşandek jibo navdêrên nêzîk :

Ev

Ev hat.

Ev hevalê min e.

Ev hevala min e.

Ev cînav li gor navderê ku nîşan dide, tê tewandinê:

Jibo nêr yekhejmar dibe :

Evî

Evî kalî got.

Jibo mê yekhejmar dibe:

Evê

Evê keçê ez dîtîm.

Jibo nêr û mê kom:

Evan

Evan keç û xortan got.

Gelek caran tîpa "e" ji " evî, evê, evan " tê avêtinê û dibin:

Vî, vê, van.



Jibo kûrkin û xurtkirina hizra nîşandinê "ev" bi zêderê re tê  
û dibe : eva, evê, evên.

Evê hat heval e.

Eva hat şervan e

Evên hatin gerîla ne.

Carna "ha" dikeve dawiya cînavê nîşandek û zêderê û ew jî,  
dibe cinavekî nîşandek :

Evê ha, eva ha, evên ha.

Evê ha Azad e.

Eva ha Şêrîn e.

Evên ha Azad û Şêrîn in.

3. Cînavên nîşandek jibo navderên dûr :

Ew

Ew xort kî ye?

Ew hevala min e .

Ew heval hatin.

Ev cînav jî, li gor navê ku nîşan dike, tê tewandinê.

Jibo nêr, yekhejmar dibe:

Ewî

Ewî xortî çi got?

Jibo mê, yekhejmar dibe:

Ewê

Ewê keçê xelat girt.

Jibo nêr û mê kom dibe:

Ewan

Ez ewan keç û xortan hez dikim.

Ji bo kûrkin û xurtkirina hizra nîşandinê "ew" bi zêderê re  
tê û dibe: Ewê, ewa, ewên.

Ewê hat xortekî jîr e.

Ewa hat keçeke bedew e.

Ewên hatin xort û keçên gundê me ne.

"Ha" dikeve dawiya cînavê nîşandek û zêderê û ew bixwe jî,  
dibe cînavêkî nîşandek: Ewê ha, ewa ha, ewên ha.

Ewê ha li ber xwe dide.

Ewa ha xebatê dike.

Ewên ha têkoşer in.

"Ew", di awayê xwe yê tewandî de, gelek caran "a" davêje û  
dibe: Wî, wê, wan

Wî xortî xweş got.

Wê keçe tiving hilgirt.

Wan keç û xortan serî hildan.

Di vê rewşê de, ji wateya hevokê mirov cudayî dixwe navbera  
cînavên kesok ( wî, wê, wan ) û cînavên  
nîşandek ( wî , wê, wan )<sup>33</sup>.

---

<sup>33</sup>Eger navdêr li pey van cînavan hebe, hingê dibin cînavên nîşandek.

Cînavê nişandek ( ev, ew ) kirde jî, û berkar jî, tên bikaranînê.

Lêkerên derhingêv bi evî, evê, ewî, ewê re

### Nihok

Di nihokê de, ev cînav şûna berkarên durust û ne durust digirin:

Ez ewî (ewê) dibim dibistanê.

Ez evî (evê) dibim seyrane.

Beran li ewî ( ewê ) dixê.

Beran li evî ( evê ) dixê.

### Buhêrk

Di buhêrkê de, ev cînav şûna kirde digirin:

Evî (evê) nan xwar.

Ewî (ewê) pîvaz xwar.

Di vê rewşê de şûna berkarê nedurust jî, digirin:

Berên li evî ( evê ) xist.

Berên li ewî ( ewê ) xist.

### Pêşedem

Di vê demê de şûna berkarên durust û nedurust digirin:

Ezê ewî (ewê) bitirsînim.

Ezê ewî (ewê) bibînim.

Mamoste wê ji ewî( ewê) bipirse.

Mamoste wê ji evî (evê) bipirse.

Lêkerên derhingêv bi (ev, ew) re

Nihok

Di nihokê de şûna kirde digirin:

Ev nên dixwe.

Ew avê vedixwe.

Pêşedem

Di pêşedemê de, şûna kirde digirin.

Evê min bigire.

Ewê te bibîne.

Buhêrk

Di buhêrkê de, şûna berkarê durust digirin:

Min ev dît.

Min ew xwar.

Lêkerên nederhingêv bi ( ev, ew ) re

Herddem şûna kirde digirin.

Ev çû welat.

Ew ji Botanê tê.

Ev diçe dibistanê.

Ew difire.

Evê bikeve avê.

Ewê ji bajêr derkeve.

Lêkerên derhingêv bi (evan, ewan) re

### Buhêrk

Di buhêrkê de şûna kirde digirin:

Evan xwar.

Ewan em dîtin.

### Nihok

Di nihokê de şûna berkarê durust û ne durust digirin:

Ez evan dibînim.

Ez ji wan dipirsim.

### Pêşedem

Di pêşedemê de şûna berkarê durust û ne durust digirin

Ezê evan bişînim welat.

Ezê ji wan bipirsim.

### Nasîn

Hin cînavên nîşandek di devok de awayên xwe winda kirine û ketine awakî din:

|         |      |      |       |
|---------|------|------|-------|
| Evê ha  | vîna | vaya |       |
| Eva ha  | vêna | vaya |       |
| Evên ha | vêna | vana | evana |
| Ewê ha  | wîna | waya |       |
| Ewa ha  | wêna | waya |       |
| Ewên ha | wêna | wana | ewana |

Lê ya durust ev e:

Ev, evî, evêha, evê, evaha, evan, evên, evênha.

Ew, ewî, ewêha, ewê, ewaha, ewan, ewênha.

Cînavê nîşandek "ev" bi bêjeyên : şev, roj û sal re dibe " î ".

|        |      |
|--------|------|
| Ev şev | îşev |
| Ev roj | îroj |
| Ev sal | îsal |

#### 1.2.3.2.4. Cînavên pêgehîn ( girêkî )

Cînavê pêgeh dikeve paşîya navdêr an cînavekî din û wan bi hevoka di pey wan re girê dide. Cînavê pêgehîn di zimanê kurdî de yek e. Ew jî, ev e: Ku

Cînavê "ku" di hevokê de, carna kirde û carna berkar e.



### Kirde

Ê ku tu dîtî heval bû.

Mirovê ku tu dîtî heval bû.

A ku tu dîtî şoreşger bû.

Keça ku tu dîtî şoreşger bû

### Berkar

Ê ku te dît gerîla bû.

Kesê ku te dît gerîla bû.

A ku te dît şehîd ket.

Keça ku te dît şehîd ket.

Evê ku tu dibînî mamoste ye.

Cînavê (ku) bi zêderê re tê bikaranînê :

Ê ku, a ku, ên ku, êd ku

Cînavê (ku) bi cînavên nîşandek re tê bikaranînê:

Evê ku, eva ku, ewê ku, ewa ku, evên ku, evêd ku, ewên ku, ewêd ku,.

Mînak:

Xameya ku min kirî sor e.

Hespê ku te kirî boz e.

Ev çiyayê ku tu dibînî Cûdî ye.

Azadê ku tu nas dikî hevalê min e.

Di zimanê kurdî de, ji cînavê pêgeh û pê ve

(ku)yeke din heye pêwend (gihanek) e ev (ku)

du hevokan digihîne hev û herdem li pey

lêkeran tê. Mîna:

Em hatin ku em bixwînin.

Em diçin çiya ku em azad bibin.

Carna (ku) bi wateya heke tê ,

hingê (beriya lêker) jê re tê gotinê.

Ku gel serî hilde emê azad bibin.

Ku gerîla bên gund emê dilşad bibin.

#### 1.2.3.2.5. Cînavên pirsyariyê

Cînavên pirsyariyê di hevokên pirsyarî de,

şûna navan digirin û li gor pêkhatina hevokê carna berkar û carna kirde ne. Cînavên pirsyariyê ev in:

Kî, kê, kîjan, çi, çend, ku, çima, jiber çi, çawa,

kengî, ji kengî ve, li kuderê, bi kuderê ve,

ji kuderê ve, di kuderê re, di kuderê de, ma,...

Kî ( ki )?

Ev cînav di hevoka pirsê de şûna navê mirovan digire.

Di lêkerên derhingêv de:

### Buhêrk

Kî? Şûna berkarê durust digire. Mîna:

Te kî (ki) dît?

We kî(ki) tirsand?

### Nihok

Kî? Şûna kirde digire. Mîna:

Kî sêvê dixwe?

Kî bersiva min dide?

### Pêşedem

Kî? Şûna kirde digire. Mîna:

Kiyê ( kî dê ) pirtûkê bixwîne?

Kiyê ( kî dê ) min bigire?

### Di lêkerên nederhingêv de

Kî? Herdem kirde ye.

Kî hat gund?

Kî diçe bajêr?

Kiyê biçe bajêr?

Kî? Tê tewandinê û dibe (kê?).

Kîjan?

Ev cînavê pirsyarî ji van bêjeyan tê bikaranînê: (kî, ji, van, yek) yan jî, (kî, yek, ji van) û li gelek deverên Kurdistanê, bi van awayî tê bikaranînê: kîjan, kuja yan jî, kîjik.

Ev cînav jibo kes û tiştan tê bikaranînê. Kîjan, li gor navdêra ku şûna wê digire tê tewandinê û bi navê nêr re dibe: Kîjanî û bi yên mê re dibe: Kîjanê. Bi koma herdu zayendan re dibe: Kîjanan. Mînak:

Kîjanî ji van Azad dît ?

Kîjanê tu dîtî ?

Kîjanan pez çêrand ?

Bi lêkerên derhingêv re

Buhêrk

Di dema berê de şûna kirde û berkar digire.

Kirde

Di vê rewşê de, kîjan tê tewandinê:

Kîjanî kirî ?

Kîjanê got ?

Kîjanan dît ?

Berkar

Di vê rewşê de, kîjan nayê tewandinê:

Te kîjan pirtûk kirî ?

Te kîjan keç dît ?

Te kîjan xort dît ?

Lê dema Kîjan dibe berkarê nedurust, tê tewandinê. Mîna:

Te li kîjanê xist ?

Te ji kîjanî pirsî ?

### Nihok û pêşedem

Di şûna kirde de kîjan nayê tewandinê. Mîna:

Kîjan dikire ?

Kîjan dê bibîne ?

Lê di şûna berkar de tê tewandinê:

Tê kîjanê bibînî ?

Tu ji kîjanî hez dikî ?

Ewê kîjanî bikire ?

Emê ji kîjanî bipirsin ?

### Bi lêkerên nederhingêv re

Herdem kirde ye û nayê tewandinê:

Kîjan hat ?

Kîjan diçe ?

Kîjan dê bê ?

Kê?

Ev cînavê pirsiyarî şûna navên mirovan digire.

### Di lêkerên derhingêv de

#### Buhêrk

Di dema berê de, kê şûna kirde digire:

Kê got ?

Kê kiras kirî ?

#### Nihok û pêşedem

Kê şûna berkarê durust digire:

Tu kê dibînî?

Tê kê bitirsînî ?

Di herdeman de (kê) şûna berkarê ne durust digire. Mîna:

Te li kê xist ?

Tu ji kê dipirsî ?

ewê ji kê bipirse ?

Kê, bi lêkerên nederhingêv re nayê bikaranînê.

Cînavê pirsiyariyê ( kê ), (kî) bi xwe ye di awayê tewandinî de ye.

Ku?

Ev cînav şûna navê cih û deveran digire. Mîna:

Tu li ku bûyî ?



Tu ji ku tê ?

Ku dever xweş e ?

Cînavê ku ji avêtina bêjeya (dever) ji kudever hatiye kurtkirinê.

Tu ji ku yî ?

Tu ji kudeverê yî ?

Tu ji kuderê yî?

Carna cînavê kîjan cihê (ku) digire û kîjan der tê bikaranînê, yan jî, (kî) û dibe kîder. Ev cînav bi daçekan re tînin bikaranînê: Ji kîderê? Ji kuderê? Di kîderê de?

Di kuderê de? Bi kuderê ve? Bi kîderê ve? Di kuderê re?  
Di kîderê re?

Çi?

Ev cînav, di hevoka pirsê de, şûna navên bêgiyan (bêrîh) digire.

### Di lêkerên derhingêv de

Herdem berkar e. Mîna:

Te çi kirî ?

Tu çi dikirî ?

Ewê çi bikire ?

Tu li çi dixî ?

Ewê li çi bixe?

Te li çi xist ?

### Di lêkerên nederhungêv de

Herdem şûna kirde digire. Mîna:

Çi hat ?

Çi diçe ?

Çiyê biçe ?

Cînavê pirsyariyê (çi) bi bêjeyên din re tê bikaranînê û cînavên pirsyariyê çêdike:

Bi cînavê (ma) re dibe: Çima?

Ma tu hatî ?

Çima tu hatî ?

Ma tu lal î ?

Çima tu lal î ?

Ma tu bindest î ?

Çima tu bindest î ?

Bi cînavê (ma) mirov pirs dike jibo ku agahdarê tiştekî bibe. Lê dema çi bi ma ve dibe, mirov haydar e ji wê agahiyê, lê dixwaze nepejirîne û neqayîlbûna xwe liser diyar bike. Yan jî, sedem û egerên wê agahiyê bizani be:

Ma tu kurd î ?

Çima tu kurd î ?

Çi, bi bêjeya (awa) ve dibe çi awa û çawa tîr çêkirinê . Bi cînavê pirsyarî ( çawa ) miriv li hal û rewşa tiştekî, mirovekî, kesekî (mirov, candar) dipirse:

Tu çawa yî ?

Hespê te çawa ye ?

Xaniyê te çawa ye ?

Rojên te çawa derbas dibin ?

Tu çawa debar dikî ?

Çi , bi daçekên " jibo, jiber, jibona" re tê girêdanê û cînavên pirsyariyê " jibo çi? jiber çi? jibona çi " çêdike. Bi van cînavan em sedem û egerên tiştan dipirsin:

Jiber çi tu duh nehatî malê ?

Jibo çi em bindest in ?

Jibona çi ev kuştin û talan ?

Çend?

Ev cînavê pirsyarî şûna hejmarnavan digire:

Te çend gul jê kirin ?

Te çend keç dîtin ?

Çend gerîla hatin gund ?

Çend gundî çûn şoreşê ?

Tu çendan dibînî ?

Cînavê pirsyariyê (çend) tenê , di koma herdu zayendan de tê tewandinê:

Te ji çendan pirsî ?

Tu çendan nas dikî ?

Çend, carna cînavê nependî ( nebinavkirî ) ye:

Min çend şoreşger dîtin.

Ez çend rojan li gund mam.

Di vir de (çend) bi wateya ( hinek ) tê û wateya xwe ya pirsîyariyê wînda dike.

Kengî?

Bi vî cînavê pirsîyariyê , mirov li dem û çaxê buyerekê dipirse:

Kengî tê bê(yî) mala me?

Kengî emê hev bibînin?

Kengî tu çûyî gund ?

Kengî, bi daçekê (ji.... ve) cînavê pirsîyarî ( ji kengî ve ) çêdike:

Ji kengî ve tu neçûyî welat ?

Ji kengî ve tu li vir dimînî?

Ji kengî ve dibistana we dest pê kiriye ?

Ma?

Bi vî cînavê pirsîyariyê mirov liser tiştekî agahdar dibe:

Ma tu dizanî bi kurdî bixwînî?

Ma ev çi rewşa em tê de ne ?

Ma tu hozan î ?

Gelo?

Ev jî , mîna " ma" ye û carna pê re tê.

Gelo! Emê bi ser kevin?

Gelo! Ew çû welat ?

Ma gelo heye em rizgar bibin?

Ma gelo heye em bibin xwedî welat ?

#### 1.2.3.2.6. Cînavên nependî ( nebinavkirî )

Ev cînav şûna navan bi awakî nependî û nenaskirî digirin.

Di zimanê kurdî de gelek cînavên nependî hene, ji van cînavan:

Yek, heryek, tu, tukes, kes, tu, tutîşt, herkes, hertişt, tişte, hin, hinek, filan, behvan, hîç, gişt, hemû, hemûkes, her, tev, hîn, hinek, çend, çendek, pir, gelek, tenê, mirov, heçî,... Mînak:

Min tukes nedît .

Yekê digot yekî: Li me pêroz be yekî!

Herkes dibêje : Bijî Kurdistan!

Ez tişteyê dibînim.

Gişt dibêjin: An serkeftin, an serkeftin!

Tev dibêjin : An Kurdistan, an Kurdistan!

Cînavên nependî mîna navan tên tewandinê:

Yek, yekî, yekê, yekan, kes, kesî, kesê, kesan,...



#### 1.2.3.2.7. Cînavên xwemalîn (arzî, xwedanî )

Ev cînav şûna navekî ku xwedanekî wî di hevokê de heye digire. Cînavên xwedanî ji du cînavan bi hev dikevin.

Cînavên xwedanî ev in :

Jibo nêr, yekhejmar :

Yê min, yê xwe, yê te, yê evî, yê evê , yê ewî, yê ewê, yê me, yê we, yê evan, yê ewan.

Jibo mê , yekhejmar:

Ya min, ya xwe, ya te, ya evî, ya evê, ya ewî, ya ewê, yê me, yê we, yê evan, yê ewan.

Jibo koma herdu zayendan :

Yên min, yên xwe, yên te, yên evî, yên evê, yên ewî, yên ewê, yên me, yên we, yên evan, yên ewan.

Her cînavê ji du cînavan pêk hatiye, mîna: Yê min. Cînavê pêşî "yê" hejmar û zayenda tiştan diyar dike, lê cînavê duwemîn "min" hejmar û zayenda kesê xwedanê wî diyar dike. Dema cînavê duwemîn cînavêkî nîşandek be, wek: Yê evî, ji bilî zayend û hejmar dûrbûn û nêzîkbûnê jî, diyar dike.

Mînak:

Gula min.

Ya min.

Destê ewî.

Yê ewî.

Guliya ewê.

Ya ewê.



Çiyayên me.

Yên me.

Kirasê evê.

Yê evê.

Cînavên xwedanî ji cînavên nependî jî, çêdibin, Wek:Ya  
filan, yê hinekan, ya tukesî, yê kê,...

### 1.2.3.2.8. Tewandina cînavan

Cînavê pirsyariyê " kîjan? "

| Rêz | Awa     | Mê         | Nêr        | Kom         |
|-----|---------|------------|------------|-------------|
| 1   | Rast    | Kîjan?     | Kîjan?     | Kîjan?      |
| 2   | Bang    | -----      | -----      | -----       |
| 3   | Tewandî | Kîjanê?    | Kîjanî?    | Kîjanan?    |
| 4   | Bihevre | Kîjanê re? | Kîjanî re? | Kîjanan re? |
| 5   | Tevayî  | Kîjanê ve? | Kîjanî ve? | Kîjanan ve? |
| 6   | Cîwarî  | Kîjanê de? | Kîjanî de? | kîjanan de? |

Cînavên pirsyariyê " kî? " û " çi? "

| Rêz | Awa     | Kî?    | Çi?    | Mê          | Nêr          |
|-----|---------|--------|--------|-------------|--------------|
| 1   | Rast    | Kî?    | Çi?    | Çi jin?     | Çi xort?     |
| 2   | Bang    | -----  | -----  | -----       | -----        |
| 3   | Tewandî | Kê?    | Çi?    | Çi jinê?    | Çi xortî?    |
| 4   | Bihevre | Kê re? | Çi re? | Çi jinê re? | Çi xortî re? |
| 5   | Tevayî  | Kê ve? | Çi ve? | Çi jinê ve? | Çi xortî ve? |
| 6   | Cîwarî  | Kê de? | Çi de? | Çi jinê de? | Çi xortî de? |

### Cînavên nîşandek " ev " û " ew "

| Rêz | Awa     | Ev-Mê   | Ev-Nêr  | Ev-Kom  | Ew-Mê   | Ew-Nêr  | Ew-Kom  |
|-----|---------|---------|---------|---------|---------|---------|---------|
| 1   | Rast    | Ev      | Ev      | Ev      | Ew      | Ew      | Ew      |
| 2   | Bang    | -----   | -----   | -----   | -----   | -----   | -----   |
| 3   | Tewandî | Evê(Vê) | Evî(Vî) | Evan    | Ewê(Wê) | Ewî(Wî) | Ewan    |
| 4   | Bihevre | Evê re  | Evî re  | Evan re | Ewê re  | Ewî re  | Ewan re |
| 5   | Tevayî  | Evê ve  | Evî ve  | Evan ve | Ewê ve  | Ewî ve  | Ewan ve |
| 6   | Cîwarî  | Evê de  | Evî de  | Evan de | Ewê de  | Ewî de  | Ewan de |

### Cînavên kesok

| Rêz | Awa     | Yek 1  | Yek 2 | Yek 3    | Kom 1 | Kom 2 | Kom 3  |
|-----|---------|--------|-------|----------|-------|-------|--------|
| 1   | Rast    | Ez     | Tu    | Ew       | Em    | Hûn   | Ew     |
| 2   | Bang    | -----  | ----- | -----    | ----- | ----- | -----  |
| 3   | Tewandî | Min    | Te    | Wî / Wê  | Me    | We    | Wan    |
| 4   | Bihevre | Min re | Te re | Wî/Wê re | Me re | We re | Wan re |
| 5   | Tevayî  | Min ve | Te ve | Wî/Wê ve | Me ve | We ve | Wan ve |
| 6   | Cîwarî  | Min de | Te de | Wî/Wê de | Me de | We de | Wan de |

### 1.2.3.3. Rengdêr

Rengdêr bêjeyeke reng, salix, pesin, kêsim û rewşa navan dide zanînê. Rengdêr, herdem li dû navan tê , wek:

Gula sor.

Çiyayê pîroz.

Ev hesp beze ye.

Keça kurd jîr e.

#### 1.2.3.3.1. Rengdêra pesinde ( salixdanê )

Ev rengdêr rewşa navekî bi başî yan jî, bi nebaşî tîne ziman, mîna bêjeyên :

Baş, sor, bilind, pîs, hêja,...

Rengdêra pesinde bi zêderê re yan jî , bi lêkera bûn re tê bikaranînê.

A. Bi zêderê re

Keça baş.

Xortê hêja.

Dijminê hov.

Gelên gernas.

B. Bi lêkera bûn re

im, î, e, in, in, in, bû, be

Ev xort şoreşger e.

Ev keç bedew e.

Azad jîr e.

Xebat hozan bû.

Di rengdêra pesinde de, bêjeyên mîna : Belengaz, ciwan, pîr, bextiyar,... Bi serê xwe rengdêr in û mîna navan tîn bikaranînê.

#### 1.2.3.3.2. Rengdêrên dumil

Ev rengdêr bi du awa tîn sazîrîne:

##### A. Rengdêrên afirandî (xurdezad)

Ev rengdêr bi alîkariya paşgîn û pêşgînan ji nav û lêkeran çêdibin. Paşgînen ku rengdêrên afirandî çêdikin ev in:

Baz        Canbaz, tîrbaz, rimbaz, sextebaz,....

Kar        Cotkar, alîkar, sextekar,...

Ker        Zîvker, zêrker, şûrker, hesinker,...

Van        Bilûrvan, şervan, gavan,...

Bend       Solbend, sazband, ...

Vanî       Aşvanî, xêlvani, bajarvani,...

Gîn        Gulgîn, rengîn, xemgîn, lezgîn, xwazgîn,...

Yar        Hişyar, bextiyar, kiryar,...

|      |                                        |
|------|----------------------------------------|
| Dar  | Serdar, bindar, guhdar, dildar,...     |
| Anî  | Mêranî, piranî,...                     |
| Ane  | Şahane, hovane,...                     |
| Î    | Gundî, çiyayî, kurdistanî,...          |
| Ger  | Şoreşger, şevger, dadger, şanoger,.... |
| Mend | Cegermend, hişmend, hunermend,...      |
| Gêr  | Wergêr, Xwegêr, kargêr,....            |

Pêşgînên ku rengdêrên afirandî çêdikin ev in:

|     |                                    |
|-----|------------------------------------|
| Hev | Heval, hevrê, hevkar, hevpîşe,...  |
| Nîv | Nîvro, nîvşev, nîvsal, nîvnan,.... |
| Ho  | Hogir, hozan, hoşeng,...           |

#### B. Rengdêrên hevbend

Rengdêrên hevbend, bi van awayên jêr saz dibin:

##### 1. Bi ketina zêderê:

|              |            |
|--------------|------------|
| Dilê şad.    | Dilşad     |
| Bejna zirav. | Bejinzirav |
| Çavê reş.    | Çavreş     |

##### 2. Bi guhestina cihê bêjeyan:

|               |           |
|---------------|-----------|
| Bihayê giran. | Giranbiha |
| Roja xweş.    | Xweşroj   |



3. Ji du navan bi anîna navê berkar:

Bavkuştî

Dilşewitî

4. Ji nav û lêkerekî :

Dilrevîn

Dengbêj

Mêrkuj

Dengir

5. Ji rengdêr û lêkerekî:

Xweşgo

Pirgo

Reşbîn

Pakbîn

Pêpelûka rengdêran

Rengdêrên pesinde, pesnê navdêran bi pêpelûkên têvil (cuda) didin zanînê. Di van rengdêran de sê (3) paye hene: xwerû, payepîv û bêpaye.

1. Rendêra xwerû

Bêjeyek ragîr û bi serê xwe ye, wek:

Sor, reş, nû, kevin, mezin, bilind, jîr,...

## 2. Rengdêra payepîv

Ev rengdêr xwedî pilik e, xwedî, paye ye, ev paye jî, bi van bêjeyan tê pîvanê:

Pir, hindik, gelek, kêr, zêde, bêtir,...

Ev gul pir sor e.

Çiyayê Agirî gelek bilind e.

Di vê rengdêrê de sê paye tên dîtin: Nizimpaye, hevser û bilindpaye.

### A. Nizimpaye

Dema ku du nav di pesindanê de dikevin berheviyê, kêmbûn û nizimbûna navekî di wê rewşê de bi van bêjeyan tê xuyakirinê: Kêr, hindik (hindek).

Azad kêr ceger e.

Şêrî hinekî jîr e.

Cano kêr semax e.

### B. Hevser

wekheviya du navan di pesindanê de belî dike. Jiber ku her du nav di vî pesnê de di yek payê de ne û pila wan yek e. Ev rengdêr bi alîkariya bejeyên : Wek û mîna saz dibin.

Reşo wek Xebat şoreşger e.

Hacer mîna Bêrîvan gernas e.

### C. Bilindpaye

Ev rengdêr bi xwe rengdêra xwerû ye, lê paya wê bi paşgîna : tir û tirîn bilind dibe.

Dema ku berhevî di pesindanê de di navbera du navan de be. Navê yekemîn xwediye paya yekemîn rengdêra xwerû distîne. Mîna:

Ev çiya bilind e.

Lê navê duwemîn , xwediye paya bilindtir rengdêra xwerû bi anîna paşgîna (tir) distîne, Mîna:

Ev çiya bilindtir e.

Nermîn jîr e. Şermîn jîrtir e.

Gulê gewr e. Jînê gewirtir e

Hogir dirêj e. Memo dirêjtir e.

### 3. Rengdêrên bêpaye

Ev rengdêr pesnekî bilind yan jî , pir bilind dide nav, Di rengdêra bêpaye de sê pêpelûk tên xuyakirinê.

Dema em berheviyê bi pesnê (sor) dikin navbera sê gulan , em dibêjin:

Ev gul (pir) sor e. (pir sor)

Ev gul (hîn) sortir e. ( sortir)

Ev gul sortirîn e. ( sortirîn)

Pir hîn - tir tirîn

Pir sor e (hîn) sortir e sortirîn e  
Çiyayê Gebarê (pir) bilind e, Cûdî hîn bilindtir e, lê Agirî  
bilindtirîn e.  
Zozanên Şerefdînê pir xweş in, derya wanê hîn xweştir e, lê  
sersing xweştirîn e.

### Nasîn 1

Bêjeyên mîna mezintir dibin meztir.  
"Ar", di bêjeya Kevnar de şûna tir digre.  
Kevnar Kevintir  
Pirtir Bêtir  
"Ar", di bêjeya xewar de şûna tir digire.  
Xewar Bi xewtir

### Nasîn 2

Dema navdêr tê avêtinê, zêder dikeve pêşiya rengdêrê û bi  
delameta cînav radibe, wek:  
Ez gula sor û ya zer dibînim.  
Ya , şûna gulê digir e û bi karê cînav radibe.

### Nasîn 3

Carna navdêr yekcar ji hevokê dikeve û rengdêr mîna cînavekî li şûnê dimîne û bi delameta cînav radibe û mîna wî tê tewandinê. Herwiha ji rewşa rengdêrî dikeve:

Tirsim bimirim nebînim esmera min

Riya Mêrdînê bi kaş e

Delala min.

Esmera min                      Yara mina esmer.

Delala min                      Yara mina delal

Esmer û delal du rengdêr in, lê navdêrên wan ketine. Jibo vê mîna navdêran bi zêderê re hatine tewandinê.

#### 1.2.3.3.3 Rengdêrên nîşandek

Ev rengdêr cînavên nîşandek bi xwe ne. Dema ku navdêr di hevokê de tê gotinê, ev cînav dibin rengdêr, wek:

Ev mirov îro ji Amedê hat.

Ew keç îro ji çiyê hat.

Evî xortî got.

Evê keçê got.

Bi rengdêra nîşandek re navê nêr li gor rêzana gelemper tê tewandinê, wek:

Ez evî nanî dixwim. ( Nabe ku em bêjin - nê )

Ez ji evî bajarî hez dikim.

Ez evan bajaran dibînim.

Dema ku gelek navdêr ji yek hejmarê bin û zayenda wan ne yek be jî, em yek rengdêra nîşandek tînin û navdêrê dawî tenê tê tewandinê, wek:

Evî tîr û kevanî bide min.

Ez evî xort û keçê dibînim.

Rengdêra nîşandek jî, di vê rewşê de li gor zayenda navdêra pêşî tê tewandinê.

Lê dema ku zayenda navdêran ne yek be, her yek rengdêra nîşandek li gor hejmara xwe, distîne.

Ez evê gulê û evan daran dibînim.

Ez ji ewî bajarî û ewan gundan hez dikim.

#### 1.2.3.3.4 Rengdêra hejmarî

Rengdêra hejmarî, hejmar bi xwe ye, dema ku di hevokê de bi navdêra xwe re bê, wek:

Heşt şoreşger hatin.

Bîst şervan çûn çiyê.

Sed gerîla ketin bajêr.

Rengdêra hejmarî du beş in : Jimarîn û rêzîn



#### A. Jimarîn

Ev rengdêr hejmara navdêr dide zanîn. Dikeve pêşiya navdêr û li gor tewanga xwe navdêr dide tewandinê, wek:

Deh gul vebûn.

Şeş mirovan got.

Çil keçî biryara şoreşgerî da.

Ezê neh pirtûkan bikirim.

#### B. Rêzîn

Ev rengdêr dikeve paşiya navdêran û rêza wan dide zanîn, wek:

Azadê şeşane di rêzê de.

Hespê min yê sisêyan derket di bezê de.

Gulê di rêza sihî de ye.

Rengdêra rêzîn bi xwe tê tewandinê û tewanga xwe nade navdêr. Carna rengdêra rêzîn hejmara rêzê jî, diyar dike, dema ku ev rêz mîna koman be.

Gerîla çar çar hatin.

Gundî deh deh diçûn.

Jimarnavên didu û sisê dema dibin rengdêrên hejmarîn, dibin du û sê, wek:

Du mirov mirin.

Sê mirov hatin mala me.

#### 1.2.3.3.5 Rengdêra pirsiyarî

Ev rengdêr cînavên pirsê bi xwe ne. Dema ku dikevin pêşiya navdêr dibin rengdêrên pirsiyarî:

Çend firok hatin ser we ?

Kîjan xortî got ?

Çend mirovan xwar ?

#### 1.2.3.3.6 Rengdêra nependî

Ev rengdêr cînavên ne pendî ne. Dema ku dikevin pêşiya navdêra xwe dibin rengdêrên nependî:

Hemû mirovan dît.

Min tu çare nedît.

Min filan kes dît.

Min çend gur dîtin.

#### 1.2.3.3.7 Rengdêra xwedanî ( arzî, xwemalîn )

Ev rengdêr ji cînavên kesok û nîşandek pêk tê . Li pey navdêran tê , lê ew bi xwe gerek e, li pey cînavên xwedanî " yê, ya, yên " bihata. Ev rengdêr û navdêra xwe bi zêderê, bi hev tên girêdanê. Cînavên ku dibin rengdêrên xwedanî ev in: Min, xwe, te, vî, vê, wî, wê, me, we, van, wan.

Pirtûka min.

Gulê û Şêro kurê xwe dîtin.

Keça van.

Bexçeyê wan.

desmala vê.

Gundê min û te.

### Nasîn

dema gelek rengdêrên pesinde di hevokê de bi navekî ve dibin, bi vî awayî tên bikaranînê.

1. Navê nêr yekhejmar:

Navdêr zêdera "ê" distîne. Rengdêrên navîn " î " distînin û ya dawî mîna xwe dimîne, nayê guhertinê.

Mînak:

Xortê çelengî jîrî qenc.

Çiyayê asêyî bilindî pîroz.

kevîrê reşî sitemî şahîkî gelover.

Lê dema nav nependî be "ekî" distîne.

Xortekî çelengî jîrî qenc.

Çiyayekî asêyî bilindî pîroz.

Kevîrekî reşî sitemî şahîkî gelover.

Beraneke kolî gîrsî qer.

Şoreşgerekî zaneyî mêrxasî leheng.

## 2. Navên mê yekhejmar

Navdêr zêdera "a" distîne lê rengdêrên navîn "e" distînin û ya dawî mîna xwe dimîne, nayê guhertinê, wek:

Keça rinde bedewe ciwan.

Ava zelale kûre xurt.

dara bilinde heşîne xweşik.

Lê dema navdêr nependî be "eke" distîne, wek:

Çêlekeke beieke bilinde bişîr.

Keçeke rinde bedewe jîre şoreşger.

Goleke firehe kûre bigere bitirs.

## 3. Koma herdu zayendan ( nêr û mê )

Navdêr zêdera "ên" distîne. Lê rengdêrên navî "e" distînin û ya dawî mîna xwe dimîne nayê guhertinê, wek:

Keçên rinde bedewe şoreşger.

Xortên çelenge qence mêrxas

Lê dema navdêr nependî be, "in" distîne. Wek:

Çemin dirêje xurte boşav.

Şervanin jîre çelenge mêrxas.

### 1.2.3.4 Hejmar

Hejmar perçeyek ji axaftina zimanê kurdî ye. Li gor ho û mercên hevokê, bêjeyên vî beşê axaftinê tên guhertinê.

#### 1.2.3.4.1 Beşên hejmarê

##### 1. Hejmarên bingehîn:

##### a. Hejmarên dehên pêşî (yekemîn):

1 yek

2 du

3 sê

4 çar

5 pênc

6 şeş

7 heft

8 heşt

9 neh

10 deh

##### b. Hejmarên dehên duwemîn:

11 yazdeh<sup>34</sup>

12 duwazdeh

13 sêzdeh

14 çardeh

---

<sup>34</sup>Hin herêm dibêjin: Deh û yek, deh û didu, deh û sisê,...

15 pazdeh

16 şazdeh

17 hivdeh

18 hijdeh

19 nozdeh

20 bîst

c. Hejmarên dehtayî:

10 deh

20 bîst

30 sî(sih)

40 çil (çel)

50 pêncî (pêncih)

60 şêşt

70 heftê

80 heştê

90 not

100 sed

ç. Hejmarên sedtayî:

100 sed

200 dused

300 sêsed

400 çarsed

500 pêncsed



600 şeşsed

700 heftsed

800 heştсед

900 nehsed

1000 hezar

d. Hejmarên mezin:

1000 000 milyon (hezar hezar)

1000 000 000 milyar (hezar milyon)

Bi gelenperî hejmarên bingehîn di kurdî de bi vî awayî çêdibin:

0 nîn ( sifir, hîç )

1 yek

2 du (dido)

3 sê(sisê)

4 çar

5 pênc

6 şeş

7 heft

8 heşt

9 neh

10 deh

11 yazdeh

12 diwazdeh

13 sêzdeh

14 çardeh

.....

20 bîst

21 bîstûyek

22 bîstûdu

23 bîstûsê

24 bîstûçar

25 bîstûpênc

.....

30 sih (sî )

31 sihûyek

32 sihûdu

.....

40 çil

41 çilûyek

42 çilûdu

.....

50 pêncih (pêncî)

51 pêncihûyek

55 pêncihûpênc

.....

60 şêst

61 şêstûyek  
.....  
70 heftê  
71 hetêûyek  
.....  
80 heştê  
81 heştêûyek  
.....  
90 not  
91 notûyek  
.....  
100 sed  
101 sedûyek  
.....  
200 dused  
201dusedûyek  
202 dusedûdu  
300 sêsed  
301sêsedûyek  
1000hezar  
1001 hezarûyek  
100 001 sedhezarûyek  
101 000 sedûyekhezar

## Nasîn

Di kurdî de hejmar ji milê çepê ve (ji milka bilind ve) tên xwendinê.

### 1.2.3.4.2 Tewandina hejmarên bingehîn

#### Yek

Yek bi "ê" tê tewandinê

Min ji yekê<sup>35</sup> pirsî.

Min ji bîstûyekê re got.

Sedûyekê ez dîtîm.

Sala hezarûnehsedûyekê.

Di sala 1981ê de, ez çûm zanîngehê.

Di sala 1991ê de, şerê gel li Kurdistanê xurt bû. Jimara yekê ku dikeve pêşiya navdêrekê, ew navdêr li gor tewangên xwe tê tewandinê. Jiber ku yek tewanga xwe liser navdêrên ku pê ve tên girêdanê bi rê ve nabe.

Ji yek hespî pê ve min nedît.

Ji yek xortî pê ve nepeyîvî.

Ji yek gulê pê ve bihn nedida.

Ji yek keçê pê ve min hez nekir.

---

<sup>35</sup>Jimara yekê li vir ne bi wateya şexsekê ye.

### Nasîn

Dema hejmar hevbend be ( bîstûyek , çilûyek )

hingê perçeyê duwemîn tenê tê tewandinê û

perçê yekemîn mîna xwe dimîne:

ji bîstûyekê

Sala nehsedûyekê

Ji didowan heta bîstan

Hejmarên ji didowan heta bîstan bi "an" tên tewandinê, wek:

Diduwan ji min pirsîn.

Çaran ez dîtim.

Min ji dehan re got.

Çardehan ez girtim.

(1920) Sala hezarûnehsedûbîstan.

Di sala (1914)an de ,şerê cihanê yê yekemîn vêket.

( hezarûnehsedûçardehan)

Di sala 1984an de şerê çekdarî li Kurdistanê dest pê kir.

( Hezarûnehsedûheştêûçaran).

Ev hejmar( 2 -20 ) tewangên xwe didin navdêrên xwe jî, ev navdêr li gor tewanga van hejmaran tên tewandinê:

Min ev tiving bi şeş zêran kirî.

Bîst mirovan rê birîn.

Hijdeh keçan çek hilgirtin.

Çar salan min xwendina zanîngehê kir.

Hejmarên ji( 2 - 20 )dema bi serê xwe tên û navdêra wan ji hevokê dikeve ew bi xwe tên tewandinê. Lê dema bi navdêra xwe re tên, navdêra xwe didin tewandinê.

Hejmarên dehtayî ( 30,40, 50,.....100 )

Ev hejmar bi "î" tên tewandinê:

Sihî ji min pirsî.

Min ji çilî re got.

Sala 1990î, sala Serhildana Gelî ye.

Di sala 1980î de conta faşist hat desthilatîyê.

Sedî ji min re got : " Neçe Ewropa."

Sala (1970)î (hezarûnehsedûheftêyî)

Jimarên ( 30, 40, 50, 60, 70, 80, 90, 100 ) dema navdêra wan dihevokê de be, tewanga xwe didinê:

Min ev çek bi sed zêrî kirî.

Min ev şal bi çil pereyî kirî.

Sih mirovî rêveçûn çêkirin.

Pêncî kesî ez dîtîm.

Hezar

Hezar jî, mîna hejmarên dehtayî bi " î " tê tewandinê û tewanga xwe dide navdêran:



Hezarî bi hev re digotin: " Bijî Kurdistan ".

Min ji hezarî pirsî.

Hezar mirovî digotin : An Kurdistan an Kurdistan!

Min ev pirtûk bi hezar pereyî kirî.

Dema hezar bi hejmareke din re tê bikaranînê dikeve bin  
hîkariya wê hejmarê û li gor tewanga wê tê tewandinê:

Ji çar hezaran yek hat.

Sed hezarî serî hildan.

Bîst hezaran digotin: " Bimre bindestî ".

Yek hezarê min heye.

Di vê rewşê de hezar nikare navdêra xwe bitewîne û ew bi  
xwe jî, nayê tewandinê ku navdêr hebe:

Min ev tişt bi çar hezar zêr kirî.

### Nasîn

Rêzana ku liser hezarî dimeşe liser milyon û milyardî jî,  
dimeşe:

Milyonî digot: " kurd namirin."

Milyon kurdî soz didan ku riya şehîdan bişopînin.

Dema hejmar ne diyar be û guman liser hebe, herdem bi  
"an" tê tewandinê:

Bi hezaran gelê me serî hildide.

Bi milyonan alîkarî jibo şoreşê diçe.

Bi sedan rewşenbîr dibin yek.

## 2. Hejmarên rêzde

Ev hejmar bi paşgîna " emîn " dawî dibin:

Yekemîn , duwemîn, sêyemîn, çaremîn, pêncemîn, şeşemîn, ....

Ev hejmar cihê navdêrekê di nav rêzekê de diyar dîkin.

## 3. Hejmarên parçeyî yên bingehîn

$1/2 = nîv$ ,  $1/3 = sêyek$ ,  $1/4 = çaryek$ ,  $2/3 = sêdu$ ,  $5/4 = çarpênç$ ,....

Tewandina hejmarnava "nîv"

dema nîv bi serê xwe be, bi "î" tê tewandinê:

Nîvî bide min.

Me bi nîvî kir.

Di vê rewşê de ku navdêr bê gotinê, ev navdêr li gor tewanga xwe tê tewandinê:

Nîv nanî bide min.

Min ev tişt bi nîv zêrî kirî.

nîv sêvê bixwe.

Sed û nîv rojê min kar kir.

Dema "nîv" bi hejmarekê ve dibe li gor tewanga wê hejmarê tê tewandinê:

Bîst û nîvan.

Çar û nîvan.

Sed û nîvî.

Çil û nîvî.

Yek û nîvê.

Hejmarên parçeyî yên dehyekî

0.1 = nîn xal yek, 0.02 = nîn xal nîn dido,

1.45 = yek xal çilûpênc,....

4. Hejmarên Tewaw

0, 1, 2, 3, 3, 4, 5, 6, ....

Nîn, jore 1, jore dido, jore sisê,...

0, -1, -2, -3, -4, -5, -6,....

Nîn, jêre 1, jêre dido, jêre sisê,...

5. Hejmarên cotîn

2, 4, 6, 8, 10, 12, 14, ...

Jore dido, jore çar, jore pênc,...

-2, -4, -6, -8, -10, -12, -14, ...

Jêre dido, jêre çar, jêre pênc,...

6. Hejmarên dabeş

2, 4, 6, 8, 10, 12, 14, ...

-2, -4, -6, -8, -10, -12, -14, ...

7. Hejmarên xwebeş

1, 3, 5, 7, 9, 11, 13, 15, 17, 19, 21, 23, .....

8. Hejmarên carkirî

Carek, ducar, sêcar, ....

Yeko yeko, dido dido, ....

Yekta, duta, sêta, ...

9. Hejmarên kombêj

şeşek, heftek, heşte, ...

### Ehmedê Xanî û zarok

Rojek ji rojan Ehmedê Xanî, şêst zarokên kurd, keç û kur birin mala xwe. Mêvaniyeke mezin jibo wan li dar xist. Di şûn de, di nav wan de rûnişt û got: Ev gotinên min giring in, hûn di dilê xwe de veşêrin. Hûn biçûk in. Hûn geş in. Bê derd û xem dilîzin û dikenin. Ev dema dilgeşiyê ye. Eger hûn dixwazin her gav bextiyar bibin û tu caran pir bedbext nebin, li du tiştan bigerin: Heskirin û xebat. Kî hez ji we bike, hez jê bikin. Îroj, hez ji mirovên xwe bikin. Hez ji dê û bavên xwe bikin. Hez ji hevalên xwe bikin. Di şûn de hûnê hînî hezkirina diya me gişan, Kurdistanê bibin.

A diduwa, bixebitin. Îroj, jibo hînbûnê, jibo zanînê bixebitin. Daku hûn di halê dinê de bizanibin pêş ve biçin. Bibin mirov. Bibin hêja. Bibin serbest. Bibin însan.

Gava hûn dersên xwe baş dizanin. Dilê mamosteyê xwe xweş dikin. Hûn jî, geş dibin. Ji barekî giran rizgar dibin. Sivik dibin. Ev her gav wisa ye. Bixebitin, daku dilê we her gav ji we xweş be. Gava dilê mirov vehêsayî û biken be. Ew mirov tu caran ne bedbext e.

Zarokên delal !

Ez bi we bextiyar im. Ez dixwazim hûn jî, bi min dil xweş bibin. Daku welat jî, bi hezkirina me, her gav şa be.



### 1.2.3.5 Lêker

Lêker peyvek e guhêrbar e, di zimanê kurdî de, kar, kirin, bûn û hebûna mirovekî, tiştêkî yan jî, lawirekî nîşan dike. Ev peyv li gor dem, kes û raweya kirinê tê guhertinê. Di darêja raderiyê de yan ku dema lêker bê têkilî ye mîna nav tê bikaranînê. Ji vê darêjê re "rader" tê gotinê.

Mînak: kirin, birin, hatin, ketin, hilgirtin, rûniştin, kirîn, birîn, firîn, çûn, bûn, sûn, man, dan, pan, hejandin, lerizandin, firandin, .... ûwd.

Radera lêker du parçe ye, kok û paşgîn:

|       |          |
|-------|----------|
| kirin | kir - in |
| kirîn | kirî - n |
| çûn   | çû - n   |
| man   | ma - n   |

Paşgîna lêkerên kurdî herdem (n) e , jiber ku (i) tîpeke sist û lawaz e. Bi ketina (n) ew bi xwe jî, ji dawiya lêker dikeve.

|          |      |
|----------|------|
| kir - in | kir  |
| kirî - n | kirî |
| çû - n   | çû   |
| ma - n   | ma   |

Dema ku em radera lêker bi dem, kes, hejmar û raweyekê re têkildar dikin, lêker li gor wan hoyan tê veguhastinê . Di



vê rewşê de , li gor demê du kokên lêker tên ber çavan, ew jî, ev in : Koka demên berê (KDB) û koka demên niha û pêşedemê (KDN).

Bi ketina paşgîna lêker, rasterast koka demên berê ( KDB ) bi dest me dikeve.

kir - in                      kir

Kir, lêkera kirin e bi kesê sêyemîn yê yekhejmar re di buhêrk de. Wî / Wê kir.

Jibo bi destxistina koka demên niha û pêşedemê tu rêzanên tevayî nîn in. Tenê lêkerên ku bi (andin) û (în ) dawî dibin bi rê ne (rêzan liser wan dimeşe).

Lêkerên ku bi ( andin ) dawî dibin:

"din" dikeve û "a "cihê xwe dide "î":

Revandin          Revan          Revîn

Kelandin          Kelan          Kelîn

Lêkerên ku bi "în" dawî dibin:

" î n " dikeve û parçeyê dimîne koka dema niha û pêşedemê ye ( KDN )

Kirîn                  Kir

Birîn                  Bir

Hemû lêkerên din, pêwîst e mirov fermaniya wan nas bike ev jî, bi jiberkirinê çêdibe.

Kirin                  Bike                  Bi-k-e                  k

Gotin

Bibêje

Bi-bêj-e

Bêj

#### 1.2.3.5.1 Veguhastina lêker

Ji têkildariya radera lêker bi kes, dem, hejmar û raweyan re " veguhastin " tê gotinê:

Min pênivîsek baş kirî.

Azad diçe şoreşê .

Min du gulên sor dîtin.

baş bixebite tê serfiraz bibî.

Di veguheştina lêker de, pêwîst e em berî her tiştî kokên deman nas bikin. ( KDB ) jibo hemû demên derbas bûyîn û ( KDN ) jibo demên nihok û pêşedemê.

Dema mirov lêker vediguhêze çar tiştên bingehîn tîn ber çavan ew jî, ev in : Kes, dem, hejmar û rawe.

#### 1. Kes

Kes, mirovek e, tişteke yan jî, lawirek e. Navek e yan jî, cînavek e. Bi karekî radibe yan jî, bûyereke tê serê wî û berkar dibe. Kesê bikarekî yan bi xebatekê radibe, jê re kiryar tê gotinê. Lê kesê ku di hevokê de bûyerê tê serê wî, jê re berkar tê gotinê.

a. Kiryar (Kirde)

Kiryar kesek e, mirovek e, tişteke e yan lawirek e. Cînav e yan jî, nav e. Di hevokê de bi karekî radibe û xebatekê dike.

Şoreşger hatin.

Agir geş dibe.

Xwendekar silav dikan.

Ez diçim dibistanê.

Min Hogir dît.

Wê gulek sor da min.

Wî name nivîsand.

Di van hevokan de, şoreşger, agir û xwendekar her yek navek e û bi karekî rabûye. Herwiha ez , min, wê û wî jî, cînav in, her yek bi karekî rabûye. Hemû jî, di hevokê de kiryar in.

b. Berkar

Kesê ku di hevokê de bûyer tê serê wî berkar e.

Dijmin Zoro kuşt.

Hacerê dijmin lerizand.

Di van hevokan de, zoro û dijmin du nav in. Bûyerek hatiye serê wan. Zoro hatiye kuştinê û dijmin hatiye lerizandinê. Ji van navan re, berkar tê gotinê. Dibe ku berkar nav be yan cînav be. Mirov be, tişt be yan jî, lawir be. Rasterast bi

lêkereke derhingeve ve tê girêdanê. Lê bi awayekî ne rasterast bi lêkera nederhîngêv ve jî, tê girêdanê.

Berkar bi du beşan par ve dibe: Berkarê durust û berkarê nedurust.

#### Berkarê durust

Berkarê durust, bûyer rasterast tê serê wî.

Şervan dijminan dikujin.

Gundî rê dibirin.

Memo Zînê dixwaze.

Navên dijminan, rê û Zînê rasterast bûyerên kuştin, birîn û xwastinê hatine serê wan. Tu bindarên din jî, bi wan re nîn in.

#### Berkarê nedurust

Ew berkarê ku di hevokê de, bûyer rasterast nayê serê wî, jiber ku berkarekî din nediya pê re heye jê re berkarê nedurust tê gotinê.

Daçekên "di, bi, ji, li" şûna berkarê nediya ku bûyerê bi berkarê nedurust re hildigre, digirin.

Şoreşgeran li dijmin xistin.

Min ji mamoste pirsî.

Dijmin û mamoste di van hevokan de berkarên ne bi serê xwe ne. Jiber ku di buyerê de berkarekî din hevalê wan heye, lê navê wî nehatiye diyarkirinê .

Dema em dipirsin: Şoreşgeran bi çi li dijmin xist ? Bersiva vê pirsê, berkarekî din bi dijmin re heval diyar dike, mîna : Bi çekan, bi daran, bi keviran, bi rokêtan,...lêxistin. Herwiha, min çi ji mamoste pirsî ? Navê wî, temenê wî, dîroka Kurdistanê,....

## 2. Dem

Di veguheştina lêkeran de, sê demên bingeîn hene: Dema niha ( nihok), dema bê (pêşedem) û dema buhirî (buhêrk).

Niha, ez diçim dibistanê.

Sibe, ezê biçim bajêr.

Par ez çûm welêt.

## 3. Hejmar

Du hejmar di kurdî de hene. Yek, yekhejmar e û bêtir ji yekê kom e. Hejmara lêker bi hejmara kiryar û berkar ve girêdayî ye. Eger berkar di hevokê de nebe hejmara lêker li gor kiryar e:

Azad hat. (yekhejmar)

Şervan hatin. (kom)



Lê dema ku berkar di hevokê de hebe hejmar li gorê tê:

Te ez dîtîm. ( yekhejmar )

Te em dîtîm. (kom)

#### 4. Rawe

Rawe, awa û dirûva ku lêker tê de tê veguhastinê ye. Di

kurdî de, ev rawe hene:

Raweya fermanî

Raweyên hekeyî ( Lavij û bijoke ).

Raweya gumanî

#### 1.2.3.5.2 Di lêkeran de rader

Berî ku lêker bê veguhastinê, di rewşa xwe ya hîmî de ye û bi kes, dem, hejmar û raweyê re têkildar nebûye. Ji vê rewşê re rader tê gotinê. Radera lêker herdem bi " n " dawî dibe. Di piraniya raderan de "i" pêşiya "n" digire, lê tîpeke jar û lawaz e bi ketina "n" ew jî, ji dawiya lêker dikeve.

Radera lêker du parçe ye, kok û paşgîn:

|       |        |
|-------|--------|
| çûn   | çû-n   |
| man   | ma-n   |
| dan   | da-n   |
| kirîn | kirî-n |
| hatin | hat-in |



gotin                      got-in

Dema paşgîn tê avêtinê (KDB) dimîne.

çû, ma, da, kirî, hat, got.

Jibo naskirina (KDN) tu rêzanên tevayî nîn in. Tenê jibo raderên ku bi "în" û "andin" dawî dibin rêzan heye. Lê yên din pêwist e bîr jiberkirinê. Jibo hesanîkirina vî karî em raderên lêkeran li gor tîpên dawiyê di van koman de par ve dikin:

1. Raderên ku bi "in" dawî dibin: Ev rader di sê koman de dicivin:

- a. Raderên ku bi "andin" dawî dibin
- b. Raderên ku bi "tin" dawî dibin.
- c. Raderên ku bi "rin" dawî dibin.

2. Raderên ku bi "în" dawî dibin.

3. Raderên ku bi "an" dawî dibin. Ev rader bi awayê din jî, tên bikaranînê:

a. Carna "an" dibe "ayin" :

dan                      dayin

b. Carna "an" dibe "andin" :

pêçan                      pêçandin

c. Carna " an " dibe " iyan " :

geran      geriyan

4. Raderên ku bi "ûn" dawî dibin:

a. Carna " ûn " dibe " ûyîn " :

bûn      bûyîn

b. Carna " ûn " dibe " ûtin " :

cûn      cûtin

### Nasîn

Radera lêker mîna nav tê bikaranînê û navê kirin û bûnê yan jî, navê raderî jê re tê gotinê.

#### 1.2.3.5.3 Raweya fermanî û (KDN)

Koka dema niha (KDN)

Parçeyê radera lêker ku dibe binyata veguhastinê di demên nihok û pêşedemê de, jê re koka dema niha tê gotinê. Ev kok jî, ji fermaniya lêker tê naskirinê.

kirin      bi-k-e      k

Ez dikim.      Ezê bikim.

## Raweya fermanî

Raweya fermanî bi berxistina pêşgîna (bi) di pêşiya koka dema niha û paşgîna (e) çêdibe.

dan                      bi-d-e

birin                    bi-b-e

kirîn                   bi-kir-e

### 1. Raderên ku bi " in " dawî dibin

#### a. Raderên ku bi (andin) dawî dibin

Di van raderan de (din) dikeve û (a) dibe (î):

kelandin      kelan      kelîn

Herwiha paşgîn û pêşgînên fermaniyê bi parçeyê mayî ve dibin.

weşandin      bi-weşîn-e      weşîn

ceribandin      bi-ceribîn-e      ceribîn

hêrandin      bi-hêrîn-e      hêrîn

pijandin      bi-pijîn-e      pijîn

revandin      bi-revîn-e      revîn

Li gor rêzana jor gerek nake mirov fermaniya van lêkeran nas bike. Dikare yekser ( KDN ) nas bike: ( in ) dikeve û ( a ) dibe ( î )

b. Lêkerên ku radera wan bi (tin) dawî dibe

Paşgîna (tin) ji raderê dikeve û parçeyê mayî pêşgîn û paşgîna fermaniyê distîne:

|          |            |       |
|----------|------------|-------|
| girtin   | bi-gir-e   | gir   |
| jentin   | bi-jen-e   | jen   |
| hêrtin   | bi-hêr-e   | hêr   |
| simtin   | bi-sim-e   | sim   |
| nihêrtin | bi-nihêr-e | nihêr |

c. Lêkerên ku radera wan bi (istin) dawî dibe

(Tin) tê avêtinê û (is) dibe (ês):

|            |            |         |
|------------|------------|---------|
| heristin   | bi-herês-e | herês   |
| hilawistin | hilawês-e  | hilawês |
| ristin     | bi-rês-e   | rês     |

d. Raderên ku bi (iştin) dawî dibin

|             |            |          |
|-------------|------------|----------|
| hilperiştin | hilperêş-e | hilperêş |
| maliştin    | bi-mal-e   | mal      |
| rûniştin    | rûn-e      | rûn      |
| veniştin    | ven-e      | ven      |

e. Raderên ku bi (ûtin) dawî dibin

|       |       |    |
|-------|-------|----|
| cûtin | bi-cû | cû |
|-------|-------|----|

|         |         |      |
|---------|---------|------|
| sûtîn   | bi-sû   | sû   |
| dirûtîn | bi-dirû | dirû |

ji van raderan (tin) tê avêtinê.

f. Raderên ku bi (irin)dawî dibin

|       |          |     |
|-------|----------|-----|
| birin | bi-b-e   | b   |
| kirin | bi-k-e   | k   |
| mirin | bi-mir-e | mir |

2. Lêkerên ku radera wan bi ( î n ) dawî dibin

Paşgîna (în) ji raderê dikeve, parçeyê mayî koka dema niha ye.

|       |          |     |
|-------|----------|-----|
| barîn | bi-bar-e | bar |
| bezîn | bi-bez-e | bez |
| borîn | bi-bor-e | bor |
| zanîn | bi-zan-e | zan |
| revîn | bi-rev-e | rev |

3. Lêkerên ku radera wan bi ( an ) dawî dibin

|       |          |     |
|-------|----------|-----|
| dan   | bi-d-e   | d   |
| gihan | bi-gih-e | gih |
| man   | bi-mîn-e | mîn |
| kolan | bi-kol-e | kol |

#### 4. Lêkerên ku radera wan bi ( ûn ) dawî dibe

|     |        |    |
|-----|--------|----|
| bûn | bi-b-e | b  |
| çûn | bi-ç-e | ç  |
| dûn | bi-dû  | dû |
| pûn | bi-pû  | pû |

Jibo naskirina koka dema niha, baştir e mirov ji bilî raderên ku bi (andin) û (în) dawî dibin hemûyan ji ber bike. Eger di raderên ku bi (tin) dawî dibin de (a) hebe cihê xwe dide (ê)

|          |            |       |
|----------|------------|-------|
| alastin  | b-alês-e   | alês  |
| bijartin | bi-bijêr-e | bijêr |
| bihartin | bi-bihêr-e | bihêr |
| pişavtin | bi-pişêv-e | pişêv |
| guvaştin | bi-guvêş-e | guvêş |

Eger parçeyê mayî ji raderê piştî avêtina (tin) bi (s) dawî bibe, ev (s) cihê xwe dide (z).

|          |            |       |
|----------|------------|-------|
| gestin   | bi-gez-e   | gez   |
| mîstin   | bi-mîz-e   | mîz   |
| guhastin | bi-guhêz-e | guhêz |
| xwastin  | bi-xwaz-e  | xwaz  |
| lîstin   | bi-lîz-e   | lîz   |
| parastin | bi-parêz-e | parêz |
| bihîstin | bi-bihîz-e | bihîz |

Lê eger ev perçe bi (f) dawî bibe, cihê xwe dide (v).



|           |             |        |
|-----------|-------------|--------|
| axaftin   | bi-axiv-e   | axiv   |
| hêraftin  | bi-hêriv-e  | hêriv  |
| bişkaftin | bi-bişkêv-e | bişkêv |

Û eger ev perçe bi (ş) dawî bibe cihê xwe dide (j).

|          |            |       |
|----------|------------|-------|
| biraştin | bi-birêj-e | birêj |
| gihiştin | bi-gihîj-e | gihîj |
| kuştin   | bi-kuj-e   | kuj   |

5. Lêkerên ku radera wan bi (êtin) dawî dibe, ev (êtin) cihê xwe dide (êj).

|        |          |      |
|--------|----------|------|
| avêtin | b-avêj-e | avêj |
| mêtin  | bi-mêj-e | mêj  |
| rêtin  | bi-rêj-e | rêj  |

(atin) jî, cihê xwe dide (oje) yan jî (êje)

|       |              |     |
|-------|--------------|-----|
| patin | bi - pêj - e | pêj |
|-------|--------------|-----|

Lê (otin) cihê xwe dide (oj) yan jî, (oş)

|         |            |       |
|---------|------------|-------|
| sotin   | bi-soj-e   | soj   |
| kotin   | bi-koj-e   | koj   |
| dotin   | bi-doş-e   | doş   |
| firotin | bi-firoş-e | firoş |

#### 1.2.3.5.4 Komên Lêkeran

Di zimanê kurdî de lêker bi çend koman par ve dibe. Ev kom jî, ev in:

1. Lêker bi hebûn û tunebûna berkar bi du beşan par ve dibe:

a. Lêkerên derhingêv

Ev lêker di hevokê de berkarekî durust dixwazin. Wek lêkerên : Birin, nivîsandin, rakirin, hilgirtin, xwarin, vexwarin, dîtin, ....ûwd

Dema em hevokekê bi lêkerek ji van saz bikin, mîna " hilgirtin " . Min hilgirt. Ên ku li me guhdarî dikin dipirsin: Gelo vî çi hilgirt? jiber ku hevok kêmahî e. Lê ger min got: Min tîfing hilgirt . Yan jî : Min al hilgirt, hingê kêmahî di hevokê de namîne û wateya xwe bi temamî dide. Jiber ku lêkera "hilgirtin" derhingêv e, di hevokê de berkarekî durust dixwaze. Di hevokên jor de, tîfing û al berkarên durust in. Di buhêrkê de lêkerên derhingêv bi cînavên kesok, awayê

tewandî re (min, te, wî, wê. me, we, wan) tên bikaranînê. Lê di nihokê de bi awayê rast re (ez, tu, ew, em , ew, hûn, ew) tên bikaranînê . Herwiha di pêşedemê (mandê) de jî, bi awayên rast re tên bikaranînê.

#### b. Lêkerên nederhingêv

Ev lêker di hevokê de berkaran naxwazin. Hevok bêyî berkar wateya xwe dide. Bi lêker û kiryar hevok bê kêmahî durust dibe, mîna lêkerên : Hatin, çûn, mirin, razan, bûn , man, rabûn, ponijîn, girîn, firîn, ketin, .... ûwd.

Ez firîm.

Tu diçî.

Ewê bimire.

Hûn radizên.

Ewê bikevin.

Ev hevokên li jor bi lêker û kiryar tenê wateya xwe durust distînin. Lêkerên nederhingêv di her çaxan de bi awayê rast re yê cînavên kesok tên bikaranînê, an ku bi cînavên (ez, tu ,ew, em, hûn, ew) re tên veguhastinê.

Bi du bêşên din lêker tên parvekirinê :

1. Lêkerên sazber (birê)
2. Lêkerên guhber (bêrê)

### 1. Lêkerên sazber

Di van lêkeran de hemû çax ji koka raderê tên bikaranînê û li gor rêzaneke durust tên veguhastinê.

Lêkera (kirîn)

Koka dema berê                      kirî

Koka dema niha                      kir

Min kirî (buhêrk)

Ez dikirim ( nihok )

Ezê bikirim ( mand )

Bikire (fermanî)

Herwiha koka demê mîna xwe dimîne û pêşgîn û paşgînên kes û deman pê ve dibin.

### 2. Lêkerên guhber

Di van lêkeran de, hemû çax ji koka raderê dernakevin. Di navbera rader û fermaniyê de newekhevî heye. Ev lêker jî, du beş in:

a. Biramak

Di van lêkeran de, di fermaniyê de tîpên derî raderê hene:

| Rader   | KDB   | KDN   | Ferman   |
|---------|-------|-------|----------|
| avêtin  | avêt  | avêj  | bavêje   |
| dotin   | dot   | doş   | bidoşe   |
| firotin | firof | firoş | bifiroşe |
| ketin   | ket   | kev   | bikeve   |
| kotin   | kot   | koj   | bikoje   |
| mêtin   | mêt   | mêj   | bimêje   |
| rêtin   | rêt   | rêj   | birêje   |

Di lêkerên biramak de, tîpên ketî ( windabûyî ) ji raderê, di fermanî û nihokê de careke din vedigerin. Avêtin: Koka wî kevin (avêjtin e). Tîpa (j) dîsa vedigere. Herwiha:

|         |          |
|---------|----------|
| dotin   | doştin   |
| firotin | firoştin |
| ketin   | kevtin.  |
| kotin   | kojtin   |
| mêtin   | mêjtin   |
| rêtin   | rêjtin   |

b. Lêkerên dubirak

Di van lêkeran de fermanî ne ji koka raderê ye, an ku fermanî û rader ne yek in:

| Rader | KDB | KDN | Ferman |
|-------|-----|-----|--------|
| gotin | got | bêj | bibêje |
| anîn  | anî | în  | bîne   |
| hatin | hat | tê  | were   |

Di van lêkeran de tenê bi bihîstinê mirov fermanî û (KDN) nas dike.

Lêker bi sê awayên din tê parvekirinê:

1. Lêkerên dîdar.
2. Lêkerên nedîdar.
3. Lêkerên kesok

1. Lêkerên dîdar: Kiryarên van lêkeran diyar in û tên naskirinê.

Rûkenê tîfing hilgirt. (Rûken)

Reşo dijmin hejand ( Reşo)

ARGK Mehmetçik lerizandin. (ARGK)

2. Lêkerên nedîdar: Kiryarên van lêkeran nayên naskirinê ew jî, du awa ne.



a. Awayê hatin - kirinê.

b. Awayê dane - kirinê.

a. Awayê hatin - kirinê

Bi alîkariya lêkera (hatin) tên sazkirinê. Kiryar, nediya e, mirov nizane kî bi kar rabûye. Lê tenê mirov dizane ku bûyer pêk hatiye û kar hatiye kirinê.

Enî hat damezirandinê.

Artêş hat avakirinê .

Berxwedan hat bilindkirinê.

b. Awayê dane - kirinê

Bi alîkariya lêkera (dan) tên sazkirinê. Nayê naskirinê kî bi kar radibe, lê tenê mirov dizane ku kesekî nediya kar daye kirinê, yan jî, kesekî diya kar dide yekî nediya jibo bike.

Min şal û şapikê xwe dan dirûtinê.

Te kirasek da çêkirinê.

Serok têkoşînê dide meşandinê.

Di lêkerên nedîdar de tenê lêkera alîkar tê veguhastinê, lê lêkera din di awayê raderî de dimîne û mîna nav tê tewandinê. Herwiha ku lêker cemkirî be, ji hev qut nabe, mîna :

Yekîtiya gel tê avakirinê.

Jibo ev lêker ji navan bê cudakirinê, dawiya wê tîpa ( ê ) distîne.

### 3. Lêkerên kesok

Ev lêker bi hevkarîya du cînavên kesok tên sazîkirinê.

Min xwe dît.

Te xwe avêt.

Eger lêker nederhîngêv be ( bi ) dikeve navbera herdu cînavan.

Ez bi xwe razam.

Ew bi xwe çû.

Em bi xwe hatin.

Eger di lêkera derhîngêv de berkar hebe, dîsa (bi) dikeve navbera herdu cînavan.

Wî bi xwe dijmin kuşt.

Min bi xwe gul çand.

Lêkerên kesok bi alîkariya cînavê kesok (xwe) tên sazîkirinê.

Dema ku berkar û kiryar di hevokê de yek kes be hîngê, xwe şûna berkar digire û lêkera kesok tê çêkirinê.

Lêker bi sazîkirina xwe jî, bi sê beşan par ve dibin:

1. Lêkerên hîmî

2. Lêkerên afirandî

3. Lêkerên cemkirî

### 1. Lêkerên hîmî

Rayên van lêkeran, ne mîna navan tên bikaranînê, jibo çêkirina demên niha, bihurî û mandê tên bikaranînê.

| Rader | K.D.B | K.D.N |
|-------|-------|-------|
| ketin | ket   | kev   |
| dan   | da    | d     |
| bûn   | bû    | b     |
| kirin | kir   | k     |
| çûn   | çû    | ç     |
| birin | bir   | b     |

### 2. Lêkerên afirandî

Ev lêker ji nav û rayên lêkeran saz dibin. Lêkerên nederhingêv bi alîkariya (în) û yên derhingêv bi alîkariya (andin) çêdibin.

#### Mînak 1

| Nav  | nederhingêv | derhingêv |
|------|-------------|-----------|
| ger  | gerîn       | gerandin  |
| rev  | revîn       | revandin  |
| tirs | tirsîn      | tirsandin |
| kel  | kelîn       | kelandin  |
| hej  | hejîn       | hejandin  |
| ken  | kenîn       | kenandin  |

## Mînak 2

| nederhingêv | KDB    | KDN   | derhingêv  |
|-------------|--------|-------|------------|
| nalîn       | nalî   | nal   | naandin    |
| nivîsîn     | nivîsî | nivîs | nivîsandin |
| firîn       | firî   | fir   | firandin   |
| kişîn       | kişî   | kiş   | kişandin   |
| weşîn       | weşî   | weş   | weşandin   |
| barîn       | barî   | bar   | barandin   |
| tewîn       | tewî   | tew   | tewandin   |
| kewîn       | kewî   | kew   | kewandin   |
| lorîn       | lorî   | lor   | lorandin   |

### 3. Lêkerên cemkirî

Ev lêker bi hev xistina parçeyên jêr saz dibin:

1. Pêşgîn
2. Nav yan jî, rengdêr
3. Lêkerên alîkar

Pêşgînen ku lêkerên cemkirî saz dikin, ev in: hil, ve, vê, da, rû, wer, der, ber, bin, pey, paş, pêş, ra, jê, tê, lê, pê, jev, lev, pev ... ûwd.

1. Pêşgîn û lêkera alîkar:

Hilgirtin, vegirtin, rêxistin, wegerandin, dagirtin, rûniştin, berxistin, derxistin, derbûn, serkevtin, pêşxistin, paşxistin, lêxistin, pêketin, levkirin, jêkirin, rakirin, têkçûn, lêkirin, jevkirin, pevçûn, pevketin, levxistin, peyketin, peyxistin,...

2. Nav û lêkera alîkar:

Bersivdan, rêxistin, cihgirtin, gilîkirin, hînbûn, pêketin, rêveçûn,...

3. Rengdêr û lêkera alîkar:

Sarkirin, sorbûn, korbûn, reşkirin, dûrketin, xweşbûn, xweşkirin, şaşman, germbûn, zerkirin, zerbûn, geşbûn, geşkirin, xurtkirin,

Nasîn

Di lêkerên cemkirî de, eger lêkera alîkar (parçeyê dawî ji Lêker) derhingêv be, lêkera cemkirî derhingêv e. Eger ev parçe nederhingêv be, lêker bi tevayî jî, nederhingêv e.



## Çêkirina lêkeran

### 1. Çêkirina lêkerên nederhingêv û yê derhingêv:

a. Ji navên raderî bi dûxistina paşgîna (andin) lêkerên derhingêv yê afirandî tên çêkirinê û bi dûxistina paşgîna (în) lêkerên nederhingêv yê afirandî tên çêkirinê:

| Navê raderî | derhingêv  | nederhingêv |
|-------------|------------|-------------|
| leriz       | lerizandin | lerizîn     |
| meş         | meşandin   | meşîn       |
| rev         | revandin   | revîn       |
| bez         | bezandin   | bezîn       |
| ger         | gerandin   | gerîn       |
| ken         | kenandin   | kenîn       |
| tirs        | tirsandin  | tirsîn      |
| kel         | kelandin   | kelîn       |
| bar         | barandin   | barîn       |
| reng        | rengandin  | rengîn      |
| sot         | sotandin   | sotîn       |
| pêç         | pêçandin   | pêçîn       |
| dom         | domandin   | domîn       |



b. Ji navan bi dûxistina lêkera alîkar (kirin) lêkerên derhingêv çêdibin û bi dûxistina (bûn) yê nederhingêv çêdibin.

| Nav  | derhingêv  | nederhingêv |
|------|------------|-------------|
| zêr  | zêr kirin  | zêr bûn     |
| zîv  | zîv kirin  | zîv bûn     |
| kar  | kar kirin  | kar bûn     |
| çem  | çem kirin  | çem bûn     |
| bar  | bar kirin  | bar bûn     |
| par  | par kirin  | par bûn     |
| gêr  | gêr kirin  | gêr bûn     |
| rê   | rê kirin   | rê bûn      |
| mehr | mehr kirin | mehr bûn    |
| kaş  | kaş kirin  | kaş bûn     |

Herwiha ji navan bi alîkariya gelek lêkerên derhingêv, lêkerên derhingêv çêdibin:

Sûnd xwarin, rê xistin, rê birîn,...

Bi alîkariya yê nederhingêv jî, lêkerên nederhingêv yê nû çêdibin: Rê ketin, rêve çûn,...

c. Ji rengdêran bi dûxistina lêkera alîkar (kirin) lêkerên derhingêv û bi dûxistina lêkera (bûn) lêkerên nederhingêv çêdibin.

| Rengdêr | derhingêv  | nederhingêv |
|---------|------------|-------------|
| reş     | reş kirin  | reş bûn     |
| xweş    | xweş kirin | xweş bûn    |
| germ    | germ kirin | germ bûn    |
| sor     | sor kirin  | sor bûn     |
| dîn     | dîn kirin  | dîn bûn     |
| zer     | zer kirin  | zer bûn     |

Herwiha dema lêkera alîkar derhingêv be, lêkera çêkirî jî, derhingêv e, lê dema nederhingêv be, ya çêkirî jî, nederhingêv e.

## 2. Çêkirina lêkerên cemkirî:

Lêkerên cemkirî bi têkilbûna nav, rengdêr û pêşgînan bi lêkerên alîkar re saz dibin.

a. Pêşgînên ku bi lêkerên alîkar re, lêkerên cemkirî çêdikin ev in:

Hil, ve, vê, da, rû, wer, der, ber, bin, ser, pey, nav, paş, ra, jê, tê, lê, pê, jev, lev, pev, tev, di ser re, di rex re, di nav de, di şûn de, di pêş de, bi paş de, bi ser de,... ûwd.

Mînak:

Hilkirin, hilbûn, hildan, hilgirtin, vebirîn, vebûn, vedan, vekirin, vegirtin, vegerandin, veşartin, vejînanandin, rakirin,

rabûn, raketin, raxistin, razan, wegerandin, daxistin, dagirtin, rûniştin, bergirtin, derketin, derkirin, derbûn, serkevtin, ser xwe bûn, pêş xistin, paş ketin, pey xistin, pey man, lev hatin, jev ketin, jev çûn, pev ketin, pê xistin, jê kirin...

b. Nav û lêkerên alîkar:

Soz dan, bersiv dan, rê xistin, cih girtin, kar dîtin, bîn kişandin, gilî kirin, hîn bûn, hîn kirin, rê ketin, cem kirin, kar kirin, ders dan, mal bar kirin, guh birîn, ser lê dan, rê birîn...

c. Rengdêr û lêkerên alîkar:

Kor bûn, sar bûn, kor kirin, sar kirin, dûr ketin, dûr bûn, dûr kirin, dûr xistin, sor kirin, sor bûn, saz kirin, saz bûn...

#### 1.2.3.5.5 Di lêkeran de dem (çax)

Di zimanê Kurdî de sê demên bingeîn hene:

1. Dema niha (nihok)
2. Dema bê (pêşedem, mand)
3. Dema buhirî (berê, buhêrk)

### 1. Nihok (dema niha)

Lêker liber çavên mirov pêk tê û bi awayekî gumanbir bûyer diqede yan jî, dê biqede.

#### a. Nihok

Niha ez dixwim.

Ez li Almanyaya dimînim.

Ez pirtûka rêziman dinivîsim.

#### b. Bûyereke ku dema berê çêbû be û xwe dirêjî dema niha bike:

Ji sê salan ve ez li Almanyaya dimînim.

Ev salek e ji êşa dilê xwe dinalim.

Ji sê mehan ve ez Şêrînê nas dikim.

#### c. Bûyereke ku dê di pêşedemê de pêk bê û lêker bi hokereke demîn ve girêdayî be, mîna: Sibe, di sala bê de, piştî saeteke din...

Ez sibe diçim dibistanê.

Ez saleke din vedigerim welat.

Piştî saetekê ez diçim Amedê.

ç. Toreyeke (adet) ku tê dubarekirinê û bi gotinên mîna:

Heroj, hercar, ducaran..., tê naskirinê:

Herkêlî ez bi welat dihizirim.

Herroj ez di biyaniyê de dimirim.

Herhefte ez diçim dibistana Kurdî.

### 1. Veguhastina lêker di nihok de

Di nihok de, herdem awayê rast yê cînavên kesok (ez, tu, ew, em, hûn, ew) tê bikaranînê. Pêşiya koka dema niha (di) distîne, eger lêker hîmî yan jî, afirandî be, lê eger lêker cemkirî be (di) dikeve navbera her du parçeyan, dikeve pêşiya parçeye dawî ji lêkera cemkirî. Dawiya (KDN) jî, (im, î, e, in) distîne.

Lêkera hîmî

Kirin

Koka dema niha (k) ye.

|          |                |
|----------|----------------|
| Ez dikim | Ez di (KDN) im |
|----------|----------------|

|         |               |
|---------|---------------|
| Tu dikî | Tu di (KDN) î |
|---------|---------------|

|         |               |
|---------|---------------|
| Ew dike | Ew di (KDN) e |
|---------|---------------|

|          |                |
|----------|----------------|
| Em dikin | Em di (KDN) in |
|----------|----------------|

|           |                 |
|-----------|-----------------|
| Hûn dikin | Hûn di (KDN) in |
|-----------|-----------------|

|          |                |
|----------|----------------|
| Ew dikin | Ew di (KDN) in |
|----------|----------------|



Lêkera afirandî

Lerizîn

Koka dema niha (Leriz) e.

Ez dilerizim

Tu dilerizî

Ew dilerize

Em dilerizin

Hûn dilerizin

Ew dilerizin

Lêkera cemkirî

bar kirin

Di van lêkeran de, lêkera alîkar tenê tê veguhestinê, koka dema niha jê tê deranînê û (di) pêşiya wê digire.

Koka dema niha: (Bar...K.) ye.

Ez bar dikim

Tu bar dikî

Ew bar dike

Em bar dikin

Hûn bar dikin

Ew bar dikin



### Nihokê dirêj

Lêker hîkariya xwe dewam dike yan jî, nîv pêk hatiye û nîvê din jî, dê pêk bê. Di vê rewşê de, dawiya kirde (kiryar) (î) distîne.

|            |                |                |
|------------|----------------|----------------|
| Ezî dikim  | Ezî dilerizim  | Ezî bar dikim  |
| Tuyî dikî  | Tuyî dilerizî  | Tuyî bar dikî  |
| Ewî dike   | Ewî dilerize   | Ewî bar dike   |
| Emî dikin  | Emî dilerizin  | Emî bar dikin  |
| Hûnî dikin | Hûnî dilerizin | Hûnî bar dikin |
| Ewî dikin  | Ewî dilerizin  | Ewî bar dikin  |

### Nihokê Pêşro (daxwazî)

lêker hîn pêk nehatiye û dibe ku pêk neyê jî. Pêkhatina wî, bi bûyereke din ve girêdayî ye. Di veguhastinê de, di şûna (di) de, pêşiya lêker (bi) distîne:

|           |               |               |
|-----------|---------------|---------------|
| Ez bikim  | Ez bilerizim  | Ez bar bikim  |
| Tu bikî   | Tu bilerizî   | Tu bar bikî   |
| Ew bike   | Ew bilerize   | Ew bar bike   |
| Em bikin  | Em bilerizin  | Em bar bikin  |
| Hûn bikin | Hûn bilerizin | Hûn bar bikin |
| Ew bikin  | Ew bilerizin  | Ew bar bikin  |

Di vê rewşê de, kirin yan jî, bûn bi xwestinê pêk tê. Ev rawe bêhtir

dema bê (pêşedemê) îfade dike. Carna jî, daçekên (da, ku) têne pêşiya lêkera xwestinî. Mîna:

Bêrîvanê tiving hilgirt da biçe şer.

Min xwe amad kir da romanekê binivîsim.

Hacer derket çuyan ku bibe simbola jina Kurd.

Kurd şer dikin ku bibin pêşengên mirovahiyê.

Di vir de (da, ku) daçekên sedemîn e.

Herwiha bêjeya (bila) jî, pêşiya van lêkeran digire: (Bila) ez biçim .

## 2. Pêşedem

Lêker hîn pêk nehatiye, lê wê di dema bê de, di pêşerojê de pêk bê. Di be ku lêker pêk neyê jî.

Di vê demê de pêşiya lêker, lêkera (hatin) di dema niha de û bi kesê sêyemîn yê yekhejmar re (ew) digire. Herwiha lêker jî, pêşgîna (bi) distîne. Lê, lêkera hatin bi sê cûreyan tê bikaranînê.

Ê, dê û wê, mîna:

Ez ê bikim

Ez dê bikim

Ez wê bikim

Emê bi çend nimûneyan ji klasîkên kurd vê rewşê şirove bikin:

Dê

Meleyê Cizîrî dibêje.

Esrar ezel dê dabed bîne zuhûrê.

Encam ser encam ji axaz çi hacet.

Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de dibêje:

Evçend munafîq û neyarî

Hêja tu bi çavê min diyarî

Mem dê bimirî tu dê bimînî

Hêj xweş bigerî li rûyê zemînî

Ê

Di qewl û beytên Êzîdiyan de tê gotinê.

Newêrim bikêlimim

Wekî ez bêjim sineta berî Adem e

Ezê birecimim

Wê

Di qewl û beytên Ezîdiyan de tê gotinê:

Ew e milletê xirqe paristî

Xirqe maqûl kir ser xwe re dêxistî

Roja axretê wê jê here nûrek kesekî

Seydayê Tîrêj jî, di bilbilê dilşadî de dibêje:

Piştî wê stêrê bi xwe berbanga sibê ye.

Wê roj hile ronî bikeve şûna şevê ye

Karwanê me wê bigihe cî û warê meqsedê ye.

Çerxa Felekê herdem bifitil û ger û dewr e.

Dê, ê û wê ji kû hatine?

Ev her sê bêje yek lêker in, ew jî, lêkera hatin di dema nihok de ye.

Ez di êm (dêm, têm).

Tu di êyî (dêyî, têyî).

Ew diê (dê, tê) ew dê

dema dê ew dê

Ez dema diê bikim.

Ez dê bikim.

Di axaftinê de (dê) dikeve û dibe:

Ez dema ê bikim

Ez ê bikim

Bi baweriya min mana (dê) pêkanîna lêker di pêşerojê de bêguman dike. Dema ez dibêjim: Ez dê bikim. Hevok mîna nihok wateya xwe distîne û di pêkanîna kirinê de mîna: (ez dikim), yan jî, nêzîkî wê wateyê dibe. Lê (ez dikim) min dest bi kirinê kiriye û (dê) pêkanîna lêker di projeyekê de dihêle, belkî pêk bê û belkî jî, neyê.

Ezê bikim. Kirinê di projeyekê de dihêle. Belkî ez bikim û belkî ez nekim.

Ez wê bikim. (Ez ewê dê bikim) yan jî: (Ez ewê bikim): Di vir de lêkera hatin (ê) û cînavê nîşandek (ewê) bi hev re dibin yek (wê). Ez ewê dema ê bikim.

Ez ewê ê bikim.

Ez wê bikim.

Ew, ewê cînavê nîşandek e jibo dûr bikar tê, jibo vê jî, dema bi lêkera alîkar hatin (ê) re dibe yek, bikaranîna lêker di pêşedemê de durtir dike. Gelek caran cînavê nîşandek (ew) bi (ê) re dibe yek, ev jî, bi piranî dema ku nav di hevokê de şûna cînav digire, mîna:

Wê roj hile

Roj wê hile

Wê ronî bikeve

Ronî wê bikeve.

Roj, ew ê hile.

Ronî, ew ê bikeve.

Roj wê hile.

Ronî wê bikeve.

Ew û (ê) bi hev ve dibin yek.

Bi xwe hevok bi vî awayî rast dibe:

Ew roj ê hile

ew ê roj hile

Ew ronî ê bikeve

ew ê ronî bikeve

Ew ê, bi hev ve dibin (wê)

Jibo tevlihevî çênebe, emê di veguhastina lêker de, di pêşedemê de (dê) bi kar bînin û van dîtînen jor mîna



pêşniyazan bihêlin<sup>36</sup>.

Veguhastina lêker di pêşedemê de

Di pêşedemê de jî, mîna nihok herdem awayê rast yê cînavên kesanî (ez, tu, ew, em, hûn, ew) tê bikaranînê. Herwiha koka demê ji fermaniyê tê girtinê. Lêkera alîkar hatin (dê) pêşiya lêker digire û pêşgîna (bi) jî, pê ve dibe. Eger lêker cemkirî be (bi) dikeve pêşiya parçeyê dawî û ew parçe tenê tê veguhastinê.

|             |       |              |     |
|-------------|-------|--------------|-----|
| Lêkera hîmî | Kirin | bike         | (k) |
| Ez dê bikim |       | Em dê bikin  |     |
| Tu dê bikî  |       | Hûn dê bikin |     |
| Ew dê dike  |       | Ew dê bikin  |     |

|                  |         |                  |         |
|------------------|---------|------------------|---------|
| Lêkera afirandî  | Lerizîn | bilerize         | (leriz) |
| Ez dê bilerizim. |         | Ew dê bilerizin  |         |
| Tu dê bilerizî.  |         | Hûn dê bilerizin |         |
| Ew dê bilerize.  |         | Ew dê bilerizin  |         |

---

<sup>36</sup>Dema ku di hevokê de, kiryar ( kirde ) ji lêker cuda û dûr dikeve ( wê ) tê bikaranînê.



Lêkera cemkirî                      Bar kirin                      bar bike ( bar-k-)

Ez dê bar bikim.                      Ew dê bar bikin.

Tu dê bar bikî.                      Hûn dê bar bikin.

Ew dê bar bike.                      Ew dê bar bikin.

### 3. Buhêrk

Di demeke rabûyî de, lêker pêk hatiye. Bi lêkerên derhingêv re, cînavên kesanî (min, te, wî, wê, me, we, wan) tên bikaranînê û bi lêkerên nederhingêv re cînavên (ez, tu, ew, em, hûn, ew) tên bikaranînê. Di dema buhirtî de çar darêj hene:

#### a. Buhêrk

Demek di ser pêkanîna lêker re derbas bûye.

#### b. Mêjbûhêrk (çîrokî)

Demeke dirêj di ser pêkanîna lêker re derbasbûye û ketiye darêja çîrokiyê.

#### c. Buhêrka bicih

Bi temamî lêker pêk hatiye û hîkariya xwe davêje dema niha.

ç. Buhêrka dirêj

Hîkariya kirinê demeke dirêj dewam dike.

a. Buhêrk

Veguhastina lêkera kirin ya himî û derhingêv:

Koka dema berê ( kir )

Min kir

Me kir

Te kir

We kir

Wî/wê kir

Wan kir

Lêkera çûn ya nederhingêv û himî: Koka dema berê ( çû )

Ez çûm

Em çûn

Tu çûyî

Hûn çûn.

Ew çû

Ew çûn.

Lêkera afirandî ya derhingêv Lerizandin:

KDB ( lerizand )

Min lerizand

Me lerizand

Te lerizand

We lerizand

Wî/wê lerizand

Wan lerizand

Lêkera afirandî ya nederhingêv Lerizîn:

KDB ( lerizî )

Ez lerizîm

Em lerizîn

Tu lerizî

Hûn lerizîn

Ew lerizî

Ew lerizîn

Lêkera cemkirî û derhingêv Bar kirin:

îKDB ( bar kir )

|             |            |
|-------------|------------|
| Min bar kir | Me bar kir |
|-------------|------------|

|            |            |
|------------|------------|
| Te bar kir | We bar kir |
|------------|------------|

|                |             |
|----------------|-------------|
| Wî/ wê bar kir | Wan bar kir |
|----------------|-------------|

Lêkera cemkirî ya nederhingêv sor bûn:

KDB ( sor bû )

|            |            |
|------------|------------|
| Ez sor bûm | Em sor bûn |
|------------|------------|

|             |             |
|-------------|-------------|
| Tu sor bûyî | Hûn sor bûn |
|-------------|-------------|

|           |            |
|-----------|------------|
| Ew sor bû | Ew sor bûn |
|-----------|------------|

b. Mêjbêj (mêjbuhêrk, çîrokî)

Demeke dirêj di ser pêkhatina kar re derbas bûye û ketiye darêja çîrokekê.

Lêkera kirin:

|            |           |
|------------|-----------|
| Min kiribû | Me kiribû |
|------------|-----------|

|           |           |
|-----------|-----------|
| Te kiribû | We kiribû |
|-----------|-----------|

|              |            |
|--------------|------------|
| Wî/wê kiribû | Wan kiribû |
|--------------|------------|

Lêkera çûn

|          |          |
|----------|----------|
| Ez çûbûm | Em çûbûn |
|----------|----------|

|           |           |
|-----------|-----------|
| Tu çûbûyî | Hûn çûbûn |
|-----------|-----------|

|         |          |
|---------|----------|
| Ew çûbû | Ew çûbûn |
|---------|----------|

Lêkera lerizandin

Min lerizandibû

Me lerizandibû

Te lerizandibû

We lerizandibû

Wî/wê lerizandibû

Wan lerizandibû

Lêkera bar kirin

Min bar kiribû

Me bar kiribû

Te bar kiribû

We bar kiribû

Wî/wê bar kiribû

Wan bar kiribû

Lêkera sor bûn

Ez sor bûbûm

Em sor bûbûn

Tu sor bûbûyî

Hûn sor bûbûn

Ew sorbûbû

Ew sor bûbûn

c. Buhêrka bicih

Lêker bi temamî û bê kêmasî pêk tê û hîkariya xwe li dema niha jî, dike.

Lêkera kirin

Min kiriye

Me kiriye

Te kiriye

We kiriye

Wî/wê kiriye

Wan kiriye

Lêkera çûn

Ez çûme

Em çûne

Tu çûyî

Hûn çûne

|                          |                 |
|--------------------------|-----------------|
| Ew çûye                  | Ew çûne         |
| <u>Lêkera lerizandin</u> |                 |
| Min lerizandiye          | Me lerizandiye  |
| Te lerizandiye           | We lerizandiye  |
| Wî/wê lerizandiye        | Wan lerizandiye |
| <u>Lêkera lerizîn</u>    |                 |
| Ez lerizîme              | Em lerizîne     |
| Tu leriziyî              | Hûn lerizîne    |
| Ew leriziye              | Ew lerizîne     |
| <u>Lêkera bar kirin</u>  |                 |
| Min bar kiriye           | Me bar kiriye   |
| Te bar kiriye            | We bar kiriye   |
| Wî/wê bar kiriye         | Wan bar kiriye  |
| <u>Lêkera sor bûn</u>    |                 |
| Ez sor bûme              | Em sor bûne     |
| Tu sor bûyî              | Hûn sor bûne    |
| Ew sor bûye              | Ew sor bûne     |

ç. Buhêrka dirêj

Lêker di dema berê de pêk hatiye. Lê hîkariya wî demeke dirêj dewam kiriye. Yan jî, lêker bicih pêk nehatiye. Pêkhatina wî dest pê kiribû û dewam dikir. Em dikarin bibêjin " buhêrka kêr ".

Lêkera kirin

Min dikir

Me dikir

Te dikir

We dikir

Wî/wê dikir

Wan dikir

Lêkera lerizandin

Min dilerizand

Me dilerizand

Te dilerizand

We dilerizand

Wî/wê dilerizand

Wan dilerizand

Lêkera lerizîn

Ez dilerizîm

Em dilerizîn

Tu dilerizî

Hûn dilerizîn

Ew dilerizî

Ew dilerizîn

Lêkera bar kirin

Min bar dikir

Me bar dikir

Te bar dikir

We bar dikir

Wî/wê bar dikir

Wan bar dikir

Lêkera sor bûn

Ez sor dibûm

Em sor dibûn

Tu sor dibûyî

Hûn sor dibûn

Ew sor dibû

Ew sor dibûn

Lêkera sor kirin

Min sor dikir

Me sor dikir

Te sor dikir

We sor dikir



Wî/wê sor dikir

Wan sor dikir

#### 1.2.3.5.6 Di lêkeran de " rawe "

Ji bilî hersê demên bingeîn, li gor dem , rawe û dirûvê lêker tê veguhastinê, ji raweyên ku lêker tê de bi awayên cuda tê veguhastinê, ev in:

1. Raweya fermanî (koteî)
2. Raweyên hekeyî (egerî, mercî, şertî).

Ew jî, ev in:

- a. Lavij û nihokê lavij
  - b. Bijoke û nihokê bijoke.
3. Raweyên gumanî
  - a. Guman û nihokê guman
4. Raweyên hatin-kirin û dan-kirinê

## 1. Raweya fermanî

Mirov, kesekî dike bin kotekê jibo ku bi karekî rabe.

### Lêkera kirin

Tu bike

Hûn bikin

Em bikin

### Lêkera lerizîn

Tu bilerize

Hûn bilerizin

Em bilerizin

### Lêkera lerizandin

Tu bilerizîne

Hûn bilerizînin

Em bilerizînin

### Lêkera bar kirin

Tu bar bike

Hûn bar bikin

Em bar bikin

## 2. Raweyên hekeyî

### a. Lavij

### Lêkera kirin

Min bikira

Te bikira

Wî/wê bikira

### Lêkera lerizandin

Min bilerizanda

Te bilerizanda

Wî/wê bilerizanda

### Lêkera lerizîn

Ez bilerizîma

Me bikira

We bikira

Wan bikira

Me bilerizanda

We bilerizanda

Wan bilerizanda

Em bilerizîna

|                         |                |
|-------------------------|----------------|
| Tu bileriziya           | Hûn bilerizîna |
| Ew bileriziya           | Ew bilerizîna  |
| <u>Lêkera bar kirin</u> |                |
| Min bar bikira          | Me bar bikira  |
| Te bar bikira           | We bar bikira  |
| Wî/wê bar bikira        | Wan bar bikira |
| <u>Lêkera sor bûn</u>   |                |
| Ez sor bibûma           | Em sor bibûna  |
| Tu sor bibûya           | Hûn sor bibûna |
| Ew sor bibûya           | Ew sor bibûna  |

Nihokê lavij

|                 |             |
|-----------------|-------------|
| Minê bikra      | Meyê bikra  |
| Teyê bikira     | Weyê bikira |
| Wî/wê yê bikira | Wanê bikira |

Ev rawe jî, mîna lavij e. Lê "ê" li pey cînav tê.

|                      |              |
|----------------------|--------------|
| Minê bilerizanda.... | (lerizandin) |
| Ezê bilerizîma....   | (lerizîn)    |
| Minê bar bikira...   | (bar kirin)  |
| Ezê sor bibûma...    | (sor bûn)    |

## b. Bijoke

### Kirin

Min kiriba

Me kiriba

Te kiriba

We kiriba

Wî/wê kiriba

Wan kiriba

### Lerizandin

Min lerizandiba

Me lerizandiba

Te lerizandiba

We lerizandiba

Wî/wê lerizandiba

Wan lerizandiba

### Lerizîn

Ez lerizîbama

Em lerizîbana

Tu lerizîba

Hûn lerizîbana

Ew lerizîba

Ew lerizîbana

### Bar kirin

Min bar kiriba

Me bar kiriba

Te bar kiriba

We bar kiriba

Wî/wê bar kiriba

Wan bar kiriba

### sor bûn

Ez sor bûbama

Em sor bûbana

Tu sor bûba

Hûn sor bûbana

Ew sor bûba

Ew sor bûbana

### Nihokê bijoke

Ew jî, mîna bijoke ye, lê "ê" li pey cînav tê.

Minê kiriba                      Meyê kiriba

Teyê kiriba                      Weyê kiriba

Wî/wê yê kiriba                Wanê kiriba

Minê lerizandiba...            (lerizandin)

Ezê lerizîbama...                (lerizîn)

Minê bar kiriba...                (bar kirin)

Ezê sor bûbama...                (sor bûn)

### 3. Raweya guman

#### Kirin

Min kiribe                      Me kiribe

Te kiribe                        We kiribe

Wî/wê kiribe                  Wan kiribe

#### Lerizandin

Min lerizandibe                Me lerizandibe

Te lerizandibe                We lerizandibe

Wî/wê lerizandibe              Wan lerizandibe

#### Lerizîn

Ez lerizîbim                      Em lerizîbin

Tu lerizîbî                        Hûn lerizîbin

Ew lerizîbe                        Ew lerizîbin

### Bar kirin

|                  |                |
|------------------|----------------|
| Min bar kiribe   | Me bar kiribe  |
| Te bar kiribe    | We bar kiribe  |
| Wî/wê bar kiribe | Wan bar kiribe |
| <u>sor bûn</u>   |                |

|              |               |
|--------------|---------------|
| Ez sor bûbim | Em sor bûbin  |
| Tu sor bûbî  | Hûn sor bûbin |
| Ew sor bûbe  | Ew sor bûbin  |

### Nihokê guman

|                     |              |
|---------------------|--------------|
| Minê kiribe         | Meyê kiribe  |
| Teyê kiribe         | Weyê kiribe  |
| Wî/wê yê kiribe     | Wanê kiribe  |
| Minê lerizandibe... | (lerizandin) |
| Ezê lerizîbim...    | (lerizîn)    |
| Minê bar kiribe...  | (bar kirin)  |
| Ezê sor bûbim...    | (sor bûn)    |

## 4. Raweyên hatin-kirin û dan-kirinê

### 4.1. Raweya hatin-kirinê

Di vê raweyê de kar ji hêla kesekî nediya ve tê kirinê.

Ev rawe bi alîkariya lêkera (hatin) tê sazkirinê. Lêker ji hêla kiryarekî nenas ve dikeve livbaziye. Di vê raweyê



de, lêkera alîkar hatin tê veguhestinê û lêkera din di awayê raderî de dimîne û paşgîna (ê) distîne.

Nihok

مال

Ez têm dîtinê

Tu têyî dîtinê

Ew tê dîtinê

Em tên dîtinê

Hûn tên dîtinê

Ew tên dîtinê

Buhêrk

کۆدنه

Ez hatim dîtinê

Tu hatî dîtinê

Ew hat dîtinê

Em hatin dîtinê

Hûn hatin dîtinê

Ew hatin dîtinê

Bicibuhêrk

هاتنه

Ez hatime dîtinê

Tu hatiyî dîtinê

Ew hatiye dîtinê

Em hatine dîtinê

Hûn hatine dîtinê

Ew hatine dîtinê

Mêjbuhêrk

هاتنه

Ez hatibûm dîtinê

Tu hatibûyî dîtinê

Ew hatibû dîtinê

Em hatibûn dîtinê

Hûn hatibûn dîtinê

Ew hatibûn dîtinê

Kêmbuhêrk

کۆدنه

Ez dihatim dîtinê

Tu dihatî dîtinê

Ew dihat dîtinê

Em dihatin dîtinê

Pêşedem

پێشه

Ezê bêm dîtinê

Tuyê bêyî dîtinê

Ewê bê dîtinê

Emê bên dîtinê

Hûn dihatin dîtinê

Ew dihatin dîtinê

Hûnê bên dîtinê

Ewê bên dîtinê

Lavij

Ez bihatama dîtinê

Tu bihatayî dîtinê

Ew bihata dîtinê

Em bihatana dîtinê

Hûn bihatana dîtinê

Ew bihatana dîtinê

Bijoke

Ez hatibama dîtinê

Tu hatibayî dîtinê

Ew hatiba dîtinê

Em hatibana dîtinê

Hûn hatibana dîtinê

Ew hatibana dîtinê

Guman

Ez hatibim dîtinê

Tu hatibî dîtinê

Ew hatibe dîtinê

Em hatibin dîtinê

Hûn hatibin dîtinê

Ew hatibin dîtinê

Nihokê lavij

Ezê bihatama dîtinê

Tuyê bihatayî dîtinê

Ewê bihata dîtinê

Emê bihatana dîtinê

Hûnê bihatana dîtinê

Ewê bihatana dîtinê

Nihokê bijoke

Ezê hatibama dîtinê

Tuyê hatibayî dîtinê

Ewê hatiba dîtinê

Nihokê guman

Ezê hatibim dîtinê

Tuyê hatibî dîtinê

Ewê hatibe dîtinê

|                      |                     |
|----------------------|---------------------|
| Emê hatibana dîtinê  | Emê hatibin dîtinê  |
| Hûnê hatibana dîtinê | Hûnê hatibin dîtinê |
| Ewê hatibana dîtinê  | Ewê hatibin dîtinê  |

#### 4.2. Raweya dan-kirinê

Di vê raweyê de, kiryarekî nas karê xwe dide yekî din jibo lêker bixe livbaziye. Ev rawe bi alîkariya lêkera (bûn) tê çekirinê. Lêkera (bûn) tê veguhastinê û lêkera din di awayê raderî de dimîne, lê dawiya wê paşgîna (ê) distîne.

##### Nihok

Ez didim çekirinê

Tu didî çekirinê

Ew dide çekirinê

Em didin çekirinê

Hûn didin çekirinê

Ew didin çekirinê

##### Buhêrk

Min da(n) çekirinê

Te da(n) çekirinê

Wî/Wê da(n) çekirinê

Me da(n) çekirinê

We da(n) çekirinê

Wan da(n) çekirinê

##### Bicibuhêrk

Min daye<sup>37</sup> çekirinê

Te daye çekirinê

##### Mêjbuhêrk

Min dabû çekirinê

Te dabû çekirinê

<sup>37</sup>Eger tiştên ku tên çekirinê kom bin lêker di komê de tê bikaranînê (dane) û eger yek be di yekjimariyê de tê bikaranînê ( daye).

Wî/Wê daye çêkirinê

Me daye çêkirinê

We daye çêkirinê

Wan daye çêkirinê

Wî/Wê dabû çêkirinê

Me dabû çêkirinê

We dabû çêkirinê

Wan dabû çêkirinê

#### Kêmbuhêrk

Min dida çêkirinê

Te dida çêkirinê

Wî/Wê dida çêkirinê

Me dida çêkirinê

We dida çêkirinê

Wan dida çêkirinê

#### Pêşedem

Ezê bidim çêkirinê

Tê bidî çêkirinê

Ewê bide çêkirinê

Emê bidin çêkirinê

Hûnê bidin çêkirinê

Ewê bidin çêkirinê

#### Lavij

Min bida(na) çêkirinê

Te bida(na) çêkirinê

.....

#### Guman

Min dabe çêkirinê

Te dabe çêkirinê

Nihokê bijoke

Minê daba çêkirinê

.....

#### Bijoke

Min daba(na) çêkirinê

Te daba(na) çêkirinê

.....

#### Nihokê lavij

Minê bida çêkirinê

Tê bidaye çêkirinê

Nihokê guman

Minê dabe çêkirinê

.....

### Nasîn

Lêkerên derhingêv di demên derbasbûyî de (buhêrk de) li gor berkar tên guhertinê. Eger berkar yekhejmar be lêker jî, yekhejmar tê. Eger kom be lêker jî, kom tê.

Min pitûkek da Evînê.

Min du pirtûk dan Evînê.

Min xaniyek da çêkirinê.

Min sê xanî dan çêkirinê.

Min dilê xwe daye Kurdistanê.

Min dil û cegerê xwe dane Kurdistanê.

#### 1.2.3.5.7 Di lêkeran de neyînî (nakirin)

Nakirin tunekirina karekî yan bûyerekê ye. Ne pêkanîn û qedexekirina pêkhatina lêker e. Amrazên nakirinê di zimanê kurdî de ev in: Na, ne, me, ni, nîn, tune.

#### Na

Di dema niha û pêşerojê de tê bikaranînê.

#### Nihok

Na, şûna "di" digire, wek:

|               |               |
|---------------|---------------|
| Ez diçim      | ez naçim      |
| Ez difirim    | ez nafirim    |
| Ez hildigirim | ez hilnagirim |
| Ez derdikevim | ez dernakevim |

#### Pêşedem

Na, şûna "bi" digire û (ê) dikeve, mîna:

|                |               |
|----------------|---------------|
| Ezê biçim      | ez naçim      |
| Ezê bifirim    | ez nafirim    |
| Ezê hilgirim   | ez hilnagirim |
| Ezê derbikevim | ez dernakevim |



Ne

Di buhêrkê de yan jî, di tunekirina rewş û navên ku bi lêkera  
"bûn" re tên bikaranînê yan jî, di pirskirina neqayîlbûnê de  
(pirsa protestoyî) tê.

### Buhêrk

Ez çûm                                      ez neçûm

Min girt                                    min negirt

Ez derketim                              ez derneketim

Tunekirina rengdêr û navên ku bi lêkera bûn re tên  
bikaranînê.

Ez kurd im.                              ez ne kurd im.

Ez reş im.                                ez ne reş im.

Ew hov e.                                ew ne hov e.

Ew bêbext e.                            ew ne bêbext e.

### Pirskirina neqayîlbûnê

Ma ne bes e bindestî?

Ma heta kengê emê ne serbest bin?

Ma ne qenc e em şoreşger bin?

Me

Di fermaniyê de tê bikaranînê:

Mekeve rêza nezanan!

Meçe Ewropayê!

Avê vemexwe!

Ji mal dermekeve!

Lê, em dikarin bibêjin: Neçe, nekeve, venexwe û dernekeve.

Ni

Ev amraz bi lêkerên (zanîn û karîn) re tê bikaranînê:

Ez nizanim çi bikim.

Ez nikarim bêdeng bimînim.

Em nizanin çi li welat çêdibe.

Nîn

Azadî li welatê me nîn e.

Genim di mala me de nîn e.

Ez Kurd im, ez Ereb nîn im.

Em Tirk nîn in, em Kurd in.

Tune<sup>38</sup>

Tiştêkî me tune ye

Mala min tune ye.

Xwarina me tune ye.

---

<sup>38</sup>Tune, lêkera (heyîn) bi xwe ye di rewşa nakirinê de:  
Mala min heye.      Mala min tune ye.

#### 1.2.3.5.8 Lêkera bûn

Ev lêker du wateyan dide, emê bi mînakan wan şirove bikin.

1.

Ez dibim rojnamevan.

Ez dibim şervan.

Ewê bibe aqilmendekî mezin.

2.

Ez hozan im.

Ew aqilmend e.

Em şervan in.

Emê di wateya duwemîn de lêkera (bûn) veguhêzin.

#### Nihok

|          |               |             |
|----------|---------------|-------------|
| Ez im    | Ez Kurd im    | Ez dê me    |
| Tu yî    | Tu Kurd î     | Tu dê yî    |
| Ew e     | Ew Kurd e     | Ew dê ye    |
| Em in    | Em Kurd in    | Em dê ne    |
| Hûn in   | Hûn Kurd in   | Hûn dê ne   |
| Ew in    | Ew Kurd in    | Ew dê ne    |
| Ne ez im | Ez ne Kurd im | Ez ne dê me |

#### Nihokê pêşro

|        |             |
|--------|-------------|
| Ez bim | Ez Kurd bim |
| Tu bî  | Tu Kurd bî  |

|         |              |
|---------|--------------|
| Ew be   | Ew Kurd be   |
| Em bin  | Em Kurd bin  |
| Hûn bin | Hûn Kurd bin |
| Ew bin  | Ew Kurd bin. |

### Pêşedem

|            |               |
|------------|---------------|
| Dê ez bim  | Ezê Kurd bim  |
| Dê tu bî   | Tê Kurd bî    |
| Dê ew be   | Ewê Kurd be   |
| Dê em bin  | Emê Kurd bin  |
| Dê hûn bin | Hûnê Kurd bin |
| Dê ew bin  | Ewê Kurd bin  |

### Buhêrk

|         |              |
|---------|--------------|
| Ez bûm  | Ez Kurd bûm  |
| Tu bûyî | Tu Kurd bûyî |
| Ew bû   | Ew Kurd bû   |
| Em bûn  | Em Kurd bûn  |
| Hûn bûn | Hûn Kurd bûn |
| Ew bûn  | Ew Kurd bûn  |

### Mêjbuhêrk

|          |               |
|----------|---------------|
| Ez bûbûm | Ez Kurd bûbûm |
|----------|---------------|

Tu bûbûyî  
Ew bûbû  
Em bûbûn  
Hûn bûbûn  
Ew bûbûn

Tu Kurd bûbûyî  
Ew Kurd bûbû  
Em Kurd bûbûn  
Hûn Kurd bûbûn  
Ew Kurd bûbûn

Bicîhbuhêrk

ماڤی نەقی

Ez bûme  
Tu bûyî  
Ew bûye  
Em bûne  
Hûn bûne  
Ew bûne

Ez Kurd bûme  
Tu Kurd bûyî  
Ew Kurd bûye  
Em Kurd bûne  
Hûn Kurd bûne  
Ew Kurd bûne

Kêmbuhêrk

گەڤی ئەمکارە

Ez dibûm  
Tu dibûyî  
Ew dibû  
Em dibûn  
Hûn dibûn  
Ew dibûn

Ez Kurd dibûm  
Tu Kurd dibûyî  
Ew Kurd dibû  
Em Kurd dibûn  
Hûn Kurd dibûn  
Ew Kurd dibûn

### Fermanî

|       |            |
|-------|------------|
| Bibe  | Kurd bibe  |
| Bibin | Kurd bibin |

### Lavij

|          |               |
|----------|---------------|
| Ez bama  | Ez Kurd bama  |
| Tu bayî  | Tu Kurd bayî  |
| Ew ba    | Ew Kurd ba    |
| Em bana  | Em Kurd bana  |
| Hûn bana | Hûn Kurd bana |
| Ew bana  | Ew Kurd bana  |

(bibûma)

### Nihokê Lavij

|           |                |
|-----------|----------------|
| Ezê bama  | Ezê Kurd bama  |
| Tuyê bayî | Tê Kurd bayî   |
| Ewê ba    | Ewê Kurd ba    |
| Emê bana  | Emê Kurd bana  |
| Hûnê bana | Hûnê Kurd bana |
| Ewê bana  | Ewê Kurd bana  |

### Bijoke

|           |                |
|-----------|----------------|
| Ez bûbama | Ez Kurd bûbama |
| Tu bûbayî | Tu Kurd bûbayî |

(bûbûma)



Ew bûba  
Em bûbana  
Hûn bûbana  
Ew bûbana

Ew Kurd bûba  
Em Kurd bûbana  
Hûn Kurd bûbana  
Ew Kurd bûbana

Nihokê bijoke

Ezê bûbama  
Tuyê bûbayî  
Ewê bûba  
Emê bûbana  
Hûnê bûbana  
Ewê bûbana

Ezê Kurd bûbama  
Tê Kurd bûbayî  
Ewê Kurd bûba  
Emê Kurd bûbana  
Hûnê Kurd bûbana  
Ewê Kurd bûbana

Guman

Ez bûbim  
Tu bûbî  
Ew bûbe  
Em bûbin  
Hûn bûbin  
Ew bûbin

Ez Kurd bûbim  
Tu Kurd bûbî  
Ew Kurd bûbe  
Em Kurd bûbin  
Hûn Kurd bûbin  
Ew Kurd bûbin

Nihokê guman

Ezê bûbim

Ezê Kurd bûbim

|            |                 |
|------------|-----------------|
| Tuyê bûbî  | Tê Kurd bûbî    |
| Ewê bûbe   | Ewê Kurd bûbe   |
| Emê bûbin  | Emê Kurd bûbin  |
| Hûnê bûbin | Hûnê Kurd bûbin |
| Ewê bûbin  | Ewê Kurd bûbin  |

### Nasîn

Bi nav, rengdêr û cînavan re lêkera bûn biserê xwe tê nivîsandinê.

|             |            |           |        |
|-------------|------------|-----------|--------|
| Ez Kurd im  | Ez baş im  | Ez çê me  | Ez im  |
| Tu Kurd î   | Tu baş î   | Tu çê yî  | Tu yî  |
| Ew Kurd e   | Ew baş e   | Ew çê ye  | Ew e   |
| Em Kurd in  | Em baş in  | Em çê ne  | Em in  |
| Hûn Kurd in | Hûn baş in | Hûn çê ne | Hûn in |
| Ew Kurd in  | Ew baş in  | Ew çê ne  | Ew in  |

Lê bi lêkeran re, bi lêker ve tê nivîsandinê:

|          |           |
|----------|-----------|
| Ez diçim | Em diçin  |
| Tu diçî  | Hûn diçin |
| Ew diçe  | Ew diçin  |

1.2.3.5.9 Veguhastin lêkera hebûn: Hebûn Hebe

| <u>Nihok</u> | <u>Nihokê pêşro</u> | <u>Pêşedem</u> |
|--------------|---------------------|----------------|
| Ez heme      | Ez hebim            | Ezê hebim      |
| Tu heyî      | Tu hebî             | Tê hebî        |
| Ew heye      | Ew hebe             | Ewê hebe       |
| Em hene      | Em hebin            | Emê hebin      |
| Hûn hene     | Hûn hebin           | Hûnê hebin     |
| Ew hene      | Ew hebin            | Ewê hebin      |

| <u>Buhêrk</u> | <u>Lavij</u> | <u>Bijoke</u> |
|---------------|--------------|---------------|
| Ez hebûm      | Ez hebama    | Ez hebûma     |
| Tu hebûyî     | Tu hebayî    | Tu hebûyî     |
| Ew hebû       | Ew heba      | Ew hebûya     |
| Em hebûn      | Em hebana    | Em hebûna     |
| Hûn hebûn     | Hûn hebana   | Hûn hebûna    |
| Ew hebûn      | Ew hebana    | Ew hebûna     |

| <u>Guman</u> | <u>Nihokê lavij</u> | <u>Nihokê bijoke</u> |
|--------------|---------------------|----------------------|
| Ez hebim     | Ezê hebama          | Ezê hebûma           |
| Tu hebî      | Tê hebayî           | Tê hebûyayî          |
| ew hebe      | Ewê heba            | Ewê hebûya           |
| Em hebin     | Emê hebana          | Emê hebûna           |
| Hûn hebin    | Hûnê hebana         | Hûnê hebûna          |
| Ew hebin     | Ewê hebana          | Ewê hebûna           |

1.2.3.5.9 Veguestina lêkerên derhingêv di demên derbasbûyî de

Lêkera dîtîn (KDB) dît

(min, te, wî, wê, me, we, wan) dît / dîtîn

Kê / kê çî dît? Kî / kê çî dîtîn?

| Kiryar                   | Berkar | Buhêrk |
|--------------------------|--------|--------|
| Te, wî, wê, wan          | ez     | dîtîm  |
| Min, te, me, we, wan     | tu     | dîtî   |
| Te, wî, wê, we, wan      | ew     | dît    |
| Min, wî, wê, me, wan     | em     | dîtîn  |
| Min, te, wî, wê, me, wan | hûn    | dîtîn  |
| Min, te, we, wan         | ew     | dîtîn  |
| Min, te, wî, wê, me, wan | xwe    | dît    |

| Kiryar              | Berkar | Mêjbuhêrk |
|---------------------|--------|-----------|
| min te wî wê we wan | ez     | dîtîbûm   |
| min te wî wê we wan | tu     | dîtîbûyî  |
| min te wî wê we wan | ew     | dîtîbû    |
| min te wî wê we wan | em     | dîtîbûn   |
| min te wî wê we wan | hûn    | dîtîbûn   |
| min te wî wê we wan | ew     | dîtîbûn   |
| min te wî wê we wan | xwe    | dîtîbû    |

| Kiryar              | Berkar | Bicibuhêrk |
|---------------------|--------|------------|
| min te wî wê we wan | ez     | dîtime     |
| min te wî wê we wan | tu     | dîtiyî     |
| min te wî wê we wan | ew     | dîtiye     |
| min te wî wê we wan | em     | dîtine     |
| min te wî wê we wan | hûn    | dîtine     |
| min te wî wê we wan | ew     | dîtine     |
| min te wî wê we wan | xwe    | dîtiye     |

| Kiryar                 | Berkar | Kêmbuhêrk |
|------------------------|--------|-----------|
| Te, wî,wê,me, wan      | ez     | didîtim   |
| Min,te,me,we,wan       | tu     | didîtî    |
| Te,wî,wê,we,wan        | ew     | didît     |
| Min,wî,wê, me,wan      | em     | didîtin   |
| Min, te,wî,wê,me       | hûn    | didîtin   |
| Min,te,wî,wê,me,we,wan | ew     | didîtin   |
| Min,te,wî,wê,me,we,wan | xwe    | didît     |



| Kiryar              | Berkar | Lavij    |
|---------------------|--------|----------|
| min te wî wê we wan | ez     | bidîtama |
| min te wî wê we wan | tu     | bidîtayî |
| min te wî wê we wan | ew     | bidîta   |
| min te wî wê we wan | em     | bidîtana |
| min te wî wê we wan | hûn    | bidîtana |
| min te wî wê we wan | ew     | bidîtana |
| min te wî wê we wan | xwe    | bidîta   |

| kiryar                  | Berkar | Bijoke     |
|-------------------------|--------|------------|
| te wî wê we wan...      | ez     | dîtibûma   |
| min wî wê we wan ...    | tu     | dîtibûyayî |
| min te wî wê we wan ... | ew     | dîtibûya   |
| min te wî we wê wan ... | em     | dîtibûna   |
| min te wî wê we wan ... | hûn    | dîtibûna   |
| min te wî wê we wan ... | ew     | dîtibûna   |
| min te wî wê we wan ... | xwe    | dîtibûya   |



| Kiryar              | Berkar | Guman   |
|---------------------|--------|---------|
| Min ,te, wî, wê...  | ez     | dîtibim |
| Min, te, wî, wê...  | tu     | dîtibî  |
| Min, te, wî, wê ... | ew     | dîtibe  |
| Min, te, wî, wê...  | em     | dîtibin |
| Min, te, wî, wê...  | hûn    | dîtibin |
| Min, te, wî, wê...  | ew     | dîtibin |

Di veguhastina lêkerên derhingêv, di demên derbasbûyî de, kiryar di awayê tewandî de û berkar di awayê rast de tê bikaranînê. Lê di nihok û pêşerojê de, kiryar di awayê rast de û berkar di awayê tewandî de tê bikaranînê:

Ez (te, wî, wê, me, we, wan) dibînim.

Ez xwe dibînim.

Tê (tuyê) min bibînî.

Ewê wê bibîne.

| Kiryar                      | Berkar | N. lavij |
|-----------------------------|--------|----------|
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê  | ez     | bidîtama |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê  | tu     | bidîtayî |
| (Min,te,wî,wê, me,we,wan) ê | ew     | bidîta   |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê  | em     | bidîtana |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê  | hûn    | bidîtana |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê  | ew     | bidîtana |

| Kiryar                     | Berkar | N. bijoke  |
|----------------------------|--------|------------|
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | ez     | dîtibûma   |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | tu     | dîtibûyayî |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | ew     | dîtibûya   |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | em     | dîtibûna   |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | hûn    | dîtibûna   |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | ew     | dîtibûna   |

| Kiryar                     | Berkar | N. guman |
|----------------------------|--------|----------|
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | ez     | dîtibim  |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | tu     | dîtibî   |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | ew     | dîtibe   |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | em     | dîtibin  |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | hûn    | dîtibin  |
| (Min,te,wî,wê,me,we,wan) ê | ew     | dîtibin  |

Di demên derbasbûyî de, lêkera derhingêv bi berkar ve tê girêdanê û li gor wî tê veguhastinê.

Veguhetina lêkerên derhungêv di nihok û pêşedemê de

Lêkera dîtîn KDN bîn

Kî, kê/ çi dibîne? Kiyê, kê/ çi dibîne?

| Kiryar | Berkar                        | Nihok   |
|--------|-------------------------------|---------|
| Ez     | xwe, te, wî, wê, me, we, wan  | dibînim |
| Tu     | min, xwe, wî, wê, me, we, wan | dibînî  |
| Ew     | min, te, xwe, me, we, wan     | dibîne  |
| Em     | min, te, wî, wê, xwe, we, wan | dibînin |
| Hûn    | min, te, wî, wê, me, xwe, wan | dibînin |
| Ew     | min, te, wî, wê, me, we, xwe  | dibînin |

| Kiryar | Berkar                        | Pêşedem |
|--------|-------------------------------|---------|
| ezê    | xwe, te, wî, wê, me, we, wan  | bibînim |
| Tê     | min, xwe, wî, wê, me, we, wan | bibînî  |
| Ewê    | min, te, xwe, me, we, wan     | bibîne  |
| Emê    | min, te, wî, wê, xwe, we, wan | bibînin |
| Hûnê   | min, te, wî, wê, me, xwe, wan | bibînin |
| Ewê    | min, te, wî, wê, me, we, xwe  | bibînin |

Di pêşedemê de, ê (dê, wê) dawiya kiryar

(ez, tu, ew, em, hûn, ew) digire

Di demên nihok û pêşedemê de, lêkera derhingêv bi kiryar ve tê girêdanê û li gor wî tê veguhastinê.

Veguhastina lêkerên derhingêv yê cemkirî:

Lêkera hilgirtin koka dema niha (KDN) hil - gir

Kî, kê/ çî hildigire? Kiyê, kê/ çi hil(bi)gire?

| Kiryar | Berkar                  | Nihok      |
|--------|-------------------------|------------|
| Ez     | xwe,te,wî,wê,me,we,wan  | hildigirim |
| Tu     | min,xwe,wî,wê,me,we,wan | hildigirî  |
| Ew     | min,te,xwe,me,we,wan    | hildigire  |
| Em     | min,te,wî,wê,xwe,we,wan | hildigirin |
| Hûn    | min,te,wî,wê,me,xwe,wan | hildigirin |
| Êw     | min,te,wî,wê,me,we,xwe  | hildigirin |

Di pêşedemê de, (ê) dawiya kiryar (ez, tu, ew, em, hûn, ew) digire û ( bi ) dikeve navbera herdu perçeyên lêker.



### 1.2.3.5.11 Çend lêkerên hîmî

| Rader   | KDN   | KDB   | Fermanî  |
|---------|-------|-------|----------|
| kirin   | k     | kir   | bike     |
| bûn     | b     | bû    | bibe     |
| anîn    | în    | anî   | bîne     |
| girtin  | gir   | girt  | bigire   |
| xwarin  | xw    | xwar  | bixwe    |
| dan     | d     | da    | bide     |
| man     | mîn   | ma    | bimîne   |
| çûn     | ç     | çû    | biçe     |
| hatin   | ê     | hat   | were     |
| gotin   | bêj   | got   | bêje     |
| firotin | firoş | firot | bifiroşe |
| xistin  | x     | xist  | bixe     |
| ketin   | kev   | ket   | bikeve   |
| axaftin | axiv  | axift | baxive   |
| avêtin  | avêj  | avêt  | bavêje   |
| jîn     | jî    | jî    | bijî     |
| ajotin  | ajo   | ajot  | bajo     |
| birin   | b     | bir   | bibe     |
| dîtin   | bîn   | dît   | bibîne   |
| hîştin  | hêl   | hişt  | bihêle   |



|           |       |         |          |
|-----------|-------|---------|----------|
| gihîştin  | gihîj | gihîşt  | bigihîje |
| kuştin    | kuj   | kuşt    | bikuje   |
| lîstin    | lîz   | lîst    | bilîze   |
| mirin     | mir   | mir     | bimire   |
| şûştin    | şo    | şûşt    | bişo     |
| xwastin   | xwaz  | xwest   | bixwaze  |
| bihîstin  | bihîz | bihîst  | bibihîze |
| biraştin  | birêj | biraşt  | bibirêje |
| cûtin     | cû    | cût     | bicû     |
| dotin     | doş   | dot     | bidoşe   |
| dizîn     | diz   | dizî    | bidize   |
| hejmartin | jimêr | hejmart | bijimêre |
| malîştin  | mal   | malîşt  | bimale   |
| pan       | pê    | pa      | bipê     |
| parastin  | parêz | parast  | biparêze |
| ristin    | rês   | rist    | birêse   |
| sûtin     | sû    | sût     | bisû     |
| jentin    | jen   | jent    | bijene   |
| zan       | zê    | za      | bizê     |
| pûn       | pû    | pû      | bipû     |
| dirûtin   | dirû  | dirût   | bidirû   |
| rîtin     | rî    | rît     | birî     |

### 1.2.3.6 Hoker

Hoker peyvek e neguhêrbar e, reng, rewş, kirin, cih û hejmara lêkeran diyar dike. Wateya wan temam dike. Hoker bi serê xwe nayê bikaranînê. Dema ku bi serê xwe be tenê navek e ne bêtir. Gelek caran mirov di navbera hoker û rengdêran de şaş dibe. Jibo ku em cudahiya di navbera wan de diyar bikin, em dibêjin: Hoker rengdêrê lêkeran e. Lebat û bizava lêkeran di nav rewş û rengê navdêran de diyar dikin.

Şoreşa nûjen hat.

Em vê hevokê nas dikin ku "nûjen" rewş, pesin, salix û rengê şoreşê diyar dike. Şoreş jî, di hevokê de navdêr e. Jibo vê peyva (nûjen) rengdêr e. Lê dema em bibêjin:

Şoreş nûjen hat.

peyva (nûjen) di vê hevokê de rengê lêkera hatin diyar dike. Bizav û lebata „hat“ diyar dike. Jibo vê peyva "nûjen" di vê hevokê de hoker e. Herwiha em dibêjin:

|                     |         |
|---------------------|---------|
| Min xortê "jîr" dît | Rengdêr |
| Min xort "jîr" dît. | Hoker   |
| Berfa "par" barî    | Rengdêr |
| Berf "par" barî     | Hoker   |

Tê xuyakirinê ku zêder girêdanê di navbera rengdêr û navdêr de çêdike, dema ku zêder radibe rengdêr bi lêker ve tê girêdanê û dibe hoker.

Di kurdî de (5) pênc beşên hokeran hene:

1. Hokerên ku dema lêker diyar dikin: Hokerên demîn
2. Hokerên ku cihê lêker diyar dikin: Hokerên cihîn
3. Hokerên ku rewşa lêker diyar dikin: Hokerên çawanî
4. Hokerên ku hejmara lêker diyar dikin: Hokerên hejmarî
5. Hokerên pirsyarî.

#### 1.2.3.6.1 Hokerên demîn

Ev hoker kirin û bûna lêker di nav deman de diyar dikin û bersiva van pirsan didin:

Kengî?

Çi demê?

Çi çaxî?

Ez çûm Hewlêrê.

Kengî?

Ez par çûm Hewlêrê.

Min şoreşgerek dît.

Çi demê?

Min îro şoreşgerek dît.

Gelek hokerên demîn hene. Ji van hokeran em çendekan rêz dikin: Niha, duh, pêr, pitirpêr, sibe, dusibe, sêşibe, îro, êvarî, îşev, şevadin, şevtiradin, par, pitirpêrar, îsal, danê sibê, danê êvarê, kêliyadin, demadin, berê, dereng, havînê, payîzê, zivistanê, biharê, hinga, hêj, hingorê, nîvro, berî nîvro, piştî nîvro, nîvşev, nîvêşevê, piştî nîşev, nijkêve, paşve, pêşde, paşîvê, zû, zûde, zûve, dewra berê, wêrojê, wêşevê, mêj, îne, şemiyê,... ûwd.

Herwiha hemû peyvên ku dem, heyam û çaxan diyar dikin dikarin bibin hokerên demîn.

#### 1.2.3.6.2 Hokerên cihîn

Ev hoker cihê kirin û bûna lêker diyar dikin û bersiva van pirsan didin:

Li ku?

Li ku derê?

Ku ve?

Çi cihî?

Ez hilkişiyam.

Bi ku ve?

Ez hilkişiyam jor.

Ez çûm.

Ku derê?

Ez çûm cem mamoste.

Ez ketim.

Çi cihî?

Ez ketim bin masê.

Em çend hokerên cihîn li jêr rêz dikan:

Ser, ber, bin, pêş, paş, cem, nik, bal, berjêr, berjor, der, hindir, kêlek, tenişt, alî, derve, dor, hêl, navber, nav, pêşber, rast, çep, rex, serbiser, seranser, serdest, bindest, serjêr, serjor, xwar, vir, wir,... ûwd.

Hokerên mîna : Dûr, nêzîk, pêşî û paşî, bi kêrî diyarkirina cihê lêker û dema wî jî, tên. Hokerên demîn û cihîn in. Ev jî, li gor bikaranîna hevokê tê nasînê.

Çûna min Qamişlo dûr e. demîn

Ez ji dûr tîm. cihîn

#### 1.2.3.6.3 Hokerên çawanî

Ev hoker rewş û rengê kirin û bûna lêkeran diyar dikan. Lêker çawa bûye, çawa hatiye kirin nîşan dikan. Hokerên çawanî bersiva van pirsan didin:

Çawa?

Çilo?

Bi çi awayî?

Bi çi tentêlê?



Reşo dipeyîve.

Çawa?

Reşo baş dipeyîve.

Ez xweş diçim dibistanê.

Bêrîvan bilez hatin.

Şêrîn hêdî hêdî çû bajêr.

Em çend hokerên çawanî rêz dikin:

Hêdî, hêdî hêdî, baş, qenc, rind, bihêz, giran, fireh, teng, xweş, tenê, bilez, rast, birastî, cot, yeko yeko, bibaşî, zû, nebaş, wisa, çê, çêtir, xirab, wiha, wilo, werge, durust, dirêj, kurt, sist, sert, nerm, tûj, hişk, sivik, hêdîka,... ûwd.

Daçeka "tir" mîna rengdêran dibe paşgîn ji hokeran re jî.

Rewşa çiloniyê bêtir dike. Herwiha "tirîn" digihîne tixûbê dawî.

Ez xweş hatim

Ez xweştir hatim

Ez xweştirîn hatim.

Min tu hişk dîtî

Min Şevîn hişktir dît

Min Rojîn hişktirîn dît.

#### 1.2.3.6.4 Hokerên hejmarî (çendanî)

Ev hoker pirbûn û hindikahiya kirin û bizava lêker diyar dikin  
û bersiva van pirsan didin:



Çend?

Çiqas?

Mamoste ji min re got.

Mamoste gelekî ji min re got.

Min hindik xwarin da şervanan.

Ez carna diçûm Amedê.

Ji hokerên hejmarî ev in: Gelek, pir, zehf, hinek, hindik, çend, hew, evçend, hinde, bes, çendek, carna, hewçend, hewqas, kêr, zêde, tenê, carek, ûwd.

#### 1.2.3.6.5 Hokerên pirsîyarî

Peyvên ku bi kêrî pirsîyariyê tên û bi awayekî pirsîyarî bizav û lebata lêkeran diyar dikin ji wan re hokerên pirsîyarî tê gotinê. Bersiva van hokeran bi xwe bizava lêker diyar dike. Lê kesê ku pirsê dike baş dizane bersiv çi ye. Tenê dipirse jibo neqayîlbûna xwe liser wê rewşê diyar bike.

Em çawa heta niha bindest in?

Ma kêr nizanê em jî mirov in?

Hokerên pirsîyarî û cînavên pirsîyarî:

Hoker û cînavên pirsîyariyê yek peyv in, lê cînav bi kêrî pirsê tê û bersivê dixwaze. Hoker jî, neqayîlbûna xwe liser rewşekê diyar dike.

Kîjan? Hem cînav û hem hoker e. Em dibêjin:

Kîjan me nas nake ku em gel in?

Kîjan gul xweşik e?

Kîjan di hevoka yekemîn de hoker e û di hevoka duyemîn de cînav e. Ji hokerên pirsîyarî ev in:

Ma, çi, kî ye, çi ye, gelo, kînga, ku, kî, kê, bi çi, çira. çilo, çawa, çend, kijan, çito, çer, çi dem, çima, jiku,... ûwd.

### 1.2.3.7 Daçek

Daçek peyveke neguhêrbar e. Bi serê xwe wateyeke taybetî nayîne pê. Bê daçekan axaftin nabe: Celebên daçekan ev in:

1. Daçekên lêkerî (lêkerçêker).
2. Daçekên raweyî.
3. Daçekên navdêrî.
4. Daçekên erênî.
5. Daçekên nayînî.
6. Daçekên pirsiyarî.
7. Daçekên egerî.
8. Daçekên vekitî.

#### 1.2.3.7.1 Daçekên lêkerî

Ev daçek pêşgînên ku di çêkirina lêkeran de tên bikaranînê ne. Ji van daçekan:

Ve, ra, hil, ba, jê, tê, têt, vê, wer, çê, ber, da, der, hin, lê, pê, pêk, rû, ser, bin, pey, nav, pêş, paş, jev, lev, pev, tev, dû, hev, ûwd.

Ve        Vexwendin, vegirtin, vemirandin,  
          vebûn, vedan,...

Ra        Raketin, rakirin, rabûn, raxistin, razan,  
          rakişandin,...

|     |                                                               |
|-----|---------------------------------------------------------------|
| Hil | Hildan, hilgirtin, hilkişandin, hilpişkîn,<br>hilweşandin,... |
| Ba  | Badan,                                                        |
| Jê  | Jêkirin,                                                      |
| Tê  | Têgihîştin,                                                   |
| Têk | Têkdan,                                                       |
| Vê  | Vêxistin                                                      |
| Wer | Wergerandin,                                                  |
| Çê  | Çêkirin,                                                      |
| Ber | Berxistin,                                                    |
| Da  | Dagirtin,                                                     |
| Hin | Hingavtin,                                                    |
| Lê  | Lêgerîn,                                                      |
| Pê  | Pêvedan,                                                      |
| Pêk | Pêkanîn,                                                      |
| Rû  | Rûniştin                                                      |
| Ser | Serkeftin,                                                    |
| Bin | Binkeftin,                                                    |
| Pey | Peyketin,                                                     |
| Nav | Navdan,                                                       |
| Pêş | Pêşketin,                                                     |
| Lev | Levhatin,                                                     |
| Pev | Pevçûn,                                                       |

Tev      Tevdan,  
Dû      Dûketin,  
Hev      Hevgirtin

#### 1.2.3.7.2 Daçekên raweyî

Ev daçek di veguhastina lêkeran de tîbikaranînê.

Daçekên raweyî ev in:

Jibo nihok: di

Ez diçim dibistanê.

Jibo pêşedemê: ê (dê, wê) - bi

Ezê biçim dibistanê.

Jibo raweya fermanî: bi

Bilezîne li me dereng e.

Jibo raweyên hekeyî:

Ger , eger, heke, ku, heker, dibe, belkî.

Eger ez biçûma dibistanê, ezê fêrbibûma.

Dibe ku ez çûbim bajêr.

Ku ez çûbama welêt ezê dilgeş bibama.

Belkî min ew pirtûk xwendibe.

#### 1.2.3.7.3 Daçekên navdêrî

Ev daçek navan ditewînin. Daçekên navdêrî ev in:

bi, di, ji, li,

Ez ji bajêr tēm.  
Min ji mamoste re got.  
Em bi Amedê ve çûn.  
Ez di Qamişlo re çûm Dêrikê.  
Ez par li Hewlêrê bûm.

#### 1.2.3.7.4 Daçekên erênî

Ev daçek bi kêrî erêkirina rewşekê tîn. Daçekên erênî ev in:  
Bila dilê te xweş bibe.  
Belê, ez te nas dikim.  
Erê, Şêrîn hevala min e.  
Herê, ez Mem û Zîna Xanî dixwînim.  
A, ez ji Şirnexê me.  
Jixwe tu min nas dikî.

#### 1.2.3.7.5 Daçekên nayînî

Ev daçek rewşekê dikin darêja nakirinê. Daçekên nayînî ev in:  
Bê tu bêjî ez dizanim tu Kurd î.  
Neçe biyanîyê, biyanî mirin e.  
Ez naxwazim bêrûmet bijîm.  
Ez nikarim bê serxwebûn û azadî bijîm.  
No, ez te nas nakim.



Naxêr, ez bindestiyê napejirînim.

#### 1.2.3.7.6 Daçekên pirsiyarî

Bi van daçekan pirs tên kirinê. Daçekên pirsiyarî ev in:

çawa, çer, çima, çira, çito, gelo, ka, ma, qey, bira, wa, weh, wey.

Çawa tu hatî?

Çima tu li me napirsî?

Gelo tu çûbûyî ku derê?

Qey tu ji gund tê?

#### 1.2.3.7.7 Daçekên egerî

Ev daçek sedema karekî, kirinekê yan jî, rewşekê vedikin.

Daçekên egerî ev in:

Da, daku, jiber, jiberku, jibo, bo, ku, seba, sedem, lewre, çinku, çimkî,..

Hogir tiving kirî da biçe şoreşê.

Jiber ku welatê me bindest e, zimanê me jî, qedexe ye.

Jibo pêşxistina zimanê kurdî yekîtiyeke zimanzanan pêwîst e.

Serxak û binxaka me talan dibe lewre em xêzan û jar in.

Herdem em bûne leşkerên biyaniyan seba ku em li xwe xwedî derneketine.

#### 1.2.3.7.8 Daçekên vekitî

Daçekên vekitî ev in:

Ba, bal, belkî, bes, bese, cardî, cem, sipas, dîsa, êdî, gel, ger, gor, heçî, her, heta, şabaş, heya, hingî, lew, lewma, lewre, mîna, nik, jixwe, tewrî, wekî, wilo, ,wisa, xwezka, xwezî, tenê,... ûwd.

Êdî em ji xewa mirinê hişyar bûn.

Dîsa li welatê me kuştin û talan e.

Ger em azad bibin hingî emê mîna mirovan bijîn.

Êdî bes e ev zilm û zor.

### 1.2.3.8 Gihanek

Gihanek peyveke neguhêrbar e. Du peyvan, du hevokan yan jî, peyv û hevokekê bi hev girê dide. Gihanek sê beş in:

#### 1.2.3.8.1 Gihanekên xwerû

Ji, jî, ku, lê, lo, û.

Roja xweş ji serê sibê xuya ye.

Ez jî, mîna te Kurd im.

Ew sîxurê ku te dît hat kuştinê.

Ev xweş e lê kin e.

Ezê biçim şoreşê lo tu kêfxweş be.

Ez şoreşger û aşitîxwaz im.

#### 1.2.3.8.2 Gihanekên dubare

Jî ... jî, carna ... carna jî, çiqas ... çiqas jî,

çawa ... ewqas jî, hem...hem jî, ne...ne,

ne ... ne jî, ya ... ya, yan ... yan jî, ..

Dijminê me diz e jî, şêr e jî.

Carna berf dibare carna jî, baran.

Çiqas em bixebitin ewqas jî, emê pêşkevin.

Çawa tu biçînî wisa jî, tê biçînî.

Hem şoreşger e hem jî, karker e.

Ne diçe kar ne diçe dibistanê.

Ya dimire ya dimîne.

Yan Kurdistan yan jî, Kurdistan.

Yan serkeftin yan serkeftin.

#### 1.2.3.8.3 Gihanekên daçekî

Ev gihanek bi xwe daçek in, lê bi awayê gihanekan tîn bikaranîne. Gihanekên daçekî ev in:

Digel, gel, lewre, mîna, wekî, loma.

Dema min Bêrîvan dît digel komê gerîla bû.

Xebat çû şoreşê Hogir gel wî çû.

Min doza serxwebûnê fikir loma dijmin ez girtim

Zora şorşgerî xurt dibe loma dijmin hinekî me dipejirîne.

Ew mîna dijmin dihire .

Şervan xwe wekî berpirsiyarekî gelî dibîne.

### 1.2.3.9 Bang ( Deng, Baneşan )

Bang peyveke neguhêrbar e. Reng nade navdêr û peyvan û bi wan nayê kişandinê. Ev peyv gazî, kovan, hawar, şahî û dilxweşîyan diyar dike. Bang bi sê beşan par dibin:

1. Bangê gazîkirinê
2. Bangên dilxweşî û şahiyê
3. Bangên êş û kovanan

#### 1.2.3.9.1 Bangên gazîkirinê

Dema ku buyerek bê serê mirov û bixwaze derdorên xwe bi hawarekê bihesîne, ev bang tên bikaranînê:

Hey, ey, gelî, gidî, lê, lêlê, lo, lolo, haware, wey lo, wey lê, hey lo, hey lê, hey hey.

Hey welato hey welato

Tu yî xemla rojhilat

Ji Asûr ta bû çar qet

Tim liser te kêferat

Gelî Kurdan rabin ev roja me ye.

Lo xorto! Lê keçê! Hawar rabin li me dereng e.

Ey rêberê zane rêkêş seyda û jîr

Dengê perîşana mamoste Kemal Pîr

#### 1.2.3.9.2 Bangên dilxweşî û şahiyê

Ev bang di dilxweşî û şahiyên de tên bikaranînê. Ew jî, ev in: Êh, hah, hih, ox, xweş,

Êh, ev roj xweş e!

Hah te çi baş got!

Ox te dilê min bi vê peyvê şad kir!

Xweş ev çi awazeke bêmirin e!

#### 1.2.3.9.3 Bangên êş, nifrîn û kovanan

Ev bang di êş, nexweşî, poşmanî û aciziyê de tên avêtinê.

Ew jî, ev in: Ax, ay, of, nifir, tuf, wax, wey.

Ax ez ketim çi rewşê!

Ay dilê min!

Of serê min çi dêşe!

Nifir li vê dema bêbext!

Tuf li sîxurên xwefiroş!

Wax ev çi rewşeke zor e!

Wey li minê dayê!



#### 1.2.4 Hevok

Hevok yekîtiyek naverokî ye. Ev yekîtî bi beşên axaftinê saz dibe û bi nivîskî yan bi devikî têgihîştinekê bi mebesta dîtinekê, ramanekê, daxwazekê, hisekê yan wêneyê bûyerekê tîne ziman. Di avahiya hevokê de, nav, lêker, cînav, rengdêr, hejmar, hoker, daçek, gehandek û bang cihê xwe, her yek bi awayekî digire. Bi yekbûna vê koma peyvan wateyek ku mirov liser tişteki agahdar dike saz dibe. Mînak Ezê sibe biçim Amedê.

Min rewşa Azad li biyaniyê dît.

Ez gelek bi diyariya te dil xweş bûm.

Jiyan xweş e.

Ax ! Ev çi rewş e !

Têgihîştina hevokê pir caran bi beşên avahiya wê ve girêdayî ye.

1. Dema em dibêjin:

Jiyan xweş e.

Yê dipeyîve ramana xwe liser jiyanê tîne ziman. Lê dema li dawiya vê hevokê li şûna xalê ( niqtê ) xalepirs ( nîşana pirsê ) bê danînê:

Jiyan xweş e?

Yê ku dipeyîve dixwaze ji mirovekî din, ramana wî liser jiyanê hîn bibe. Hevoka yekemîn agahdarî ye. Mirov dikare bi ( bêjehevok ) bi nav bike. Ya duyemîn jî, hevokek pirsîyarî ye. Mirov dikare bi ( pirsehevok ) bi nav bike.

2. Pir caran girêdana lêker bi beşên din yê axaftinê re, me liser hevokê dike xwedî têgihîştinek taybetî. Dema em dibêjin:

Hogir dijî.

Hogir li çiyar dijî.

Hogir jiyanek xweş dijî.

Lêkera ( jîn ) li dijî ( mirin ) tê bikaranînê yan jî, cih û rengê jiyanê diyar dike. Lê pir lêkerên din bi yek wateyê tên bikaranînê. Mîna:

Hogir dixwîne. ( xwendin )

3. Di axaftina devîkî de, bi ahenga deng têgihîştina hevokê çêdibe. Her rengekî hevokê ahengek xwe taybetî heye. Ji vê ahengê mirov dizane pirs e, agahdarî ye yan jî, fermanî ye.

#### 1.2.4.1 Avahiya hevokê

##### 1.2.4.1.1 Hevokên lêkerî

Hevok di Kurmancî de, bi gelemperî bi vî awayê jêr tê sazkirinê:

| <u>Kiryar</u> | <u>Agahdarî / Berkar</u> | <u>Lêker</u> |
|---------------|--------------------------|--------------|
| Ez            | çayê                     | vedixwim.    |
| Ew            | gulan                    | av dide.     |
| Berfîn        | berxan                   | diçêrîne.    |

Lê bi hin lêkerên nederhingêv re ku bizava wan berbi aliyekî ve ye. Mîna:

çûn, ketin, hatin, firîn, bûn ( bi wateya çêbûn )... bi awayê jêr tê sazkirinê:

| <u>Kiryar</u> | <u>Lêker</u> | <u>Agahdarî</u> |
|---------------|--------------|-----------------|
| Ez            | diçim        | gund.           |
| Guhderz       | ket          | çalê.           |
| Şêrîn         | hat          | bajêr.          |
| Mado          | bû           | şoreşger.       |
| Serdar        | firî         | asîmanan.       |

Eger bi van lêkeran re daçek bên bikaranînê û aliyê bizava lêker bê guherînê, hevok dîsa vedigere ser awayê xwe yê gelemper:

| <u>Kiryar</u> | <u>Agahdarî</u> | <u>Lêker</u> |
|---------------|-----------------|--------------|
| Ez            | ji gund         | diçim.       |
| Guhderz       | di çalê de      | ket.         |
| Şêrîn         | ji bajêr        | hat.         |
| Serdar        | di asîmanan re  | firî.        |

Di hin rewşan de, lêker di darêja raderî de, tê bikaranînê û mîna navê mê tê tewandinê. Eger di van rewşan de, lêker bê kiryar be pêşiya hevokê digire:

Çûna zozanan xweş e.

Hatina biharê pîroz e.

Eger ev lêkerê di darêja raderî de bibe agahdarî di hevokên lêkerî de û bi lêkerekî din re bê, awayê jêr distîne:

Gulê, çûna bêriyê xweş dibîne.

Gel, hatina Newrozê pîroz kir.

Eger lêkerê derhingêv du berkaran bistîne, hevok awayê jêr distîne:

| <u>Kiryar</u> | <u>Berkar 1</u> | <u>Lêker</u> | <u>Berkar 2</u> |
|---------------|-----------------|--------------|-----------------|
| Azad          | gul             | firotin      | keçan.          |
| Şêrîn         | silav           | da           | şehîdan.        |
| Min           | nan             | da           | gerîla.         |

Eger berkarê duyemîn nedurust be<sup>39</sup>, hevok awayê jêr distîne:

| <u>Kiryar</u> | <u>Berkar1</u> | <u>Berkar2</u> | <u>Lêker</u> |
|---------------|----------------|----------------|--------------|
| Şoreşgeran    | nan            | ji Gulê        | xwestin.     |
| Şermîn        | navê gund      | ji Şîlan       | pirsî.       |

Pir caran hevok bi lêkerên nederhingêv re, bi kiryar û lêker çêdibe. Hingê bi vî awayî tê:

| <u>Kiryar</u> | <u>Lêker</u> |
|---------------|--------------|
| Sûlav         | raza.        |
| Nermîn        | hat.         |
| Ez            | dimeşim.     |
| Ew            | direve.      |
| Em            | diçin.       |

Eger hoker di hevokên lêkerî de hebe, bi awayên jêr tên sazkirinê:

1. Lêkerên nederhingêv:

| <u>Hoker</u> | <u>Kiryar</u> | <u>Lêker</u> | <u>Berkar</u> |
|--------------|---------------|--------------|---------------|
| Piştî nîvro  | Canda         | gihîşt       | Botanê.       |
| Êvarê        | Sernaz        | diçe         | dibistanê.    |

Yan jî, bi vî awayî:

---

<sup>39</sup>Berkarê nedurust herdem pêşiya lêker digire.

| <u>Kiryar</u> | <u>Hoker</u> | <u>Lêker</u> | <u>Berkar</u> |
|---------------|--------------|--------------|---------------|
| Canda         | Piştî nîvro  | gihîşt       | Botanê.       |
| Sernaz        | êvarê        | diçe         | dibistanê.    |

## 2. Lêkerên derhingêv:

| <u>Hoker</u> | <u>Kiryar</u> | <u>Berkar</u> | <u>Lêker</u> |
|--------------|---------------|---------------|--------------|
| Kêliyek din  | ez            | çayê          | vedixwim.    |
| Niha         | ez            | nan           | dixwim.      |

## Yan jî, bi vî awayê jêr:

| <u>Kiryar</u> | <u>Hoker</u> | <u>Berkar</u> | <u>Lêker</u> |
|---------------|--------------|---------------|--------------|
| Ez            | kêliyek din  | çayê          | vedixwim.    |
| Ez            | niha         | nan           | dixwim.      |

Eger di van rewşan de, berkar nedurust be, lêker dikeve dawiya hevokê:

Piştî nîvre Canda ji Botanê diçe.

Sernaz êvarê ji dibistanê tê.

Ez niha xwe ji xwarina nan re amade dikim.



Hevok, di, raweya fermanî de, ji rêzana gelemper der  
nakeve:

Were em nan bixwin!

Werin em biçin Çiyayê Şerefdînê!

Jiyanê baş nas bike!

Bibe xwediye jiyanek birûmet!

#### 1.2.4.1.2 Hevokên navdêrî

Ev hevok ji nav, rengdêr û lêkera bûn tên sazkirinê. Tu  
bizavê nakin û di rewşa bûnê de dimînin. Herwiha berkar û  
kiryar di van hevokan de, nîn in:

Jiyana birûmet gelek xweş e.

Gundiyên Kurd leheng in.

Şoreş rûmeta gel e.

Berxwedan jiyan e.

Serxwebûn û azadî nêzîk in.

Zindan dibistana qehremaniyê ne.

Koledarî rûreşiya mirovayiyê ye.

#### 1.2.4.1.3 Hevokên bangê

Ev hevok dikarin mîna hevokên lêkerî û yên navdêrî jî, bên:

1. Mîna hevokên navdêrî:

Ax, ev çi rewş e!

Oh xweş, ev çî awazek nemir e!

Wey, li minê dayê!

Tuf, li mirovên xwefiroş!

Nifir, li vê dema bêbext !

2. Mîna hevokên lêkerî:

Lo xorto ! Ji xew rabe dereng e!

Ox, te dilê min xweş kir !

Of, dilê min çiqas dêşe!

Ax, ez ketime çî rewşê !

#### 1.2.4.2 Di hevokê de, niqteşanî

Jibo asankirina xwendin, têgihîştin û xweşkirina ahenga hevokê, çend nîşan di nav de, cih digirin.

Ev nîşan dawiya hevokê, wateya parçeyekî jê û daxwaza wê pêş me dikin. Li hêla din, di xwendinê de, cihê rawes û bîndanê jî, diyar dikin. Ji van nîşanan re niqteşanî tê gotinê.

Nîşanên niqteşaniyê jî, ev in:

|     |                          |
|-----|--------------------------|
| .   | Xal ( Niqte )            |
| ,   | Dabir ( Bihnok )         |
| ?   | Xalepirs ( Niqtepirs )   |
| !   | Xalebang ( Niqtebang )   |
| :   | Xalecot ( Niqtecot )     |
| ;   | Xaledabir ( Niqtedabir ) |
| ( ) | Kevanek                  |
| " " | Dunik                    |
| —   | Xêzek                    |
| -   | Bendek                   |

. Xal

Ev nîşan dawiya hevokê diyar dike:

Duh, ez çûm Amedê. Min şal û şapek kirî. Li wir min hevalekî xwe dît. Em gelekî bi hev şa bûn. Li nav bajêr, min tiştên balkêş dîtin. Leşkeran kolan dagirtibûn.

, Dabir

Di nivîsandinê de, dabir pir pêwîst e. Cihên ku digire ev in:

1. Cihê gihaneka ( û ):

Hogir, Azad, Rojîn û Rewşen ji bajêr tên. Ev ciwan pir hişyar in. Dost û dijmin ji hev nas dikin, xwedî bawerî ne, jiyane nas dikin û riya xwe baş dizanin.

2. Dikeve navbera parçeyên hevokê yên biçûk, lê bi mercê ku wateya wê neyê guherandinê.

♠ Piştî jî, tê:

Çiya, cihê rûmeta me, hem jî, ji pîrozahiyên me ne.

♠ Pir caran, di...de, di...re, bi...ve, ji...re,...di nava du dabiran de, cih digirin:

Di rewşên awarte de, hevalên min, ji min re, dibin aqilmend.

Ez, ji te re, dibêjim ku em biçin çiyê baş e.

♠ Piştî kiryarê ku ji lêkerê xwe dûr dikeve tê:

Şêrîn, di rojêke bi berf, baran û bager de, hat rûdinê.

Ez, di sala hezar û nehsed û şêstî de, ji dê bûme.

Reşo, jiberku nizane bixwîne, matmayî dimîne.

⚡ Piştî banglêkirinê tê:

Mizgîn, li min binêre û gotinên min guhdar bike.

Xebat, ku tu çûyî Şerefdînê hevalan silav bike.

? Xalepirs

Dikeve dawîya hevokên pirsîyariyê:

Tu kengê ji welat hatî?

Ew çi dixwaze?

Çend leşker hatin gund?

! Xalebang

Dikeve dawîya bang û hevokên bi wan re:

Ax ! Ev çi zemanekî xirab e!

Xwedêyo ! Te çawa li hev anî !

Oh xweş ! Çi mizgîneke baş e!

Kuro, bibe mirov!

: Xalecot

Dikeve dawiya hevokê ku tiştek tê gotinê yan hejmartinê:

Beyana sibê bû, bavê min ji xew hişyar bû û got: Ev çiya ji şer û kuştinê natirsin.

Di dînê Zerdeşt de, sê baweriyên bingeîn hene: Peyva xweş, baweriyê rast û karê baş.

; Xaledabir

Dikeve navbera hevokên ku bi hev ve girêdayî ne û wateya hev temam dikan. Hîn hevok neqediya ye û babeteke nû dest pê dike:

Reşo, bilez ji malê derdikeve; wisa xuya ye ku tiştekî pêwîst qewmî ye.

( ) Kevanek

Peyvên ku bi sebebekê dikevin nav hevokê, dikevin nav kevanekan û rakirina wan jî, wateya hevokê naguherîne:

Di Kurmancî de, du zayend hene ( nêr û mê ).

" " Dunik

Peyvên ku ji cihekî din tên guhastinê di nav dunikan de, tên nivîsandinê:

" Ay Ahora yê mezin " Zerdeşt digot.



— Xêzek

Eger nivîsandin ket awayê axaftinê û peyvbêj hat guhartinê,  
li pêşiya hevokê xêzek tê nivîsandinê:

Di navbera dil û mejî de, gotûbêjek germ dest pê kir:

— Jiyan pir xweş e!

— Lê du bindestî.

.....

- Bendek

Dikeve navbera du peyvên ku hogiriyek di nav wan de heye:

Birca - Belek

Kaniya - Spî

Bedir - Xan

Nasîn

Di Kurmancî de, nîşana herî pêwîst dabir e.

## EV XAK ŞEHÎDISTAN E, PÎROZ E BUHSTEKÊ BÎPÎVE Û SERÇOK BIBE

Li vir jînê dest pê kir. Li vir yekemîn car birakujiyê bi Habîl û Qabîl tovê şer binax kir. Li vir roj bû Xweda. Agir bû Xweda. Li vir: Ey Ahora Zerdeşt bang kir. Tofan rabû. Nûh jiyan rizgar kir. Keleka mirovahiyê ji vir rabû û li vir cih dît. Dîsa radibe ji vir. Li vir hovîtiyê neyartî geş kir. Xaka vir, xwînê bi rengê xwe sor kir. Li her buhstekê gorê hezar carî devê xwe vekir. Hezar cendek hembêz kir. Liser vê xaka pîroz mirovahiyê bi hezar rengî xwe geş kir. Tofan û lehiyên kedxwaran lek bilek hatin û çûn. Lê mirovên vir serbilind man, mîna bejn û bala çiyayên xwe. Destên xwe dan bin goka rojê. Cihan rege rege ronî kirin. Demên tariyê, bi pêtên agir yê ji bedena xwe ronahî gur kirin.

Ev welatê rojê ye. Taristanê napejirîne. Li hember tariyê, li hember Ahrîman û şerxwazan herdem ji vir banga "BERXWEDAN JIYAN E" bilind dibe. Îro, stêrkên asîmanan şermdar in li vir. Mirovahiya kuştî dinale. Lê dîsa bi jiyanê dil şad dibe li vir. Robotên ker, lal û kor dibin xwedî guh, ziman û çav. Li vir, liser vê xakê mirovahiya şermdar çariyên reş diçirîne. Bi rûmeta rojê biharên geş dixemilîne. Li vir, liser

vê xakê keçên rind, bedew û ciwan xwe ji zinaran werdikin jibo nebin nêçîra gur û hovan. Xortên enîbilind bi guleya xwe ya dawî giyan disipêrin. Xwesipariyê napejirînin. Eniya mirovahiya talankirî bi xalên reş nîşan dikin. Li vir şîrmij û mindalên bêguneh dibin armanca gule û gazên mirinê. Cenawir û hovên di kêşma mirovan de, welatê rojê û agirdankên pîroz bi cizmeyên xwe qirêj dikin. Bihuşta cihanê dikin dojah. Lê ev der welatê rojê ye. Taristan nikare lê cih bigire. Her tîrêjek bi hezaran leşkerên Ahora dafirîne. Bi bişkivandina gulan re, bi pêlên bayê re, bi xuşîna Zap, Dîcla û Feradan re, bi bilûra şivanan re, bi kenê zarokan re, bi hêsirên çavên dayîkan re, bi kesera dilê dîliyên zindanan re lek bilek leşkerên Ahora tîna daçikandin. Berbi rojê hildikişin. Li destê wan agirê pîroz e. Agirê Mîhtra û Zerdeşt. Agirê bêvemirin ji kuçikê dîroka nemir gur û geş dikin.

Dîsa bang bilind dibe: "Berxwedan Jiyan e". Giyan liber mirovahiya kuştî digere. Geş dibe. Xwe bi pencên rojê dixemilîne. Madî rabûye li vir Madî! Ahrîman xwe bi paş de dikişîne. Şer di taristanê de winda dibe. Aştî, li welatê rojê nû dibe mêvan. Berbi cihaneke hemdem ve şax dide.

Ev welat Şehîdistan e! Eman!...Hêdî hêdî piyê xwe bavêje ser xaka wî! Pîroz e! Di her buhstekê de golek xwîn heye. Bi dehan şehîdên nenas hembêz dike. Liber bejnên wan yên



ku xwe dikişînin bilindahiya rojê serçok bibe. Xwe bitewîne,  
xaka Şehîdistanê ye ev xak!

Bahoz û bagerên zivistanê ji ber pencên rojê neçar mane.  
Bi şûn de direvin. Çirûska yekemîn ji zindanan birûsk veda.  
Li cihê Keleka Nûh bû mêvanê rojê. Şax û tîjkên xwe berbi  
gelî û zinarên Cûdî, Gebar, Herekol, Agirî, Bêxêr û Sîpanê  
Xelatê vekişandin. Mem û Zîn, Xec û Siyabend, Ferhad û  
Şêrîn, Edûl û Derwêş li xewna evînê hişyar kirin. Bi hev re  
kirin yek. Bi yek awazê hemû çiya û deştan singa xwe ji  
agirê nevemirî re vekirin. Bûn hêlîn û lûsên xwazgîniyên  
rojê. Pêt û tîjkan xwe vekişandin jêr û jor. Li banê gerdûnê  
belav bûn. Deşt û geliyên tarî, bajar û gund bi agirê germ û  
ron dil şad bûn. Serbest hejiyan.

Îro, li welatê rojê govend û dîlan e. Dengê azadî û aştiyê  
sirûdên bêmirin dafirîne. Li baskên ewrên avis siwar dibin û  
pêl didin. Dîsa enîbilind berbi rojê ve diçin. Sersotkên xwe  
gur û geş dikin. Çira ji çirayê pê dikeve. Bi hezaran  
meşxelên azadiyê dimeşin. Li cihana bêguh, bêziman û  
bêçav dibin birûsk û tav. Xeml û rehela Mîdya li dar dixin.  
Radikin ser destan. bi rengên kesk, sor û zer berbi jor ve  
hildidin. Pêtên agir singa xwe ji cihaneke hemdem re  
vedikin. Keskezer li herhêlê vedidin. Li welatê rojê hêvî  
dixemile. Hêviya mirovahiyê, hêviya stoxwar û birçiyar ji

pencên roja Şehîdistanê mêweyên bihuştî dafirîne.  
Zehmetkêşên dîrokê dibin tîrêj û ronî. Bi rojê re dibin yek.  
Dibin agirê bizot. Stoyên keserkûran bi lala û dur  
dixemilînin. Ji hêsirên wan guliyên mindalan dihûnin.  
Welatê Rojê semawenda (daweta) jînê li dar xistiye. Lê  
eman! Li meşa xwe baldar bin! pêxwas û bêpêjin bimeşin!  
Her buhstek ji vê xaka pîroz bi dehan şehîdên bînav  
(nenas) hembêz dike. Ev axa Mîdya ye! Kurdistan e!  
Na...Şehîdistan e!...

## ÎSA, DÎSA TÊ XAÇKIRINÊ

*Giyana Xwedê liser min e! Ez şandime ku ji girtiyan re azadî û ji koran re bînahiyê bînim. Ezê ketiyan aza bikim. Ey mirovan! Hûn dizanin rûyê erd û asîmanan nas bikin! Lê çawa hûn nizanin vê demê nas bikin. Baweriya xwe bi min bînin. Ez rizgariya we me. Ji bo we hatime û ji bo we êş û azarê dikişînim!*

Berî duhezar sal ev bang ji Qudsa pîroz raperî û li rojhilatê pêl da. Lê çav kor bûn. Guh ker bûn. Ziman lal bûn. Dijminên ronahiyê xaç bi xwînê sor kirin. Perdeyên reş berdan ser banga azadî û aştîyê û fetisandin. Niha jî, her ew deng e zîz dibe. Li Amedê, li Mihabadê û Hewlêrê, li Botan û Agirî, li Qamişlo û Efrînê û li her cihên Kurdistanê. Li hember vî dengê aştîxwaz bi hezaran xaç daçikandine. Perdeyên reş û tarî li pêşiya tîrêjên ronahiyê raxistine. Dîsa xwîn bi darê xaçan ve diherike. Kulîlk û gupik serên xwe ji nav pêlan radikin. Bi ronahiya rojê şa dibin.

Ey Îsayê Nûranî! Hilbijartiyê Xwedê yê birêz! Vê carê dûşopên te xaç û mîx amade kirine. Ji Elmaniya, ji Amerîka xaç diyarî Kurdistanê kirine. Dixwazin bi destê faşistên



nûjen banga te bifetisînin. Bêtirs hilkişe ser xaçên xwe. Ew baş dizanin êş û azarê bi mirovahiyê bikin. Baş dizanin şerê ronahiyê bikin. Xaç û mîxên sedsala bîstan ne mîna yên berî du hezar sal in. Di kuştina ronahiyê de pir pêşketin çêbûye. Belê! Dûşopên te, te bi destên faşistan xaç dikin. Lê xemgîn nebe. Dilovaniya wan jî heye. Li pey te digirîn û hêsiyan dibarînin. "Bi guran re goşt dixwin û bi şivanan re şînê dikin". Tê guhê me peyvên te ji jinên Qudsa şerîf re ku liser êşa te digirîn û dinaliyan: "*Ey qîzên Qudsa pîroz liser min negirîn! Liser xwe û zarokên xwe bigirîn!*"

*Lewre di rojên dê bên de, dê bibêjin xwezî bi wan ku zaro hîç ne anîne! Bi wan zikan ku hîç ne welidandine û bi wan çîçikan ku hîç şîr nedane! Hingê dê dest pê bikin ji çîyan re bibêjin biser me ve bikevin û ji giran re me veşêrin.*" Gelo îro ji dûşopên xwe re tu çi dibêjî?! Xaç û mîx ji destê wan in. Xaçkirin jî, ramana wan e. Lê dîsa liser te digirînin. Zagona reşatî û taristanê ye.

Banga xwe dubare bike. Em te dibihîzin tu çi dibêjî: "*Ey sextekaran! Liser xwe bigirîn! Liser mirovahiya ku hûn dikujin bigirîn! Hûn dijminên rojê, baş min bi êşînin! Ez jibo mirovan êş û azarê hildigirim! Xwîna min bihara mirovahiyê ye! Xaçan daçikînin! Şaristaniya nû dê bê avakirin! Ez mîna giyanê me li biharan zîl didim! Li her cihê hatime daçikandin!*"

*Ji nav xaka pîroz tovê jînê tîrêja rojê hembêz dike! Ez ronahî me! Ez roj û jiyan im! Bi xaçkirinê ez namirim! Ez giyan bi xwe me! Giyan jî nemir e! Lê hûn?! Roj wê bê ku xezeb liser we bibare! Ne erd û ne asîman we hildigirin! Lewre hûn munafiq û sextekar in! "*

Ey Îsayê Nûranî rizgarkarê mirovan! Kevoka aştiyê! "*Bi navê bav û kur û giyana pîroz Xwedê yek e ! Amîn!*" Ez rêdanê ji te dixwazim ku ji te bipirsim. Emê ji nû dest pê bikin. "*Eger yekî li rûyê te yê rastê xist yê çepê jî, jê re vegire!*" Te digot. Gelo ev ji hercih û zemanî re rast e? Tu dikarî îro vê gotinê dubare bikî? Ez bawer nakim! Jiber ku hovên vî zemanî di şûna zileyan de, napalim, gazên mirinê, top û panzeran bikar tînin. Eger li hember wan tu xwe neparêzî tu ji kokan radibî û doz dimire. Tu bê çareyî ku di şûna zileyê de diduyan li wan vegerînî. Çiyan dihêrifînin. Gundan dişewitînin. Malan wêran dîkin. Ka bêje min ey xundekarê bijartiyê Xwedê eger Xwedê jî bi hana kurê xwe ve neyê çare çî ye? Ku çiya hêrifî em nikarin çiyayekî din bînin jibo dîsa bihêrifînin. Ku gund şewitî emê çawa gundekî din ava bikin. Ku mal wêran bû û xwedî kuştin wê kî careke din ava bike jibo dîsa wêran bikin. Eger mirovahî hemû hat xaçkirin tuyê jibo kê dozê bimeşînî? Jibo azadiya miriyan doz nîn e! Dilsar nebe ey Îsayê Nûranî! Banga te îro li

Kurdistanê bilind dibe. Bi ser her xaçan dikeve! Lê biborîne  
ku ev bang li gor demê hatiye nûkirin û bi  
"Berxwedan Jiyan e" hatiye xemilandin. Azadî û aşî bê  
berxwedan nayên cih. Her çiqasî dixwazin te dîsa -lê vê  
carê li Kurdistanê - xaç bikin jî, lê bi ser nakevin. Lew re  
daxwazên te bi berxwedanê tên cih.

## Çavkanî

- BEDIRXAN, C. û LESCOT, R. Rêzimanê Kurdî  
•BEDIRXAN, C. Kovara HAWAR  
•KURDO, Q. Gramera Zimanê Kurdî  
•NEBEZ, J. Zimanê Kurdî Yê Yekgirtî  
•HAJO, Z. 20 Lektionen Für Deutsche  
•KARTAL, H. Navên Kurdî  
•KARTAL, H. Xebatên Neçapkirî  
•SAÐNIÇ, F. H. Hêmana Rêzimanê Kurdî  
•KURD, R. Rêzimanê Kurdî  
•RIZGAR, B. Dersên Zimanê Kurdî  
•SEBRÎ, O. Alfebêya Kurdî  
•BEDIRXAN, K. Rêzimanê Kurdî  
•CEGERXWÎN Rêzimanê Kurdî  
•XANÎ, E. Mem û Zîn  
•CIZÎRÎ, M. Dîwan  
•HEKARÎ, P. B. Dîwan  
•DUDEN Rêzimanê Almanî  
•LUSCHER, R. û SCHPÇPERS, R. Rêzimanê Almanî Yê Nû  
•HABECKER, P. Zeýchensetzung ( Almanî )  
•HEJAR Henbane Borîne - Ferheng  
•OMAR, F. F. Ferheng, Kurdî - Almanî  
•NÎZAMEDÎN, F. Ferheng, Kurdî - Erebi  
•ELÎ, C. û EMÎN, M. Rêzimanê Zela - Erebi  
•ALANSARÎ, H. Rêzimanê Erebi

⌘ KOVARA LÊKOLÎN

⌘ KOVARA STÊR

⌘ KOVARA REWŞEN

⌘ KOVARA ROJA NÛ

⌘ ROJNAMEYA WELAT

⌘ ROJNAMEYA BERXWEDAN



**ISBN:3-930943-19-0**